¹⁰Ev veguhertinên giring û giran ji pêrabûnên çakkirinên Şêx Ebdul-Selam Merov perçên wanî şûregêrî di şûreşa Firensî de di sala 1789 de, di çakkirinên çindîniyî Osmanî de der sala 1858 de û di şûreşa Gencên Turkî de der sala 1908 de dide bidîtin. Ev bîr û bawerîyên hanêyî şûreşgêr û pêwist tevaya felsefa berzanîyan di jînê û rîzgarîkirina kurdistanê de didatin bibingehkirin û ew li ser sê sitûnên xurt û rast de

Ehmed Axayê Pîrsiyavî Xalê Barzan bi roleke mezin ve ji bona piştgirtin û parastina van çakkirin hate birabûn. Ew û Eşîra xwe bi hêza bingehî ve di nava destên Ebdul-Selam de dihatin biderkevtin.

Wetov em dikarin bidin bigotin, ku mêjûwa xebata Barzan ji bona destpêka vî sedsalê niha û nemaze ji bona pêla Gorîvanî Şêx Ebdul-Selamê Barzanî bi rast û durustî ve tete bivegerandin.

Tevî kurtbûna pêla Rêberîya wê ji bona Barzan jî wî karîbûneke bilind di Rêberîya xweyî ayînî û dunyayî de date biderxistin. Ji bil pêrabûnên çakkirinên wîyî şûreşgêrî jî wî pêwendîyên xurt ligel hinekan de ji Eşîrên Kurdan date bidurustkirin û ew ji bal tevan de rêz lê dihate bigirtin. Pêwendîyên wî ne bes tenê ligel Eşîrên dorhêla herema Barzan de dihatin bitirxankirin; lêbelê jî ew ji bona tevaya perçeyên Kurdistanêyî din jî dihatin bidirêjkin.

Şêx Ebdul-Selam bi zordarîya li ser Kurdan de li ser destên dewleta Osmanî de date bihestkirin; jibervêjî ve wî jêhatbûnên xwe ji bona dîtina rêyeke bi serkevtî ve ji bona rizgarîkirinê ji zoradrîya desthilatîyên Osmanî datin bixurtkirin. Ew bi gerandin û serdanên pir ve ji bona nik Serok û Şêxên Eşîran hate birabûn.

Roleke mezin jê re di belavkirina çakkirina siyasî di navbera Zaroyên Kurdistanê tete biderkevtin. Wî pêwendîyên xurt ligel Civatên Kurdîyî karkirî de di wê pêla hanê de nala Civata Tealî û Tereqî Kurd,

dihatin biavakirin. 1. li ser dadiwerîyê de, 2. li ser lêbuhurandinê de û 3. li ser dilsozî û evîndariya kurdistanê û serxwebûna wê de dihatin bihîmkirin. Ev sermiyanê dewlemendî giranî mezin bingehê biserkevtina Barzanîyan di mêjûwa serdema me de dide bi tacûxelatkirin. Rêberên Barzanîyan yek li dû yê din bi dilsozî ve li ser vê şopa hêja û giran de bi bê dilbijandin û kîn ve rêya azadîya Miletê Kurd û serxwebûna Kurdistanê ji xwe re dane bigirtin; jibervêjî hemû Dilsoz û Welatperwerên Kurdistanê bi carekê ve piştê vê Binemala Kurdperwer di xebata mîlî de dane bigirtin û jibervêjî ve hemû dagîrkerên Kurdistanê û Nokerên wanî hestîkoj, Xişxaşkêş û Xişxaşfiroş bi şev û roj ve kîn û kîndariya xwe beramberî vê Binemala Welatper û Xebatvan ji bona serxwebûna kurdistanê di bin navên cudan de didin biderxistin. Kesekî nala Barzanîyan di xebata dirêjê xwînavî Kurdistanê de ji bona serxwebûna wêna weha deha bedbextî û wêranî nedane bidîtin; belam ev xebata hanê bi şiyarbûna mîlî ve û pêkanîna Dewleta Federalîyî hêvîya kurdî perest ve di vê serdema me de hate bitacûxelatkirin. Cuma

Civata Hêvî û Civata Serxwebûna kurd date bigirêdan. Herwehaji wî pêwendiyên baş ligel Şêx Mehmudê Hevîd, Şêx Ebdul-Qadir Nehrî û Ismail Simko Axayê Şikakan datin bidurustkirin.

Di buhara sala 1907 de Şêx Ebdul-Selam ji bona civîneke giring hate biamadebûn, ya ku ew di mala Şêx Nur Mohemedê Birîvkanî Rêberê Tekîya Qadirî de li gundê Birîvkan de hate bigirêdan. Di vê civînê de jimarek mezin ji Rêberên Kurdan têde hatin biamadebûn. Di vê civînê de hate bibiryarîkirin, ku birûskek ji bona Derîyê Bilind bi van daxwazên jêrî ve divê betê bihildan:

1. Divê bi kirina zimanê kurdî ve bi zimanê mîrî ve di heremên Kurdî de bête bikirin.
2. Divê fêrkirin bi zimanê Kurdî ve bête bikirin.
3. Divê Qayimqam, Serpereştîvanên Navçeyan û Karmendên din bêtin binîşankirin, ji yên ku ew bi başî ve zimanê Kurdî didin bizanîn.
4. Divê dagehîkirin li gora şerîeta Musulmatîyê de bêtin bikirin; ji ber ku oldarîya Musulmantîyê bi oldarîya dewletê ve tete biderkevtin.
5. Divê bêşa ji dêlva serbazîkirinê wek xwe bête bihiştin; belam divê ew ji bona çakkirina rêyan û vekirina dibustana di heremên Kurd de bêtin bitirxankirin.

Demloçî di nivîsta xwe "Mîrneşînîya Behdînan" de dide bigotin: "ku metnê birûskê ji bona Şêx Ebdul-Qadir Ubeydulahê Nehrî, Amîn Alî Bedirxan û Sergird Şerîf hate binardin. Ev rêkirina hanê bi dijî bîr û bawerîya Morkirvanan dihate biderkevtin; ji ber ku wan dixwest, ku ew bes û bi tenha ve bi mîrî ve bête biderkevtin; belam Şêx Ebdul-Selam weha date bixwestin".

Di vê civînê de hemûyan datin bisundxwarin, ku dê ew bi van daxwazan ve bidin bigirtin û li ber wan de dê bidin bibergîrîkirin û birûsk bi morkirina Şêx Ebdul-Selam ve ji dêlva Amadavanan hate binardin.

Piştî wergirtina Derîyê Bilind birûska bi rêkirî ve wê ew nala bi derkevtina ji sertewandina dewletê ve bi daxwaza cihêbûnê ve date bidanîn. Dewletê dagirtina giştî date bidazîn û hêzên sipahî di dawîya sala 1907 de di bin Rêberîya Sergir Mohemed Paşayê Daxistanî de hatin bilivandin. Hiç kesekî ji Serokên Eşîran bergirî li ber wan de nedane

bigirtin; jibervêjî ve tevaya givaştinê li ser Barzan de hate bikevtin. Şêx Ebdul-Selam fermana li berxwedanê û bergîrkirinê date biderxistin û Barzanîyan du mehan di berxwedana xwe de dane bidirêjkin û yê din ji xwe re li wan de didane bitemaşekirin yanjî wan ligel dagîrkeran de didane bialîkarkirin.

Di dawîya dawî de Şêx ebdul-Selam ji bona devjêberdana heremê û çûna ji bona Tiyarîyê¹¹ li nik Marşemun de hate bineçarîkirin. Marşemun ji bona Şêx Ebdul-Selam penabûn jê re date bikin û wî gelekî rêz lê date bigirtin. Ji wê çaxê de pêwendiyên dostanîyê di navbera Barzanîyan û Asurîyan de hatin bipêkhatin. (Em Barzanî hergav bi çavekî bilind ve li wê helwesta bi rûmetî Marşemun ve didin bitemaşekirin).

Daxistanî bi hêzên xwe ve ji bona nava heremê hate bikevtin. Wî gund datin bisutandin, mal dane bitalankirin û Pîrek û Zarok jî dane bigirtin. Di vê rûberûbûna hanê de Mele Mustefa Barzanî jî bi temenê sê salî ve ligel Dêya xwe de bi dîlbûn ve ji bonna nava destên hêzên Osmanî ve hate bikevtin û ew ligel Dêya xwe de di zindana Musilê de date bizindanîkirin. Jimareke gelek ji Peyên Çekdar xwe di nava cihên dûr û sext de dane biveşartin û wan çavdêrîya pêgihîştinên Şêx didane bikin.

Şêx Ebdul-Selam der sala 1908 de ji bona Barzan hate bivegerandin û wî Peyên xwe li dora xwe de date bicivandin û ew li Welatê Jêrî¹² de li piş çiyayê Şêrîn de li jorî gundê Barzan de hatin bikimkirin. Wan ji nişkê ve hêrîşeke xurt ji bona ser yekitîyên Turkîyî komkirî li heremê de dane bikin û wan dikarîbûn herem bi carekê ve ji wan bidin bipaksazîkirin û wan gelek ziyanên bêqam bi sipahê Osmanî ve dane bipêgihandin. Li ser kêra vê bi serkevtina mezin ve Serdarîyê daxwaza gîfûgoyê date bikin. Şêx li ser gîftûgokirinê de hate bipêrûniştin û di nava wan de lihevhatin hate bicîhatin. Li ser vê lihevhatinê de Zindananan hatin biberdan û ji dêlva ziyanên bi heremê ve pêkevî pere hatin bidan. Serleşeker Esed Paşa Serdarê Girda Duwanzdehî û Walîyê

¹¹Tiyarî bi sengîna Aşurîyan ve di wilayeta Hekarê de di Kurdistana Tukîyê de dihate biderkevtin.

¹² Welatê Jêrî bi perçê jêrîyî Eşîra Mizurîyan ve tête biderkevtin. Herem li pişt çiyayê şêrîn de di jorî Barzan de tête bikevtin û ji gundên wê evin: Şengîl, Têl, Dawêdka, Basîfa û Hêzan.

Musilê berpirsiyarîya Heremê bi katî ve ji bona ser şanê xwe date biavêtin. Vîna siyaseteke bi bext û hiş ve dûr ji kîn û sawê date birêvebirin û kar û bar careke din bi mîna berê ve hatin bikirin. Belam piştî Sulêman Nezîf berpirsiyarîya Musilê date bigirtin, wî siyaseteke zordarî û sawê bi rengê no ve ji her demê bêtir date biwergirtin û sipahekî lek bi lek ve di sala 1913 de ji bona girtina Şêx Ebdul-Selam date binardin. Şêx Ebdul-Selam careke din de ji heremê date biberdan û berê xwe ber bi Kurdistana Iranê ve date bivekirin û ew bi Mêvan ve ji bona nik Seyid Taha Kurê Mohemed Sediqê Nehrî li gundê Rajan de¹³ li nêzîka Ormiyê de hate bigihandin. Derîyê Bilind Xelateke bi nerx ve date bitirxankirin, ji yê ku Şêx bi saxî ve yanî bi mirî ve bide bigirtin.

Di vê pêlê de ew ji bona serdana Ismail Axayê Şikakan hate biçûyîn û ew herdu ligel hevdû de ji bona hatin biçûyîn û Wênerê Qeralê Rusya datin bidîtin, yê ku wî soz bi piştê bigirtin û palpêdana Kurdan ve di xebata wanî rizgarî de ji bin nîrên serdarîkirina Osmanî de date bidan. Di rêya vegerandina xwe de, piştî ku Ismail Axê Şikakan di Selmasê de xatirê xwe jê date bixwestin, ew di gundê Gengene Cîn¹⁴ re hate biderbasbûn. Sofî Ebdulah xwediyê gund jê date bihêvîkirin, ku ew bi mêvanî ve ji bona gundê wî bête bihatin. Şêx daxwaza wî date bicihanîn û ew bi mêvanê wî ve hate bikirin. Di dema nivistinê de Sofî Ebdulah bi

¹³Gundê Rajan ji sala 1979 de tanî dawîya salên heştêyî de bi wargeha Rêberîya Partîya Demokratî Kurdistan ve hate bikirin. Ez gelekî li vî gundê xweşî hanê de hatim bijîyandin û pir bîrwrîyên xweş di vê pêlê de nala Pêşmergeyekî ligel Dost û Hevalan de min date birabuhurandin. Min li vî gundê hanê de pir wêneyên mêjûyî dane bigirtin, ku ew tevaya rewşa jîna me didin biderxistin.

Ez di vê pêlê û pêlên din de di Kurdistanê de pir bêtir him di siyasetê û xebata Kurd de û himjî bêtir di felsefa jînê de hatim bilîberkevtin. Min pir ji nêzîkî ve Edrîs, Mesud û Barzanî datin binaskirin û bixwendekarîn. Roj bi roj ve bêtir dilsozî û evîndarîya wan ji bona Kurdistan û serxwebûna wêna ji min re dihate biderkevtin. Ew rast û durust û bi neçarî ve li ser rêç û felsefa berzanî de dihatin biçûyîn. Bi vî rengî jî ve der sala 1992 de Xebata wan bi şiyarbûna mîlî û dazanîna Fêderaliya Dewleta Kurdistana Iraqê ve hate bitacûxelatkin.

Ez hêvîdarim, ku dê ezê wan yadaştin wan salan bi dûr û dirêjî ve di navbera hûnandin û rastî yê de ji bona Keç û Kurên Kurdistanê bidim binivîsandin. Cuma

¹⁴Gengene Cîn: Gundeke li ser rêya Ormiyê - Sîro de li ser sînorê Turkî de tête bikevtin.

29 Barzanî û Tevgera Azadîxwazîya Kurd 1931 - 1958

tawankarîyeke pîs ve hate bipêrabûn, wî Şêx Ebdul-Selam û hersê Pasevanên wî date bigirtin û wî ew ji bona Turkan li Sîro de dane biberdestkirin û wî diyarîya bêbextîya xwe ji xwe re date biwergirtin. Şêx ji bona Musilê hate biveguhêstin û piştî dadkirineke kurt ve, ya ku ew ji bal Sulêman Nezîf de hatibû bikarxistin, ew ligel Pasevanên xwe de bi darvekirinê ve bidadkirin. Dakirina wan di 14. 12. 1914 de hate bicîanînkirin û goyeke din dide bigotin ku ew di rêbenda sala 1915 de hatiye bidarvekirin.

Bi gorikirina wîna ve Kurdan Rêberek dane biwindakirin, dibe, ku heger ew li ser jînê de tanî piştî cenga cîhanîyî yekem de bihata bihiştin, dê rewşa Kurdan ne mîna niha bihata biderkevtin.

Piştî gorikirina Şêx Ebdul-Selam Ehmed Axayê Pîrsiyavî ligel hêzeke çekdarî de bi jimareke 1000 Kesî ve ji bona gundê Barzan hate biçûyîn, da ku ew Şêx Ehmed û birayên wî ji hêrîşên Eşîrên dora wan bide biparastin.

Şêx Ehmed Rêberîya Barzan piştî gorikirina birayê xwe Şêx Ebdul-Selam date biwergirtin û temenê wî bi 18 Salî ve dihate biderkevtin. Ew li ser pêyrewê wî de hate biçûyîn û wî xwe bi wan bîr û bawerîya ve date bigirtin, yên ku Şêx Ebdul-Selam ji bona wan hate bigorîkirin. Ew bi karî û bi dilgerm ve li ser rêya Şêx Ebdul-Selam û pêwendîyên wîyî milî dehate biçûyîn. Wî veçakkirinên civakî dane biparastin û ew dane bipêşvexitin. Ew bi rola xweyîyî ayînî û welatî ve bi baştirîn rû ve pê hate birabûn. Ji van bîr û bawerîyên hanê ve ew bi yekekî pêşî ve tete biderkevtin, ji yên ku ew di hewara Şêx Mehmudê Hefîd de hatin biçûyîn, gava ku wî serê xwe dijî Impiryalîya Ingilizî der sala 1918 de date bibilindkirin.

Ji ber hêjakirina rola gewreyî Şêx Ebdul-Selam de Şêx Ebdul-Qadirê Nehrî nameyek di rêya Şêx Ebdul-Rehmanê Şernexî de ji bona Şêx Ehmed date birêkirin, ku ew rêberîya tevgera Kurd bide bikin; belam Şêx Ehmed bi vê ve pê nehate birûniştin. Wî li ser pêrabûna vê rola hanê de ji bal Şêx Ebdul-Qadir de date bidubarekirin. Li ser daxwza wîna de Şêx Ehmed birayê xwe Mustefa Barzanî ligel Şêx Ebdul-Rehmanê Şernexî ji bona Kurdistana Turkî date birêkirin. Min date bi-bihîstin, ku Mustefa Barzanî di navebera pêla 1917-1919 de ligel Şêx Ebdul-Qadir û Şêx Seidê Pîran de li herema Mûşê de hatiye bipêrgîbûn.

Derîyê Sêyem

Barzan û Şûreşa Şêx Mehmudê Hefid

Gava ku şûreşa Şêx Mehmud di gulana sal 1919 de dijî Impiryalya Ingilîzî hate bivêkevtin, Şêx Ehmed Barzanî piştî wê date bigirtin û wî gelek name ji bona Serok û Şêxên Eşîrên Kurd di devera Behdînan de date birêkirin û ji wan re ji bona piştgirtina Şêx Mehmud date bibangkirin û ji aliyekî din de wî jimarek ji Şervanên Barzanî ji bona beşdarbûna şûreşê date binardin. Şêx Ehmed birayê xwe Mele Musetefa li ser serê jimarekê de ji Şervanan di rêya Dola Biyaw¹⁵ de û wî jimareke din jî di rêya herema Balek¹⁶ de date binardin. Herdu hêz ligel gelek bosan de hatin biberengarîkirin, yê ku ew ji bal Nokerê Ingilîz de li ser rê de hatibûn bidanîn. Jimarek ji Şervanên Barzanîyan hatin bikuştin, berî ku ew bi Sulêmanîyê ve bêtin bigihaştin. Gava ku Pêşrewên Barzanîyan ji bona gorepana şer hatin bigihaştin, şûreş hatibû binabûdîkirin û Şêx Mehmud bi dîl ve piştî birîndarbûna wîna di Derbendê Bazîyan de bi destên Ingilîz ve hatibû bikevtin.

Ev helwesta hanê ji bal Şêx Ehmed de bi dijî berjewendî û dilbijandinên Impiryalya Ingilîzî ve dihate biderkevtin. Hinekan ji Serokên Eşîran nameyên Şêx Ehmed ji bona Serdarê siyasîyî Musilê dane birêkirin, ji yê ku Şêx ew ji bona wan dabûn binardin. Berpirsiyarên Birîtanî pir hatin bitûrekirin û wan datin bibiryarîkirin, ku ew lêdaneke xurt ji bona Barzan bidin bilêxistin û wê ji xelkên wê bidin

¹⁵Dola Biyaw bi beşekî ji herema Surçîyan ve tete biderkevtin û ew li rojhilatî Barzan de tete bikevtin û rêya Xelîfan - Barzan di heremê re tete biderbaskirin.

¹⁶Herema Balek di nava herema jorî Rewanduz de li ser herdu rexên rêya Hamilton de tanî bi Rayat ve tete bikevtin.

bivalakirin û li şuna wan de Aşurîyan di nava gundên wan de bidin bicihkirin. Belam piranîya Aşurîyan ev pîlana bi derew ve ji bal Ingilîzan de dane binayînkirin, daku ew pêwendîyên başî mêjûyî neyêtin bilekkirin, yê ku ew bi Barzanîyan ve didane bigirêdan, tevî ku hinek kê m ji wan jî pê dihatin birûniştin. Lêbelê ji ber hoyê mijûlbûna Ingilîz bi pir kar û barên cudan ve bi cihanîna pîlana lédana Barzanîyan ve ji bona demek baştir dane biderengîxistin.

Kuştina Kolonêl Bêl û Kapitên Sikot

di meha çîrya duwemê sala 1919 de Kolonêl Bêl Serdarê Musilê ligel Kapitên Sikot Serdarê Akra bi serdanekê ve ji bona nava heremên Surçîyan û Zêbarîyan û di pişt re ji bona herema Barzan hate bipêrabûn. Wî dest bi firandina tirsan ve ji bona Şêx Ehmed bi sizadan û danîna tolên mezin ve li ser Serokên Eşîrên heremê de ji ber hoyên cudan date bikirin. Gava ku ew ji bona Barzan hate biçûyîn, Şêx Ehmed ji ber pêrabûnên wîyî bêvac û tirsfirandinên wîyî bi bê hoy ve pêşewazî lê nedate bikirin. Wî weha date bigûmankirin, ku ew bi vê reweşta xwe ve zalbûna xwe dide bicihkirin û desthilatîya xwe dide bihîmkirin.

Di vê pêlê de Serokên Eşîra Zibarî û Surçî ji bona danîna boseyek ji bona Kolonêl Bêl Hevrîyên wî di vegera rêya wan de li nêzîkî gundê Bîra Kepra¹⁷ de hatin bilihevkirin. Farisê Axayê Zêbarî Merevê xweyî Babekir Axa ji Barzan date binardin û wî ji Şêx Ehmed piştgirtin û yarmetî ji bona bicihanîna vîlika xwe date bidaxwazîkirin. Şêx Ehmed amadebûna xwe date biderxistin, bi mercekî ve ku ew bi sozên xwe ve beramberî hemû rûdanan pê bêtin birabûn, ji yê ku ew dê li ser vî karê bi tirs ve bêtin bigirêdan; jiber ku hîç gûman têde nayête bidîtin, dê Ingilîz bi hemû pêrabûnên xurt û sert ve bêtin birabûn. Şêx Ehmed birayê xwe Mohemed Sidiq Barzanî ji bona gundê Bîra Kepra date binardin, da ku ew beşdarbûnên ligel yê din de di kirinê de bide bikirin. Bi rastî jî ve Bêl û Sikot di boseyeke xurt de di 14. 11. 1919 de hatin bikuştin.

¹⁷ Gundê Bîra Kepra bi herema Zêbarî ve tête bigirêdan û ew li ser pesarê jorî çiyayê Pêris de beramber bi Bilê ve li ser kenarê dinî ji çemê Zabê mezin ve tête bikevtin.

Herwehaji di 14. 11. 1919 de hêzên Eşîrên heremê bi lihevhatin ve hêrîşî ser bajarê Akra dane bikirin û wan ew datin bigirtin. Wisajî wan xizna bajêr jî dane bigirtin. Pevçuneke xurt di navbera Eşîran de li ser çawanbûna parvekirina mal de hate birûdan. Şêx Ehmed bi vê rûdana hanêyî bi tirs ve hate biliberkevtin û wî ew bi nîşaneke tirş ve date bidanîn, ku divê ji niha de guh pê bête bidan. Wî Serokên Eşîran date bikomkirin û wî ji wan re date bigotin: "Heger ku hûn li ser hin perên kêm de di xizna Akra de ligel hevdu de bidin bişerkirin, ma dê hûnê çi ligel hevdu de bidin bikirin, heger ku xizna musilê bi destên we ve bête bikevtin?". Şêx Ehmed ji bona vegeza Barzan bi hemû Şervanên xweyî Barzanî ve date bibiryarîkirin û wî dev ji Akra ji bona vegeza Barzan date biberdan. Hemû Eşîrên din jî mîna wan dev ji Akra dane biberdan û her yek ji bona herema xwe hate bizîvirandin.

Navtêdana Aşurîyan

Desthilatîyên Ingilistanê didatin bibendewarîkirin û li rûdan û pêşkevtinan de didatin biçavdêrîkirin. Di buhara sala 1920 de wan nav di Aşurîyan de datin bidan û wan ew ji bona şerkirina ligel Kurdan de dane birêkirin. Faris Axayê Zêbarî ligel malên xwe û Eşîra xwe de ji bona Iranê hatin bibazdan û ew ji bona nik Ismailê Axayê Şikakan hate bipenakirin. Li Barzan de di bin Rêberîya Butros Axa de şerên giran û xwînawî di navbera Barzanîyan û Aşurîyan de hatin bilidarxistin, di şerekî de ji van şeran Seid Welî Beg¹⁸ yek ji Rêberê Barzanîyan hate bigorîkirin. Belam pir nehate bidirêjkirin, tanî ku herdu alî bi danîna pîlana Ingilizîyî pîs ve pê hatin biliberkevtin û şer hate bidawîkirin. Hîç rojekê ji rojan jî pêwendî di navbera Barzanîyan û Aşurîyan de bi nebaşî ve nedihatî biderkevtin. Hîç jî helwesta Mar Şamunî bi rûmet ve dikare bête bijibîrakirin, gava ku wî ji bona Şêx Ebdul-Selamê Barzanî birayê mezinî Şex Ehmed cihekî penahî baş date bipeyda kirin, gava ku ew piştî şerekî qurs dijî hêrîşa sipahê Osmanî li ser Barzan de der sala 1907 de bi

¹⁸Seid Welî Beg Serdarekî sipahiyî bi nav û bang ve tête biderkevtin û ew ji Serokên Eşîra Şêrwanî ye û ew bavê Welî Bege, yê ku ew di gelawêja sala 1945 de hate bigorîkirin.

33 Barzanî û Tevgera Azadîxwazîya Kurd 1931 - 1958

devjêberdana herema Barzan ve hate bineçarîkirin. Ew ji bona Tiyarî navîniya Mar Şamun hate biçûyîn.

Bi ser pêwendîyen başî Barzanîyan ve ligel Aşurîyan de pêwendîyên wan ligel Ermenîyan jî pir bi başî ve dihatin biderkevtin. Ez bi baş ve didim bidîtin, ku ez li vêderê de bihîstîyên xwe ji Barzanî li ser pêwendîyan wan de ligel Ermenîyan de bidim biveguhêstin:

"Gava ku Ermenî tûşî serbirînên malwêran di 1920-1921 de hatin bikirin, Endiranik Paşa ji bona Şêx Ehmed nameyek date binardin, da ku ew di hewara wan de ji bona rizgarîkirina wan de bête bihatin. Şêx Ehmed Welî Beg li ser serê hêzeke 200 Çekdarî de date bifermandikirin û ez jî ligel wê hêza hanê de bûm, ya ku ew li jêr Rêberîya Welî Beg de bû. Em ji bona hewara Ermenîyan hatin birêvekevtin. Gava ku em di rêya xwe re di nava heremên Eşîrên Rêkanî, Bormarî û yên din re dihatin biderbasbûn, me ji wan re didate bigotin, ku em ji bona lêdana Ermenîyan têtin biçûyîn. Mexabin, ku Serdarîya Turkî pir ji wan dabûn bixapandin, ku ev cenga hanê di navbera Musilmantîyê û Filetîyê de tete bikirin. Em bi yarmetîya Ermenîyan ve hatin birabûn û em ligel wan de tanî bi Surî ve hatin biçûyîn. Di nava van malên rizgarkirî de mala Endiranik Paşa jî dihate bidîtin. Em di rêya Zaxo re ji bona Barzan hatin bivegerandin, piştî ku me 14 Gorîvan di şer de ligel sipahê Turkî de date biwindakirin".

Piştî vêna Ingilîz bi her buhayekî ve ji bona rakişandina Şex Ehmed ji bona alîyê xwe date bikarkirin. Carcaran wan tirs didatin bifirandin û carcaran jî wan dilbijandin bikaranîn. Belam Şêx Ehmed li ser helwesta xwe de hate bimayîn û wî serê xwe ji bona Impiryalîyê tucarî nedate bitewandin. Tanî sala 1931 de pêrabûnên sipahî hatin birawestandin û rewş mîna xwe tanî radeyekî hate bimayîn. Gava ku Serdarê siyasîyî Musilê ji Şêx Ehmed date bidaxwazîkirin, ku ew rê li ber desthilatîyên serpereştîyê de nede bigirtin, Şêx Ehmed bi başî ve bersiva wî date bikirin, heger ku ermanc jê ji bona pêşkeşkirina kar û barên pêwistî ji bona heremê bête biderkevtin. Herwehajî wan daxwaza hengeke Ingilîzî ji bona Bilê¹⁹ datin bikirin. Evjî hate bikirin û wan dane bisozdan, ku heng destdirêjîyê di nava kar û barên heremê de nade bikirin.

¹⁹Bilê gundeke û ew li jêrî Barzan de li ser kenarê Zabê mezin de tete bikevtin. Ew bi navîniya melbenda Zêbarî ve dihate biderkevtin, ya ku tede di cara pêşî de desthilatîyên serpereştî di heremê de hatin bipêkhatin.

Şêx Ehmed her û her ji bona Berpirsiyarên Ingilizî didate biderxistin, ji yên ku wan serdanîyî wî didadtin bikirin, ku ew tu malî yanî tu cihî nade bixwestin; lêbelê ew bes û bi tenha ve dixwaze jîyaneke li ser xwe de û bi zadî ve di nava xakê de bête bijîyandin. Wî hergav didate bidubarekirin, ku em Barzanî bi dana Xwedê ve ji mal û xurakê ji bona me bi dil ve têtin biderkevtin û em naxwazin zordariyê bidin bikirin û nejî em dihêlin zordarî li ser me de bête bikirin.

Ingilîzan date bizanîn, ku Barzan bi agirekî bin kayêyî şûreşî ve tête biderkevtin, ku ew di her katekî de dikare bête bigûrkirin û bi şaşbûn ve neguhpêdan dê bête biderkevtin. Wan kurbûna bestandinên şêrîn di navbera Şêx Ehmed û Zaroyên Eşîra wî de datin bidozandin. Hemû pêrabûnên wan ji bona kirina bextan û peydakirina duberîyê di nava Zarowên heremê de nehatin biserkevtin, yên ku wan hîç ligel polisekî de ne peyvek yanî li ser kar û barên sadeyî de didatin biaxivtin.

Ingilîzan datin bibiryarîkirin, ku ew di kêsa pêşîn de lêdanekê ji bona Barzan bidin bilêxistin û ew wê astengê ji ber xwe bidin bihilanîn, ya ku wan ew bi astengekê ve li ber bicîanîna siyasete xwe de dabûn bidanîn. Nemaze gava ku wan bi hebûna dan û sitandinê ve di navbera Şêx Ehmedê Barzanî û Serokên Kurdistanê Turkiyê de nala Şêx Seidê Pîran û Şêx Ebdul-Qadir Kurê Seyid Ebdulahê Nehrî datin bizanîn. Tevî bêdengbûna Berpirsiyarên Ingilizî jî wan bi nehênî ve pîlanekî dujminayeti beramber bi Barzanîyan ve didatin bilikarxistin. Min gelek carî ji Barzanî çîroka dîtina wî ligel Walîyê Musilê de di sala 1929 - 1930 dayite bibihîstin, gava ku Şêx Ehmed ew ji bona dîtina Walî dabû birêkirin, da ku ew jê daxwaza kişandina henga Ingilizî ji Bilê bide bikirin û heger ku kişandina wêna bi carekê ve nikaribe bête bikirin, debera wêna bi hengeke Iraqî ve bide biveguhertin. Barzanî date bigotin: "Walî bi vê pêşneyara hanê ve gelekî pê hate bidilşadîkirin û wî soz date bidan, ku ew dê ji bona bi cihanîna vê mebesta hanê ve ligel Desthilatîyên Bilind de bide bikarkirin. Piştî çend rojan pêrûniştin li ser pêşneyarê de hate bikirin. Gava ku ez ji bona Barzan hatim bivegerandin û min pêçek di rêya xweyî Bilê de ji bona ser wargeha henga Ingilizî date bikirin. Di pêşewazîya min de ji bal Serheng de gelekî bixêrhatin wî ji bona min date bikirin û wî ji bona min date bigotin: Ez ji bona pêsipartina agehdarim û min ji Rêberîya xwe ferman dayite biwergirtin, ku ez xwe bidim biamadekirin, da ku ez heremê ji bona hengeke Iraqî li ser daxwaza we de bidim biberdestkirin. Ez we bi jîyaneke xenêbûnê ve ligel birayên weyî Musulman de didim bipîrozkirin. Em Ingilîzên

35 Barzanî û Tevgera Azadîxwazîya Kurd 1931 - 1958

Xwedênenas dê ji herema we bêtin biderkevtin û dê emê ji xwe re li zînetê de bidin bitemaşekirin".

Barzanî date biservekirin, gava ku ez ji bona Barzan hatim bivegerandin, min ji Şêx Ehmed re rûdan date bixuyanîkirin, xwesr Şêx Ehmed hate biliberkevtin, bê kanî gotina Efserê Ingilîzî çî dide biderxistin û wî pêşbînîya nexweşbûna gûrbûna zînetê date bikirin û wî date budubarekirin; ku dê Ingilîz di demeke kurt de lêdanekê ji bona Barzan bidin bilêxistin.

Piştî pêlekê henga Ingilîzî ji Bilê de hate biderkevtin û li şûna wê de hengekê Iraqî di bin rêberîya Sertîp Berqîyê birayê Bekir Sediq de hate biwarkirin. Bi ghiştina Sertîp Berqî ve ji bona Bilê wî dest bi peydakirina dijwarîyan li dijwarîyan de date bikirin û wî dest bi pêçûnên nêtkirî û xwendekarî ve date bikirin.

Hêrîşa Biradostan

Ji alîyê din de desthilatîyan bi çavsorkirina Eşîrên din ve li ser Barzan de datin bipiştgirtin. Di havîna sala 1931 de Biradostî²⁰ bi rakişandinekê ve ji bona ser Barzan li ser Eşîra Şêrwanî pê hatin birabûn û wan maldarîyên xelkên gundên Gerkal, Kolek û Babekî²¹ dane bitalanîkirin û wan mal datin bişewitandin.

Di wê gavê de Barzanî bi serdanekê ve ji bona wê heremê dihate birabûn. Wî Peye bi ser hev ve dane bikomkirin û ew bi dû Talankeran ve hate bikevtin, tanî ku wî ew li deşta Hêrtê²² de datin bidîtin. Piştî

²⁰ Biradost Eşîreke, ya ku ew li ser sînorê rojhilatî herema Barzan têtê bikevtin. Ji Serokên wê Mehmed Xelîfe Samed û Dînya dihatin berdekevtin, yê ku ew ji bal Şêx Reşîd Lolan biserokîkirin. Navênîya wêna bi navçeya Sîdekan ve têtê biderkevtin, ya ku ew bi melbenda Rewanduz ve têtê bigirêdan.

²¹ Gundên Gekal, Kolek û Babekî bi gundên dawîyî Şêrwanîyan ve li ser sînorê Eşîra Biradostan ve têtin biderkevtin.

²² Deşta Hêrtê bi deşteke rast ve têtê biderkevtin û ew li rojavayî herema Biradostan de bi sînorê xwe ve ligel Barzanîyan têtin bikevtin. Ew di havînan de pir bi germ ve têtê biderkevtin û ev deşta hanê bi baştirîn cih ve ji bona xwedîkirina pez ve di zivistanan de têtê biderkevtin.

berengarîyeke bi lez ve tevaya mal, mer û malatên xelkên wan gundan date bizîvirandin. Careke din jî pêrabûna talanîyê di wê herema hanê bi xwe de di 25. 11. 1931 de hate bidubarekirin. Di vê carê jî de Barzanî berengarî Talankeran hate bikirin û Şêx Ehmedê Barzanî Welî Beg²³ li ser serê hêzeke mezin de di roja 27. 11. 1931 de date birêkirin. Di berengarîya pêşî de Biradostî hatin bibezandin û wan malên talankirî li dû xwe de datin bihiştin; belam Welî Beg bi vê ve nehate bitêrkirin û ew tanî nava malên wan bi dû wan ve hate bipeykevtin. Biradostî di vî şerê hanê de pir xerab hatin bişikestî.

Likarxistina hêrîşî ji bona ser Barzan

Piştî bezandina Biradostîyan Qaimqamê Zêbarê li Bilê de pêwendî ligel Şêx Ehmedê Barzanî de bi navê Serdarîya Iraqê ve bi daxwaza wêna ve ji bona bi dawîanîna pevçûnê ve di navbera Barzanîyan û Biradostan de date bikirin. Şêx Ehmed daxwaza Serdarîyê bi erînê ve date bibersivkirin û wî amadebûna xwe ji bona pêşneyarekê ji bona çarekirina pevçûnê ji bal Serdarîyê de date biderxistin, bi mercekî ve ku ew ne bi mêldarî ve bête biderkevtin. Qaimqam bersiva wî date bidan û wî amadebûna xwe ji bona çûna heremê date biderxistin, da ku ew li wêderê de li ser rûdanan de bide bigerandin û wî ji Şêx Ehmed date bixwestin, ku ew yekekî ji Bawermendê xwe ligel wî de bide birêkirin. Şêx Ehmed birayê xwe Mohemed Sidiq ligel wî de date binardin û wan di 3. 12. 1931 de ji bona gerandina nava heremê dane bidestpêkirin. Di vê pêla hanê de Mele Mustefa bi karekî din ve di derveyî Barzan de dihate bidîtin. Agehdarî ji bona Sertîp Berqî hatin bigihandin, ku Barzan ji hêzan bi vala ve tete biderkevtin û li nik Şêx Ehmed bes û bi تنها ve jimareke pir kêr ji Pasevanan têtin bipeydakirin. Jê re xweser ferman hatin bidan, ku ew hêrîşa Barzan bide bikirin û ew Şêx Ehmed bide bidîlkirin, da ku ew vê kêsa zêrînî ji destên xwe nede biberdan. Bi rastî jî ve Barzan ji

²³Welî Beg bi Kurê Seid ve tete biderkevtin. Ew di gelawêja sala 1945 de hate bigorîkirin, gava ku ew ji bona bingeha polîsî Mêrgesore hate biçûyin, da ku ew hin ji kar û barên xelkên heremê bide birêvebirin. Di nava bingehê de hate bigulebarankirin û ew hate bigorîkirin. Ew bi rêberekî pir giring ve li nik Barzanîyan de dihate biderkevtin.

Şervanan bi vala ve dihate biderkevtin; jiber ku ew ligel Welî Beg de yanjî ligel Mohemed Sidiq de hatibûn biçûyîn.

Pîlana serdarîyê bi dorlêgirtina gundê Barzan ve û daxwaz ji Şêx Ehmed bi berdestbûnê ve bi bê merc û bend ve dihate biderkevtin. Wê çaxê serdarîyê dikarîbû hemû mercên xwe li ser Barzanîyan de bida bidanîn; jiber ku hîç Barzanîyekî nikarîbû çekan ber bi rûwê serdarîyê ve bide bivekirin, tanî ku Şêx Ehmed di nava destên wê de dihate bidîtin.

Şerê Berqî Beg

Di berbeyana şeva 9. 12. 1931 de Sertîp Berqî hêzên xwe datin biajotin û ew bi pesarên Barzan ve bi tîrêjên pêşîyî berbeyanê ve hate bigihaştin û wî hêzên xwe xweser dane bibelavkirin û ew ji dorlêgirtina gundê Barzan hate bibawerîkirin. Di wê gava ku Şivanek ji gund hate biderkevtin, ew hate bigirtin û ew ji bona nik baregeha Sertîp Berqî hate bibirin. Sertîp Berqî pêre nameyek ji bona Şêx Ehmed date binardin û wî têde berdestkirina wînameyê xweser bê merc û bend date bidaxwazîkirin. Gava ku Şivan ji bona gund hate bivegerandin, wî name ji bona Şêx Ehmed date bigihandin û wî jê re tiştên bi çavên xweyî dîtî ve date biveguhastin.

Mele Mustefa ji bona Barzan di êvara derbasbûyî de ango di 8. 12. 1931 de hatibû bivegerandin û hêjî agehdariya gihaştina wîna bi Berqî ve nehatibû bigihandin. Xweser Şêx Ehmed ji xaniyê xwe ji bona mizgeftê hate biderkevtin û wî ji bona birayê xwe Mele Mustefa û ji bona hemûyên di gund de ji çekdran di wê bêhnê de date bibangkirin û wî li ser danavê de ji wan re date bigotin û wî ligel wan de date bişêwirdarîkirin, bê kanî çî divê bête bikirin. Li ser liberxwedanê û bergîrîkirina Zordaran de tanî dilopa dawîyî xwînê hate bilihevîkirin. Şêx Ehmed bi nayîna bi carekê ve li ser nameya Berqî de date bibersifkirin û wî jê re date bigotin, ku tu bi hêzên xwe ve ji bona ser malên me hatîye bigihandin, liberxwedan bi mafeyekî rewa ve tête biderkevtin; jibervêjî dê emê li ber xwe de bidin bidan û em nayêtin biberdestkirin û çî ji te tête bikirin, tîrxemyê têde nede bikirin. Peyan cihên xwe datin bigirtin û wan xwe ji bona şer dane bilidarxistin û Şêx Ehmed bi xwe jî ve ji bona ser girên palpêdayî bi ser Barzan ve hate bihilkişandin, yên ku ew bi Gerwa binî ve têtin binavkirin. Bi tîrêjavêtina rojê ve belafirek di ser gund re hate bifirandin û wê berê

rêjînka xwe ber bi gund ve date bivekirin û wê gule li ser de datin bibarandin. Piştî vê xweser gulên rêjînk û tivingan li ser gundê Barzan de ji hemû layekî hatin bibarandin. Şerekî germ û giran ne mîna hev di navbera herdu alîyan de tanî danê êvarê hate bidirêjkirin. Barzanîyan li ber xwe, pîrek û zarokên xwe de bi mêrxasî ve dane bidan. Di êvarê de û bi hêrîşeke pêgîrî ve Barzanîyan ji sê semtan ji bona ser hêzên sipahîyî dane bihêrîşkirin, tevîjî ku jimara Barzanîyan bi 80 kesî jî ve nedihate bigihaştin. Piştî şerekî sext û pir caran jî bi songoyan jî ve dihate bikirin. Zordar bi pîsî ve hatin bibezandin û Sertîp Berqî ligel jimareke kêr ji hêzên xweyî hevbeşî di hêrîşê de hate birizgarîkirin û ew bi saxî ve ji bona wargeha hengê hatin bigihaştin. Barzanî bi dû wan ve tanî pesarên wargeha hengê hatin bikevtin.

Zordaran gewdên Kuştî û Birîndarên xwe û komên pir ji çekan li dû xwe de di gorepana şer de datin bihiştin. Jimara gewdên Kuştîyan bi 126 gewdan ve dihate biderkevtin û herwehaji jimarek jî hatin bidîlkin. Şer bi serkevtina Barzanîyan ve bi rengekî wetov ve hate bidawîkirin, ku Zordaran weha bi carekê ve nikarîbûn ji xwe re bidana bipêşbînîkirin û bi destkevtinên baş ji çek û teqemenîyê bi destên wan ve hatin bikevtin.

Ziyanên Barzanîyan di vî şerê hanê de bi pênc Gorîvanan û pênc Birîndaran ve dihatin biderkevtin û Gorîvan ev bûn:

1. Mehmud Zubêr Barzanî
2. Hecî Babekir Hevingî
3. Teyib Şêro Hevingî
4. Çîçkok Hevingî
5. Ezîz Mustefa Biban

Gava ku xebera hêrîşa ser Barzan ji bona Mohemed Sidiq hate bigihandin, wî fermana destdanîna li ser Qaimqam û her 8 ji Pasewanên wîyî Polis de date biderkirin. Wî hêzek di bin serdarîya Heso Mohemed Emîn Pîrsiyavî de li gundên ser tuxûbên herema Biradostan de date bihiştin, da ku ew wan bidin biparastîn û bibergîrîkirin; heger ku ew careke din ji bona talanîyê bêtin bihêrîşîkirin. Wî hêzên xweyî din ligel xwe de dane birakirin. Li nêzîka gundê Bêdaron de Polisekî ji pasevanîya Qaimqam date bibazdan, belam ew bi gulan ve hate bibarandin û ew hate bikuştin. Ew bi Polisekî fileyî bi tenha xwe ve di nava Pasevanîyê de dihate biderkevtin. Ingilistan tawanbarîya vê kuştinê bi ser hostê Xelîl Xweşevî ve date bihildan; jiber ku ew Fileyê bi tenha

39 Barzanî û Tevgera Azadîxwazîya Kurd 1931 - 1958

xwe ve dihate bidîtin û wê didate bigotin, ma çima Polisekî dinê Musulman nehate bikiuştin? Ingilistane her û her bi berdestkirina Xefîl Xweşevî ve bi bê merc û bend ve di her gift û goyekê de didate bidaxwazîkirin. Emê careke din jî li ser bîrxistina wê de bêtin bivegerandin.

Di roja 11. 12. 1931 de Mohemed Sidiq ligel hêza xwe û Qaimqam de ji bona Barzan hate bigihaştin. Şêx Ehmed bi berdana Qaimqam, Pasevanên wî û Dîlan ve, yên ku ew di şerê Barzan de hatibûn bidîlîkirin, date bifermankirin û ew li jêr pasewanîyeke dilsoz de tanî pesarên Bile hatin biveguhastin. Şêx Ehmed bi Qaimqam re nameyek ji bona Berpirsiyaran date binardin, ku ew têde peroşîya xwe beramber bi wan rûdanên dilşewat û gorîyan ve dide biderxistin û dilbijandina xwe ji bona vegerandina aramyê û asayîşê ji bona heremê date biderxistin.

Jiber hoyên cudan Serdarîyê pêrûniştina xwe ji bona daxwaza Şêx Ehmed date bidiyarkirin. Ji van hoyên hanê jî mijûlbûna hêzên sipahî bi vemirandina şureşa Şêx Mehmed ve li Sulêmanîyê de, hatina dema zivistanê, ya ku têde pêrabûnên sipahî di heremê de nikarin bêtin bikirin û jiber liberxwedana xurt, ya ku Barzanîyan datin bikirin û ya ku têde serpêhatîyên kûr pê Sertîp Berqî Beg di roja 9. 12. 1931 de dane bifêrkirin, têtin biderkevtin. Herwehajî Desthilatîyan dane bibawerîkirin, ku ne henga Bilê nikare pêrabûna hêrîşeke din bêyî hêzên dinî nuh pir bi jimara xwe ve û baş bi çekkirina xwe bide bikirin. Van hemû hoyên hanê bi hev re pal bi serdarîyê ve dane bidan, ku ew xwe ji bona demekê ji helwesta xwe bide bivekişandin û wê amadebûna xwe û dilbijandina xwe ji bona lihevhatinê ligel Şêx Ehmed de date biderxistin.

Herem tanî buhara sala 1933 de bi aramî ve hate biparastin. Di destpêka dema buharê de agehdarî ji bona Şêx Ehmed li ser nêta serdarîyê nebaş û gavên wêyî ji bona komkirina hêzên mezin de di Rewanduz, Akra û Imadîyê de hatin bipêgihastin, da ku ew ji bona hêrîşeke mezin bêtin bikaranîn.

Li ser serdarîyê de divabû ku ew careke din ji nûve çavnerînekê li ser pîlanên xwe de ji ber liberxwedan û qehremanîya Barzanîyan bide bikişandin, ya ku hêzên wê di roja 9. 12. 1931 de beramber hatin birûkirin; jibervêjî wê date bihestkirin, ku her hêrîşeke din li ser Barzan de jêre pilanekî hûrtir û hêzeke mezintir tête bidvakirin.

Mebestên Serdarîyê beramberî Barzan

Hemilton di nivîsta xwe de "Rêyek di Kurdistanê de" li ser mebestên nebaşî serdarîyê de beramberî Barzan û li ser sorbûna wêna de bi ne-mankirina wêna ve bi her buhayekî ve dide bidubarkerin. Ew dide bigotin: "Carekê gava ku serdarîyê der sala 1931 de hêrîşa xwe bi ser Şêx Ehmed ve date birakişandin, ez bi vê bîr û bawerîya hanê ve hatim berbirûkirin. Başe, ma emê çî bi sipahê Iraqî ve bidin bikirin, yê ku me ew bi xerckirina malekî mezin ve dane biamadekirin û biçekkirin, heger ku em wî ji bona ser rêya teyî Rewanduz nedin birêkirin, da ku ew xwe fêrî hunerên şer bidin bikirin û da ku ew xwe li ser pêrabûna cengê de beramber bi Kurdan ve bide bihînkirin.

Evaya bersiva min bû, ya ku ew bi pêkenînê ve hate bibe-ramberîkirin:

Ji vê heremê ji bona Begdadê û Musilê berfîyên fireh ji heremên biyabanîyî valayî têtin bidîtin, ji yê ku ew ji bal Iraqê de ji her dewletekê bêtir dide bimaldarîkirin û ji yê ku ew pir bi başî ve ji bona bikaranîna tiving, topên meydanî û livandina tankan û firandina balafiran têtin biderkevtin. Debera top li wê derê de bêtin bipeqandin; jiber ku metirsî nayête bidîtin, ku hîç kesek dê bête bibirîndarîkirin. Belam wan ji bona Kurdistanê nedin birêkirin; jiber ku hinek Ereb jî li jêrî de têtin bidîtin, dibe, ku ew jî bêtin bibirîndarîkirin".

Wisa tete biderkevtin, ku serdarî li ser lêdana Barzan de bi vê hîşmendiya kevnepereştî şofînîyî kîndar ve bi sorbûn ve dihate biderkevtin. Wê ezmunkirin û fêrkirina sipahê Iraqî li ser hunerên şer de di şerên sitemkar de beramber bi Neşînvânên bê guneh ve, ji yê ku ew bi wê siyaseta zordarî û cudakirinê ve bi dijî xwe ve nedihatî bipêrûniştin, didate bidaxwazîkirin.

Derîyê Çarem

Serhildan

Hêzên serdarîyê di navînîyên hersê melbendên Akra, Imadiyê û Rewanduz de ji meha avdara sala 1932 de hatin bikomkirin û wan xwe xweser ji bona destpêkirina hêrîşê dane bilikarxistin. Ebdul-Eziz El-Uqeylî di nivîsta xwe de "Livandinên Barzanîyî Pêşî" vê amadebûna komkirinê bi lêdana Barzanîyan ve dide bipesindan. Ev jî bi pesnekî hûr ve tête biderkevtin. Civata Wizaretê di civîna xwe de di 12. 1. 1932 de biryara hêrîşeke fireh de ji bona ser herema Barzan de date biwergirtin, da ku ew serpereştîyeke bajartî di herema Barzan de bide bidamezîrandin.

Ev hoyê hanê hîç bingehek jêre nedihate bidîtin; jiber ku serpereştîya bajartî di herema Barzan de dihate bipeyda kirin û Şêx Ehmed bi dijî wê ve nedihate biderkevtin; mîna ku Hemilton di nivîsta xwe de dayite bigotin, ma emê çi bi sipahê Iraqî ve bidin bikirin, yê ku me ew bi xerckirina malekî mezin ve dane biamadekirin û biçekkirin? Armanc ji vê komkirina sipahî hanê bes û bi tenha ve nabûdkirina Barzan bû; ev jî jiber helwesta wênayî welatîyî hîmkirî bû.

Ez bi pêwistî ve didim bidîtin, ku ez metnê nivîstina Uqeylî ji nivîsta wîyî "Livandinên Barzanî pêşî" li ser komkirinê û lêdana Barzanîyan bidim biveguhêstin, da ku ji me re gewrebûna hêzan bête bixuyanîkirin, yên ku ew ji bona hêrîşî bi çekên xwe ve hatibûn bitirxankirin.

Komkirina ji bona lêdana Barzanîyan

"Biryara Civata Wizaretê: Jiber çûna Şêx Ehmed li ser liberrabûna xwe de, hêrîşkirina wîna li ser gundên Eşîran de, yên ku ew serên xwe ji bona desthilatîya wî nadin bitewandin, nedana wîna ji bona pêşkeşkirina bacan û ji bona armanca damezirandina serpereştîyeke bajartîyî bi rêxistî ve di herema Barzan de Civata Wizaretê di civîna xwe de di 12. 1. 1932 de date bibiryarîkirin, ku ew Navçeyan li heremên Şêrwan, Baroş - Barzan- û Muzurî Bala de bide bidamezirandin û ew li her heremekî ji van hereman de avanîyekê ji bona navîniya Navçe û baregeha Polis bide bidurustkirin. Herwehaji divê livandin bi dijî Şêx Ehmed ve di wê demê de bête bidestpêkirin, gava ku li ser de Wizareta Navxweyî û Liberxwedanê bidin bilehevkirin.

Pilana Sipahî:

A. Ji bona bicianîna biryara jorî cengoşa giştî pilana tê date bidanîn, da ku bi livandinên sipahî ve bi dijî Şêx Ehmed Barzanî bête bipêrabûn û herwehaji ligel Wizareta Navxweyî de hate bilihevhatin, da ku bi cianîna pilanê ve di roja 15 avdara sala 1932 de bête bidestpêkirin.

Komkirin bi vî corê hanê ve hate bikirin:

1. Di herema Balek de -hêza day di bin fermandariya Piştîvan Xelîl Zekî de, Baregeha wê hêza day.
Hengela Suwariyî sêyem -jê kê m liqê Siyafe û Pelê Rêjînkê-
Betariya Çiyayî duwem
Hengên Peyeda duwem, sêyem û nehem
Nexweşxaneyekê meydanî
Pelekî rêjînkîyî xwedroyî
Pelekî veguhestinêyî xwedroyî
Sê pelên ji bona veguhestina Cenaweran
Refekî alîkarîyî Iraqî

43 Barzanî û Tevgera Azadîxwazîya Kurd 1931 - 1958

Govalekî Avêtinêyî Ingilizî
Hêzek Polisyî pêkhatî ji 100 Polisên Peyade û ji 200
Polisên Suwar

2. Ji Akra: Rêzgelê Akra
Henga Peyadeyî pêncem
Pelê Topê (ji Betariya Çiyayî sêyem)
Liqê Siyafe û Pelê Rêjînkê (ji Hengela sêyem)
3. Ji Kerkuk
Henga Peyadeyî heftem ji bona parastina wêna

Kar dê li ser sê beran de bête bikirin:

Berê yekem: Vegirtina herema Şêrwan û vekirina rêyekê têde û pêkanîna navînîya Navçeyekê li nêzîka Goratû û durustkirina bingehêkî Polis di Pîrsiyaf û Rêzan de

Berê duwem: Derbasbûna çemê Rokock li nêzîka Çama û vegirtina herema Mizurî Bala û pêkanîna navînîya Navçeyekê û bingehêkî Polis têde û durustkirina pirekê li ser çemê Rokock de li nêzîka Çama de

Berê sêyem: Vegirtina Barzan û pêkanîna navînîya Navçeyekê û bingehêkî Polis têde

B. Weha em didin bidîtin, ku pîlanê bi cihkirina Liberrabûnvanan de di berên Bile û Imadîyê de û kevtina wirde wirde ji bona nava herema Liberrabûnvanan de ji aliyê Bavistan didate biarmancikin, da ku Şêx Ehmed û Peyên wî bêtin bigivaştin û ew bi berdestbûnê ve yanjî bi revê ve ber bi rojava ve ji bona layê Imdaiyê yanjî ber bi bakur ve ber bi xakê Turkî ve bêtin bineçarîkirin. Da ku di rûwên wî de ev herdu ber bêtin bigirtin, bi bergirtina berê di navbera bingehê Surî û dawîya sînorên herema Rêkan de bi hêzên Polisyî li wêderê de hate bibiryarîkirin, yê ku ew bi rêzgelê Pol ve dihatin binavkirin û rêberîya wan ji bona Destyar Ezra hate bisipartin.

Komkirin:

Di roja 13. 3. 1932 de hêzên diyarkirî di benda jorîyê sêyem de li cihên nîşankirî de hatin bikimkirin û hêzên civandî li balek de bi navê hêza dayî ve hate binavkirin û serdarîkirina wêna ji bona Fermandarê herema rojhilat Piştîvan Xelîl Zekî hate bisipartin, yê ku ew ji wargeha xwe li Kerkukê de di roja 11. 3. 1932 de hate birêvekevtin û ew ji bona Diyana di demjimara heşt û nîv de di roja 12. 3. 1932 de hate bigihaştin. Wî li wêderê de ji xwe re wargehek date bivekirin û xwe ji bona bicîanîna pilana pê bi sipartî ve date bilikarxistin. Wargeha giştî jê date bixwestin, ku ew pilana bi pêşkevtinê ve bide bidanîn û herwehaji ew wî Rêzgelî bide bixuyanîkirin, yê ku ew dê bi livandinan ve bête birabûn û yê ku ew bi navê Rêzgela day ve hate binavkirin. Ev Rêzgela hanê ji van hêzên tên hate bipêkhatin, yên ku ew ji hêza day hatin biwergirtin û serdarîkirina wêna ji bona Sertîp Heci Sirî Ehmed hate bisipartin:

Wargeha Rêzgelê Day

Liqekî Suwariyê û Pelekî Rêjînkî ji Hengela Suwariyî sêyem

Desteyekî Topê ji Betaîya Çiyayî sêyem

Henga Peyadeyî duwem û sêyem

Hêzeke Polisî pêkhatî ji 100 Polisê Peyade û ji 100 Polisê Suwar".

Bivêbûna Wezaretê Navxweyî ji bona Şêx Ehmed

Di 10. 3. 1932 de Wîzaretê Navxweyî bivêbûnek ji bona Şêx Ehmedê Barzanî date binardin, da ku ew divê li ber Qaimqamê Zêbarê de di dema dawî roja 14. 3. 1932 de bête bigihandin, da ku ew dilsozî û sertewandina xwe beramberî serdarîyê bide bidazanîn. Herwehaji Serdarê Siyasîyî Ingilîzî jî nameyeke wetov ji bona Şêx Ehmed date birêkirin.

Şêx Ehmed bivêbûn date binayînîkirin; jiber ku ew bi rast û durust ve dihate biliberkevtin, ku dê ew bête bigirtin; jiber ku li nik wî de agehdariyên giştî li ser mebestên serdarîyê de dihatin bidîtin.

Barzanîyan ji aliyên xwe jî bi parastin û amadekirina xweyî pêwistî ve ji ber bergirtina Dujmin dane bidestpêkirin û wa hêzên xwe ji

45 Barzanî û Tevgera Azadîxwazîya Kurd 1931 - 1958

bona sê beşan dane biparvekirin û ew bi vî rengê hanê ve dihatin biderkevtin:

1. Hêza bingehî di bin rêberîya Mele Mustefa Barzanî de dihate bidîtin, ya ku jê re berpirsiyarîya bergîrîya mîlê Mêrgesor - Şêrwan beramberî hêza Day dihate bidîtin.
2. Hêzeke din di bin rêberîya Mohemed Sidiq Barzanî de bi alîkarîya Heci Tahayî Imadî ve ji bona mîlê Balinde - Imadîyê beramberî Rêzgela Pol dihate bidîtin.
3. Şêx Ehmed ji xwe re bi hêzekê ve beramber bi Henga Bilê ve, ya ku ew bigir nîvdorlêgirtî bû, date biparstin, da ku ew rêya Pêris beramberî alîkarîyên ji Akra nardî bide bibirîn.

Tevaya hêzên Barzanîyan ji 1000 Çekdarî bêtir nedihatin biderkevtin û çekên wan ji tivingên cudan - ji Mazer, Cambizar û Ingilizî û hin ji Rêjînkên Liwis dihatin biderkevtin, ji yê ku wan ew di şerê 9. 12. 1931 de ji hêzên serdarîyê datin bisitandin. Li nik wan de pir teqemîn bi kem ve dihate biderkevtin û kanîya wanî bi tenha xwe ve ji bona teqemenîyê di bestkevtinên wan de di şeran de dihate biderkevtin.

Herwehajî wan encumenên serpereşîyê ji bona girawkirina gihandina berên şer bi kelûpelên cengê û nan ve datin bidurustkirin. Wan encumenan nan ji gundên piş berê şer didatin bikomkirin. Xelkên gundên li ser xêza berê şer de ji bona gundên paşî berê şer hatin bibarkirin.

Belam li ser hêzên serdarîyê û çekdarîya wan de bi dirêjî ve berî vêna li nik Uqeylî de hate biderkevtin.

Destpêkirina Kuştinê

Hêza day bi livandina xwe ve ji Balek ji bona Mezne di roja 15. 3. 1932 de date bidestpêkirin û di roja din de ji bona çûna Mêrgesorê hate birêkevtin û ew di danê êvara wê rojê de ji bona Mêrgesor hate bigihaştin.

Şerê pêşî di 18. 3. 1932 de li pesarên gundê Korkê

rojhilatî Mêrgesor de hate bikirin. Yekaneyên ji hêza Day ji bona wî mîlî hatin bipêşvekevtin û hêzek ji Barzanîyan di bin rêberîya Nadir Ehmed²⁴ de ligel de hate biberengaîkirin. Piştî şerekî giran hêza day xwe ji bona Mêrgesor date bivekişandin; piştî ku wê jimareke ji laşan û kelûpelên cengê li dû xwe de date bihiştin. Ji bona tolgiştina vê revîna hanê û ji bona berzkirina navtêdanê hêza asmanîyî Patîşahîyî Ingilizî -R. A. F.- ji bona nava şer de di 19. 3. 1932 de hate bibeşdarîkirin û ew bi nijdeyên asmanîyî no ve ji bona ser piranîya gundên herema Barzan û bi taybetî ve ji bona ser gundê Barzan bi xwe ve hatin birabûn. Barandina asmanî bi şev û roj ve li ser heremê de bi rengê pir no û tîr ve date bidirêjkirin, di gava ku şerên bejayî di tîkwerhatinên bigir rojane de dihatin bikirin; lêbelê ew ne bi giringî û germî ve dihatin bikirin û bi vî rengê hanê ve zînetê tanî payîna meha avdarê date bidirêjkirin.

Şerê Dola Vajîyî bi navûbang ve

Di destpêka cotan de rêzgela Day di bin serdarîkirina Sertîp Heci Sirî Ehmed de bi hêrîşeke fireh û no ve li ser wê mîlê de hate bipêrabûn û wî gundên Mamisk, Jajok, Vajî, Pîrsiyaf, Binê Biya, Korkê û banê bi ber xwe ve dane bixistin.

Hêza asmanî jî bi karên pir mezin ve ji bona piştgiştina Peyade him bi azoqekirina wîna ve û himjî di şer de date bikirin. Di roja 3 cotanê de rûdanek hate birûdan, ku ew hîç li ser guhan de nedihate bikevtin. Barzanîyan dola dirêjî ji bona Pîrsiyaf bi valayî ve ji bona pêşkevîna rêzgela Day datin biberdan û wan xwe li ser bilindîyan de datin bisengînkirin. Rêzgelê date bigumanîkirin, ku wê armancên xwe bi bêliberxwedanî ve date bigirtin; belam pir bi lez û bez ve hemû tişt hatin biveguhertin, dilxweşî û payebûna wan bi destanekê û bazdanekê ve hatin biveguhertin.

²⁴Ehmed Nadir ew bi bavê Doktor Seid Endamê Komitîya Navînîyî Partîya Demokratî Kurstan ve tete biderkevtin, yê ku ew ji bal kongirê nehemîn de hate bihelbijartin. Ehmed Nadir yekê ji Rêberên mîrxas û li serxwe de tete biderkevtin. Bi gernasîya xwe ve û bi lédana nişanê ve pir bi nav û deng bû.

Pir caran Barzanî ji me re yaddaştên xwe li ser wî şerî de bi serfirazîyeke bilind ve didate bigotin wî ji me re didate bidubarekirin, ku ew roja hanê ji bona wîna bi ezmoneyeke tirş û tal ve dihate biderkevtin û bi regekî taybetî ve wî bombebarandîna asmanîyê no û li dû hev de didate bibîrxistin.

Di şeva 3/4 cotanê de Barzanîyan tevaya hêza mîlê datin bikomkirin û wan bi hêrîşeke xurt ve ji bona ser rêzgela Day dane bidestpêkirin. Wan ew ji hêzên mîlê dane bitenhakirin û piştî şerekî di navhevdû de piranîya rêzgelê hate binabûdîkirin û bes û bi tenha ve jê jimareke pir kêr hate birizgarîkirin. Jê jimareke mizîn jî 253 kes hatin bikuştin, jimareke mezin hatin Birîndarkirin û jimareke mezin jî hatin bidîlîkirin. Herwehajî hemû çek, kelûpel û teqemenîyên wan jî hatin bidestkevtin. Ev şerê hanêyî mayînî bi şerê Dola Vajî ve hate binavkirin, yê ku ew bi serbilindîyekê ve ji serbilindîyên Barzanîyan tete biderkevtin. Pir xweşxwevanî û sitiranên gelerî li ser vî şerî de hatin bidurustkirin.

General Robinsonê Ingilîzî bi xwe ve serpereştîya vî şerî hanê didate bikirin û ew li paşengê hêzan de dihate bidîtin. Di bidûkevtina qeflên Şikestîvanên rêzgela Day de Pêşengên Barzanîyan bi wargeha Robinson ve hatin bigihaştin û Robinson bi xwe jî ve di nava Birîndaran de dihate bidîtin. Belam jî bedbextîyê wê çaxê ew nehate binaskirin. Tevaya kelûpelên waregehê hatin bigirtin. Barzanîyan rê bi vegerandîna Birîndarana wan ve ji bona Mêrgesorê wargeha hêza Day datin bidan û pêrejî wan yarmetîya wan Birîndarên ji çûnê kevtî tanî gihandina wan ji bona wargeha wan li Mêrgesorê de dane bikirin.

Lêdana vî şerê hanê li ser Ingilîz û Nokerên wan de mîna birûskê hate biderkevtin. Wan ji bona xurtkirina hêza Day bi yekaneyên din ve datin bikarkirin, yên ku ew ji Kerkuk û Begdad hatin bikişandin. Belam ew bi pêrabûna her hêrîşeke din ve di vê mîla hanê de nehatin biserkevtin. Jîbervêjî wan nijdên asmanî bi şev û rojê ve bi regekî hov ve dane bitîrîkirin.

Bidestkevtin û Zîyan

Di vî şerê hanê de komên pir ji çek, kelûper û xurakê bi destên Barzanîyan ve hatin bikevtin. Herwehajî kerwanek bi carekê ve bi 300 hêstirên barkirî ve di nava destên wan de hate bikevtin.

Canê liberxwedanê pir li nik wan de hate biberzûbalkirin û pêgîrî
 û dilsozîya wan ji bona libexwedanê deha bêtir hate bihîmkirin.
 Di vî şerî de 12 Gorîvanên wan dihatin bidîtin û ew jî ev bûn:

1. Ebdulah Mîrxan Mêrgesorî
2. Çavşîn Goranî
3. Husên Mohemed Hosnanî
4. Babekir Bêxşaşî
5. Şerîfkanî Dêrî
6. Ezo Sipîndarî
7. Mohemed Gorî Mamiskî
8. Mustefa Heyderê Dolemerî
9. Xidir Xereyî
10. Mele Selîm Gorkeyî
11. Ibrahîm Şawalî Gorkeyî
12. Şêx Osman Dolemerî.

Herwehajî 34 Birîndarên bi birînen cudan ve dihatin bidîtin.

Sitêra Mele Mustefa Barzanî di vî şerê hanê de bi rengê mezîna
 ve hate biçurusandin. Ew di xêza pêşîyî de ligel Şervanan de dihat
 bidîtin. Wî karîneke sipahîyî mezîna ji bona bi rêvebirina pêrabûnên
 liberxwedanê û herwehajî hêrîşê jî ve date biderxistin, ya ku pê bawerîya
 Şervanan deha bêtir hate bikirin. Herwehajî wî navtêdaneke mezîna ji bal
 birayê xweyî Şêx Ehmed Barzanî de ji xwe re date biwergirtin.

Belam li herdu mîlên din de helwest bi vî rengê hanê ve dihat
 biderkevtin:

1. Li mîla Barzan - Akra: rêzgela Akra bi vegirtina çiyayê
 Pêris ve nehate biserkevtin. Herwehajî gava ku wê di da-
 wîya avdarê de û di çotanê jî de ji bona vegirtina Pêris
 cardin date bikarkirin, vê carê jî ew nehate biserkevtin.
 Henga Bile di cihê xwe de bi dorlêgirtî ve hate bimayîn û
 hîç tu livandin jê nehate biderekevtin. Di 18 cotanê de
 yekek ji balafirên bombehavêj li ser Barzan de gule hate
 bipêkevtin û ew li rojhilatî Barzan de bi 5 Kîlo Mitra ve
 li gundê Hesinka hate bikevtin û Belafirvanê wê jî hate
 bikuştin. Hemû pêrabûnên ji bona gihandina alîkarîyan jî

bona parêzgeha Bile nehatin biserkevtin, tevîjî ku hin ji Serokên Xwefiroşan jî mîna Ehmed Zêbarî û hin ji Şêxên Surçiyên halîkarî ligel serdarîyê jî de dane bikirin. Di vê mîla hanê de Mehmud Feqe Simail Husnî û Yinus Ebdul-Rehman Barzanî hatin bigorîkin.

 - D. Divê du enbar ji bona hilanîna xwarin û vexwarinê tede yek ji wan li Bavistiyan de û ya din li Akra de bêtin bidurustkirin. Divê di enbara Bavistiyan de xorak û em ji bona têrkirina du mehan ji bona 6000 Serbaz û 3000 cenawer û di enbara Akra de ji bona 3000 Serbaz û 1500 cenawer bêtin bitêrkirin.
 - E. Divê qanûnên sipah li ser Parêzgehên Hewlêr û Musilê de bêtin badazanîn.
 - F. Divê cih li derveyê herema livandinan de ji bona wergirtin û xwedîkirina Hevalbendan de bêtin amadekirin, ji yê ku ew dê gornepanên livandinan bidin biberdan.

- G. Divê alîkarîyên diravî ji bona Barzanîyan û - nardîna xorakê ji bona wan û Peyên wan bêtin birawestandin.
- H. Divê bingehên Polîs bêtin bixurtkirin û kelûpelên piêwîst tede bidin bihilanîn, da ku ew ji bona wan demeke dirêj bidin bitêrkirin.
- I. Divê hengekî Polîsî belavkirî di navbera Dihok û Imadiyê li jêr fermanîyaya Rêberîya livandinan bête bidanîn û herwehaji divê ew bi hengeke Polosî din ve ligel hengelekî Siwarî de bête bipîştgirtin.
- J. Divê daxwaza vegerandina Balafîrxana Musilê ji hêza asmanîyî Ingilîzî bi lez ve bête bikin, da ku hêza asmanîyî Iraqî di livandinên xwe de dijî herema Barzan jê sûd ji xwe re bidin biwergirtin. Ji bona vê mebestê du givale ji hêza asmanî bi Rêberîya livandinan ve hatin bigihandin.

Pilana Livandinan

Pilana livandina wer dihate bikurtkirin:

1. Mebest: Tarûmarkirina hêzên Eşîrên li ber rabûyî de û bicîanîna asayîşê di hemû herema Zêbarî de.
2. Ji bona bicîanîna vê mebesta hanê divê livandin di du beran de bête bikin:

Yekem. Bafîstian - Mêrgesor - Xêrezok -
Çame - Lêre - Pîr Rezan.

Duwem. Akra - Dînarte - Pîrekepre - Bile - Barzan.

3. Divê berî roja (S-1) darijandina serbazgelên herdu beran mîna tê bête bicianîn:

Li herema Bavistiyan de
- Tîpa sêyem - tîpa çarem - tîpa pazdehemîn.

Li herema Akra de
- Tîpa pêncem - tîpa yekem - hêzek ji Polîs.

Divê baregeha Rêberîya Livandinan li Hewlêrê de bête bidurust-
kirin.

4. Pêkhatinên hêzan û erkên li ser wan de:

A. Hêza Rewanduz: Ew ji tîpên sêyem û çarem tête bipêkhatin û ew li jêr fermanîya Sergir Ismail Sefwet de tête bidîtin.

Erkê wê: Vegirtina Mêrgesor nala aramanca pêşî.

B. Hêza Bavistiyan: Ew ji tîpa panzdehan, hengekê ji tîpa çardehan, hengeke polis ligel du betarîyên topê de tête bipêkhatin û ew li jêr fermanîya Piştîvan Tahir Mohemed tête bidîtin.

Erkê wê: Parastina gelîyê Elî Beg û Serbazxana Xelîfan, herwehajî pasevanîya ordîgeha Rewanduz.

Divê hêzek mînek ji bona piştgirtina hêza Rewanduz bête bipêkhatin.

C. Hêza Akra: Ew ji tîpa pênc, tîpa yekem, hengek Polîs û hengeleke topxaneyî xwedru bi bê betarîyekê ve tête bipêkhatin û ew li jêr fermanîya Sergird Yasîn Hesen tête bidîtin.

Erkê wê: vegirtina Ser Akra û Dînarte nala armanca pêşî

D. Hêza xwedru: Ew li jêr fermadarîya Piştîvan Nurî Xeyrî de tete bidîtin û ew nala mînekê di nava destê Rêberîya Livandinan de tete bihiştin.

E. Tîpa Polîs: Ew ji henga Polîsî sêyem û çarem tete bipêkhatin û ew li jêr fermanarîya Serpereştvanê Polîs Muzahim Mahir tete bidîtin.

Erkê wê: Pêşkevtin ji Imadîyê ber bi Sorî ve û parastinê heremê û pakkirina wêna ji li ber Rabûnvan de tete biderkevtin.

Ji bil vanjî hêzek ji bona xêza rê û banan hate bipêkhatin, da ku ew li ser xêza rê û banên di navbera Kerkuk, Hewlêr, Musil û heremên din de bête bizalkirin.

Helwesta Şûreşvanan

Tevî vêkevtina şûreşê vê carê jî ne gora dema nîşankirina wê de dihate bilihevkirin, ya ku jê re Şûreşvanan dabûn bidanîn, hîç rev ji wan re ji bil rawestandina beramberî zordarîyê û beramberbûna tirşîya rastê pêve dihate bidîtin. Barzanî ji bona hevîngeha Horê⁷⁵ ji bona dîtina Şêx Ehmed hate biçûyîn, da ku ew amojgarîyên wî bide bibihîstin û ev biryara hanê hate biwergirtin:

1. Mohemd Sidiq Barzanî⁷⁶ dê rêberîya berê Mêrgesor - Rewanduz bide bikirin.
2. Hacî Tahayê Imadî dê rêberîya berê balinda - Imadîyê bide bkirin.

⁷⁵Ev havîngeha hanê li jorî çiyâyê Şêrîn de tete bikevtin. Şêx Ehmed Barzanî di danên havînan de ji bona wê dihate biçûyîn.

⁷⁶Birayê duwemî Şêx Ehmed Barzanî bû û ew ji Barzanî pîrtir bû.

3. Barzanî bi xwe ve dê rêberîya berê Akra ligel serpereşîya wî ji bona hemû beran û sermiyandarîkirina hemû kar û barên şûreşê bi yarmetîya Endamên Encumena Azadîyê ve bide bikin.
4. Berpirsiyarîya dolêgirtina ji bona parêzgeha Bile bi As-ed Xwşevî ve ligel berpirsiyarîya wîna ji bona azoqekirina hêzên berê Akra pê hate bidan.
5. Nardina naman ji bona hemû Serokên Eşîran yên ku wan dabûn bisundxwarin, da ku ew bi rola xwe ve ji bona liberxwedana Kurdistanê bêtin birabûn.
6. Dan û sitandin ligel rêxistinên welatî û Zanevanan de di nava bajaran de da ku ew ligel şûreşê de bêtin birawestandin û da ku ew hêrîşa sipahî li ser Barzan de bidin bitawabarîkirin.

Hîç ji bil kêma kesana ji Serokên Eşîran di demeke kurt de li ser sozên xwe de neman. Piraniya wan çekên bêbextîyê li rexê serdarîyê de datin bihilgirtin û ew jêre nala Kurtêlxweran hatin biveguhertin. Jimareke din ji Serokên Eşîran hatin bigirtin û ew ji bona binê zindanê hatin biavêtin, berî ku ew ji xwe re hîç hewlwestandinekê bidin bigirtin.

Li ser serbazgelan de dihate biderkevtin, ku ew vê carê bi hêzên bêtin ve li ser berekî firehtir ji berê de bidin bişerkirin. Berê şer vê carê ji herema Balek ji rojhilat tanî Imadîyê ji rojava dihate bidirêjkirin. Di cara pêşî de bû, ku Kurdên derveyî Barzan mil bi mil ve ligel Barzanîyan de beşdarî di nava şûreşê de didane bikin. Herwehajî li aliyên Barzanîyan de Efserên bi karîna ve dihatin birawestandin, yên ku wan hunerên cengêyî nuh dabûn bixwendekarîkirin, ji yên ku Ingilîzan pê sipahê Iraqî dabûn bifêrkirin. Herwehajî wan ji bona sipahê Iraqî çekên pêşkevtî dabûn bipêşkeskirin.

Hêzên şûreşê bi 5000 Şervan ve dihatin bitexmînîkirin; ji wan 3000 Barzanî bûn û yên mayî ji heremên Balek, Biradost û Zêbarê dihatin biderkevtin.

Şûreşê piştgirtineke gelêrîyê fireh û nemaze ji bal Xwendevanan û Zanevanan de ji xwe re didate biwergirtin, ji yên ku wan hêjabûna wêna ji yên din bêtir didatin bizanîn.

Helwesta Eşîran

Bi hoyê vêkevtina şûreşê ve di berî dema wê de nema dikarîbûn rûdan li gora bernameya danîni de bihata biçûyîn. Serdarî bi girtina wan Kesan ve date bidestpêkirin, yên ku ew li wan de dihate bigûmanîkirin, herwehaji jimareke din jî ji bona dazanîna dilsozîya xwe jêre bi dijî sozên xwe ve dane bibeziîn, yên ku wan ew beramberî bi şûreşê ve dabûn bidan. Yê mayî ji bona demeke kurt ve bi şûreşê ve hatin bigihaştin; belam careke din jî ew bi hêzên serdarîyê ve hatin bigihaştin û wan dilsozîya xwe jêre dane bidazanîn. Ji van jî em van bibîrdixin:

1. Biradostîyan Zaroyên Seyd Taha hêzên xwe ji bona berê Serê Berdê⁷⁷ datin binardin.
2. Zêbarîyan hêzên xwe ji bona berê Akrê datin binardin.
3. Hinekan ji Serokên Eşîrên Balek pišta berê Rewaduz dane bigirtin.
4. Hemû Merovên Hac Taha bi şûreşê ve hatin bigihaştin û wan malên xwe ji Imadîyê ji bona herema Barzan dane bibarkirin.
5. Rêkanî û Sorçî di roja pêşî de ji bona serdarîyê ve hatin bigihaştin.
6. Jimarek ji Serokên Eşîran di pêşî de bi temaşekirinê ve ji xwe re hatin birawestandin; belam di paş de ew jî bi serdarîyê ve hatin bigihaştin.

⁷⁷Cihekî sitratêcî ye û ew di navbera Diyana û Sîdekan de tete bikevtin.

Destpêkirina Şeran

Hêza asmanîyî Iraqî bi piştgirtin û yarmetîya hêza asmanîyî Ingilizî (R. AF.) ve tanî dawîyê bi bombebardina heremê ve date bidestpêkirin, piştî ku daxuyanîya Wizaretê di 8. 8. 1954 de hate bidazîn. Rewş û zînet di beran de wetov bû:

Mîla Rewanduz:

Hêzên Şûreşvanan di vî berê hanê de bi nêzîka 1000 Çekdarî ve dihatin biderkevtin, yên ku ew di xêza liberxwedanê de dihatin bipêkirin û ya ku ew ji çiyayê Qelender tanî çiyayê Biradost û rêya giştîyî li nêzîka Hawdîyan de di hate bidirêjkirin. Gundê Şetînê ji bona bargeha Rêberîyê hate bihelbijartin. Ev hêzên hanê beramberî tîpên sisê, çar, panzdeh û hêzên Polîs datin birûkirin.

Di vî berê hanê de şerê pêşî di 25. 8. 1945 de hate bivêkevtin, gava ku tîpa sisê li jêr fermanarîya Sertîp Hesîb El-Rebiî de bi piştgirtina hengeke Polîs ve ji bona vegirtina pesarên rojhilatî çiyayê Qelender hate bipêşkevtin.

Şûreşvanan berengarîya hêrîşê dane bikirin û şerekî bi tîn ve tanî êvara wê rojê date bidirêjkirin û ew bi neçarîkirina vekîşandina Dujmin ve ji bona gelîyî Elî Beg hate bidawîkirin, piştî ku wan bi sedan ve kelex di nava gorepana şer de li dû xwe de dane bihiştin û di nava wan jî de kelexê Serheng Hurmuz Qeyser fermanarê henga duwem di hate bidîtin. Hêza asmanî û topxanê dîlîkirina jimareke pir ji Serbazan piştî xebateke mezin dane birizgarîkirin.

Mohed Sediq bi telaşên bombeyeke topê ve bi sextî ve hatibû bibirîndarîkirin, herwehajî Mele Sulêman Şêxanî, Mohemd Isa Sêlkî û Ebdul-lah Salih Mêrgesî hatin bibirîndarîkirin û Mele Ebdul-hadî Lêrî hate bigorîkirin.

Hemû cih hatin bivegirtin, yên ku ew di pêşîya hêrîşê de hatibûn bivegirtin. Şûreşvanan jimarek ji tivingan û komên kelûpelên sipahî dane bigirtin.

Mohemed Xalid û Sadiq xweser bi berê şer ve hatin bigihaştin, gava ku wan xebera birîndarbûna Mohemed Sidiq dane bibihîstin.

Sipah bi hêrîşek din ve tanî roja 15. 9. 1945 de hate birawestandin. Pêrabûnên sipahî di vê pêla hanê de bes û bi tenha ve li

ser bombebarandina asmanî û topxanê de li ser gundên berê şere de dihatin bitirxankirin.

Şerê Meydana Morîkêyî bi nav û bang ve ¹

Şerê Meydana Morîkê yekek ji şerên mayînî di mêjûwa miletê Kurdî dagirtî de bi gorîyan ve tete biderkevtin. Di vî şerê hanê de Şureşvanan deha baştirîn nimûneyên pehlewaniyê, canpêşkeşkirinê û geransiyê dane bitomarkirin.

Di vê roja hanê de sipahê Iraqê reveke wetov hêjî nedabûn bitamkirin û cihê Meydana Morîkê ji Çavsoran re bi goristanê ve hate biveguhertin. Ev cihê hanê di navbera Hawdîyan û Meznê de tete bikevtin.

Hêzên mîla Rewandûz di bin rêberîya Sergird Ismail Sefwet de di hêrîşê de hatin bibeşdarîkirin. Wan hêrîşa xwe ji sê semtan de ji bona vegirtina Biradost û Qelender dane bikirin û hêza serokî ligel xwedruwan û topxanê de li ser rêya Hawdîyan û Meznê de hatin bipêşveketin.

Şureşvanan xwe li ber hêrîşê de û nemaze di herdu rexên gelî de dane bigirtin û wan nehiştin, ku sipah ji bona bi pêşveçûnê ve bête bipêşkevtin, di gava ku wan bi rengekî rêkûpêkxistî ve ji ber hêza serokî di gelî de xwe dane bivekişandin, ji bona ku ew wê ji bona cihekî baş ji xwe re bidin bikişandin, da ku ew xwe bi ser ve bidin biavêtin; ev cihê hanê jî bi Meydana Morîk ve dihate binavkirin.

Wetov Dujmin ji xwe re didate biwênêkirin, ku wan ji xwe re bi serkevtineke mezin ve dane bicîanîn û wan liberxwedana Şureşvanan dane bitarûmarkirin û herwehaji wan rêya Xwedruwan dane bivekirin. Balafirên hêza asmanî li ser asmanê şer de dihatin û diçûn û wan piştgirtina hergavîyî hêzên bejayî didatin bigirtin. Xwedru û topxane ji bona Meydana Morîkê hatin bigihaştin û sipah xwe li wêderê de date biwarkirin û wî date bixwestin, ku ew li wêderê de bingehê asmanî bide bidurustkirin. Berî demjimarekê bi hatina tarîbûnê ve Şureşvanan bi hêrîşa xweyî giştî ve li ser hêzên Rewanduz de ji bilindayan, ji gelî û ji xêzên pašîn di yek demê de dane bidestpêkirin.

Gûrbûna pileyê şer weha hate binokirin, ku tede herdu rexan pir caran singo didatin bikaranîn û şer bi destanekê ve ji bona Dujmin hate bidawîkirin. Têkûpêkçûneke xurt di nava rêzên Dujmin de hatin

bikevtin, cihên wî yek li dû yê din jî hatin biketin û serbrdayîbûn di nava hêzên yekaniyên wîyî bezandî de hate bizalkirin. Her yekaneyek bi serê xwe ve, bi bê lihevkirinekê û bi bê xwegirtina bi fermanan ve didate bikişandin. Şûreşvanan betariyeke topxanê li Meydana Morîkê de dane biwergirtin, herwehaji wan pir ji xwedruwan dane biwêrankirin. Wan bi sedan ve tiving û rêjînk û komên pir mezin ji fişek û kelûpelên sipahî dane biwergirtin. Wan 80 Kes dane bidîlkin û ziyana Dujmin bi hiştina 480 kuştî ve bi kelexên wan ve li dû xwe de di meydana şer de dihate biderkevtin.

Şûreşvanan bi pênc Gorîvanan ve hatin biziyan kirin û ew ev bûn:

1. Hesên Beg Mîr Mohemed Pîtsiyavî
2. Yusif Gergemoyî
3. Mele Suwar Omer Soranî
4. Elî Cocek Xerdenî
5. Mustefa Omer Bavenî

Jimareke gelek jî hatin bibirîndarî kirin, belam Govan navên wan ji bil navê Serul Mohemed Reşegomî pê ve nayê bibîr kirin.

Ev şerê hanê bi nala lêdaneke piştîşikandinê ve dihate biderkevtin. Rewaniya Neferên sipah hate binizimkirin û li ser kêra wî de di nava rêzên wan de hala bazdan û nexweşî hate bibelavbûn, tanî ku yê derveyê sipah jî pê hatin bihestkirin. Rêberîya sipah hate bineçarî kirin, ku ew nema dustûrdana nexweşiyê bide bidan û herwehaji wê nema destûr ji bona Birîndaran ji bil Birîndarên pir xerab pêve didate bidan. Wê pasevanî li ser rêyan de date bidanîn, da ku ew wanên bazdayî bidin bigirtin.

Serdarî bi bê hêvîbûneke mezin ve li ser kêra beza hêzên wê ve di şerê roja 5. 9 1945 de hate bikevtin, tevî jî ku bobmebarandina asmanî û topxanê bi xurtî ve dihatin bikirin, tevlivê jî de zalbûn di nava destên Şûreşvanan de dihate bidîtin. Piştî ku serdarîyê hate bibawerî kirin, ku dê hêzên wê di tu biserkevtinan de neyêtin biserkevtin, wê destên xwe ji bona xapandinê û dilbijandinê date bidirêj kirin. Wê dan û sitendin ligel Reşîd Lolan de date bikirin û wê di rêya wî re dikarîbû Mehmud Beg Xelîfe Semed û Zaroyên Seyid Taha bidin bidilbijandin, da ku ew bi serdarîyê ve bêtin bigihaştin û ew bê bextiyê li şûreşê de bidin bikirin.

Carekê ji caran ez ji bona Sulêmanîyê der cotana sala 1964 de hatim biçûn; jiber ku şer di navbera şûreşê û serdarîyê de hatîbû birawe-

stan. Gava ku ez di Dokan re hatim biderbasbûn, Femandarê hengêyî girêdayî li wir de ez ji bona ser xwarina firavînê ligel xwe de dame bimêvandarîkirin. Femandarê wê hengê sertîp Seeb Herdan bû. Wî bi xêrhatineke pir germ ve li me de date bikirin û di nava gotinên xwe de ew li ser derbasbûna rûdana şerê Meydana Morîkê de hate biaxivtin; jiber ku ew bi yekekî ve ji Efserên beşdarî têde bi paya Sitwan ve dihate biderkevtin. Wî pir bi bilindî ve li ser mêrxasîya bênimûneyî Barzanîyan de didate biaxivtin. Herwehajî wî ji me re date bigotin, bê ka çilo ew ligel pelê xwe de tûşî hêrîşeke no bû, ew tûşî ziyaneke gewre bû û ew di lingê xwe de hate bibirîndarîkirin. Herwehajî ew bi destanê ve pê hate birûniştin, ya ku ew bi serbazgelan ve di wî şerî de hate bikevtin. Herwehajî pêrejî wî ji me re li ser rûdaneke din de date biaxivtin, ya ku ew di tîrmeha sala 1963 de hate birûdan, gava ku wî komek ji Kurtêlxweran didate biajotin, da ku ew Şoş û Şermenê di herema Akra de bidin bidagîkirin. Ew tûşî hêrîşeke beramberî bûn û ew hatin bineçarîkirin, ku ew tanî parêzgeha sipahîyî Akra hatin bibazdan. Wî bi ken ve ji me re date bigotin, ku Barzanî di şerên 1945 de deha ji niha bêtir bi mêrxastir bûn. Min jêre date bilêvegerandin: Barzanî ew bi yên berê ve têtin biderkevtin û herwehajî çekên wan jî bi xwe jî ve bi yên kevin ve têtin biderkevtin; belam çekên we bi nuhtirîn çek ve ji balafiran, top û tankan ve ... hd. têtin biderkevtin.

Ji lihevhatineke pir bi sersûrayî ve dihate biderkevtin, ku Heso Şerîf yek ji Qehremanên şerê Meydana Morîkê û Omer Axa Qehremanê şerê Şoş Şermenê di wê civînê de ligel min de dihatin birûniştin. Min ew bi wan ve date binasîn. Ew ji cihê xwe hate birabûn û hardu dane bimaçîkirin. Wî Merovê hanê bi serbilindî ve date bigotin: "Ez Merovên mêrxas li ser serê xwe de didim bidanîn, hegerjî ku ew bi Dujminên min jî ve bêtin biderkevtin". Me ew sipaskir û em bi ser rêya xwe ve çûn.

Berê Balinda – Imadîyê

Hêzên Şûreşvanan di vî berê hanê nêzîka 500 Çekdar dihatin biderkevtin, yên ku ew ji bal Hecî Tahayê Imadî de dihatin birêberîkirin, yê ku ew bi welatperwerî û xebata xwe ve bi nav û bang bû. Hêzên serdarîyê jî ji tîpa Polîsan ligel Kurtêlxwerên Rêkanîyan dihatin bipêkhatin, yên ku ew li jêr femandarîya Serpereştê Polîs Muzahim Mahir Ken-an de dihatin bidîtin.

Tu şerên germ û giran di vî berê hanê de nala berên din nehatin bikin. Gelek carî Dujmin date bihewildan, ku ew di ser çemê Zab re bête bibuhurandin û ew ber bi Barzan ve bête bipêşkevtin; belam bergîrîya Şureşvanan hemû pêrabûnên wan datin bişekenandin. Ziyana Şureşvanan bi du Gorîvanan û jimarekê ji Birîndaran ve dihate biderkevtin.

Berê Akra

Barzanî bi xwe ve li ser vî berê hanê de sermiyandarî didate bikin, herwehaji pêrejî wî sermiyandarîya tevaya Beran didate bikin û wî baregehê Rêberîya Şureşê ji bona gundê Gerîsê di dola Nehlê de date biveguhastin. Efserên Azadîxwaz ji Encumena azadîyê ligel wî de hatin biçûyîn, ku ew ji bona bi rêvebirina kar û barên şureşê ve yarmetîya wî bidin bikin.

Hezarûdused Şervanan di vî berê hanê de beramberîya hêzên serdarîyê didatin bikin, yên ku ew ji tîpên yek û pênc û ji hêzeke Polîs dihatin bipêkhatîn û ew di bin fermanarîya Sergird Yasîn Hesên de dihatin bidîtin.

Şerê pêşî di vî berê hanê de di 4. 9. 1945 de hate bivêkevtin, gava ku Dujmin date bixwestin, ku ew dola Nehlê bide bigirtin û wî ji çiyayê Ser Akra bi tîpa yekem û ji Dîmartê bi tîpa pêncem date bidestpêkin. Şerekî xwînavî date bidestpêkin û wî ji berbeyanê tanî dakevtina tarîyê date bidirêjkin û têde tîpa pêncem piranîya ziyanan date bixwarin. Gava ku Şureşvanan xwe bi ser ve datin biavêtin, wê xwe li gundên Gozeke û Şiveherc date biasêkin. Hêza asmanî date bihewildan, da ku ew dorlêgirtinê lê bide bivekin û givaştinê li ser wê de bide bisivikkin; jiber ku hêza asmanî di tevaya rojê de Şureşvanan bi bomban ve didatin bibarandin; belam tevlivêjî de hemû pêrabûnên wêna nehatin biserkevtin.

Şerê vê rojê bi şikestina hêzên Dujminî ve bi carekê ve û bi dorlêgirtina tîpa pênc ve hate bidawîkin. Di bin perên tarîyê de mayînen wê dikarîbûn xwe ji bona Dîmartê bidin bivekişandin. Şureşvanan li Dîmartê jî de datin bidorlêgirtin.

Min ji jimarekê ji Beşdarvanên vî şerê hanê date bibihîstin, ku ziyanen Dujmin bêtir ji Pencsedî Kesî dihate biderkevtin û yeksê ji wan

ji Neferên tîpa pêncan dihatin biderkevtin, (Tîpa Pênc ji leşkerê duwem bû, baregehê wê li Kerkukê de bû).

Şûreşvanan bi serkevtinek nuh ve bi hempa serkevtina Meydana Morîkê ve dihaten biderkevtin. Wan topek sax û bi sedan ji tiving û rêjînkên û gelek kelûpelên sipahî dane bizeftkirin.

Ziyânên Şurşvanan: Mohemd Goc Mêrgesorî û Mustefa Hesên Baveyî hatin bigorîkin, yê ku ew ji baştirîn Peyan ve dihatin biderkevtin û yê ku bi saya wan ve cihê topxanê hate biwêrankirin û bigirtin. Wan bi buhayê jîna xwe ve serkevtin dane biderxistin. Amara jimara Birîndaran bi pêncan ve dihaten biderkevtin.

Rewş û zînetên tîpa pêncem bi gelekî ve di bin tirsê de dihaten biderkevtin, di her bêhnê de pêşbînîya berdestbûna wêna dihaten bidîtin; jiber ku ew li dûhevdu de li jêr agirbarandina Şureşvanan de dihaten bidîtin û nemana xorakê li nik de dihaten bidawîkirin. Balafiran didatin bihewildan, da ku ew kelûpelan bi sîwan ve ji bona wan bidin bidaxistin; belam ew bi vêjê ve nehatin biserkevtin; jiber ku pir kêr ji sîwanan di nava bazînê serbazxanê de dihatin bikevtin û piranîya wan ji bona nava destên Şureşvanan dihatin bikevtin. Di dawî de Femandarê tîpê ji bona Barzanî xeberek date binardin, ku ew jê sozekî bi saxbûna Neferên tîpa xwe ve dide bixwestin, heger ku ew xwe bidin biberdestîkirin. Belam bêbextîya Surçîyan nehişt, ku ev bête bikirin; jiber ku wan ji bona tîpê xwarin û vexwarin dane bigihandin û wê bi vî rengê hanê ve dikarîbû çend rojên din li ber xwe de bide bidan. Ji alîyekî din de Rêberîya Livandinan di wergirtina gavên bi lez ve ji bona rizgarîkirina tîpê û vekirina dorlêgirtina wê didatin biremankirin. Generalê Ingilîzî Rentin ji bona serpereştîya hêrîşa hatî ji bona cihê şer hate bigihandin.

Piştî girtina topeke sax di şerê roja 4. 9. 1945 de Barzanî ferman bi Ezet Ebdul-Ezîz ve date bidan, ku ew topê ligel xwe de bide bibirin û pê li parêzgeha sipahîyî Bilê de bide bilêxistin û wê bide binemankirin. Bi rastî jî ve Ezet ferman date bicîanîn û wî serpereştîya karê bombebarandinê date bikirin. Parêzgeha sipahî bi Serbaz û Polîsên xwe ve xwe date biberdestîkrin; piştî ku ew tûşî bombebarandîneke topî xurt bû.

Hêrîşeke nuh li jêr rêberîya Rentin de

Genaral Rentin vê carê pilanek ji bona hêrîşê date bidanîn û ew bi vî rengê hanê bû:

1. Tîpa panzdeh ji Akra ber bi gelfiyê Zinte - Dinarte ve bête bipêşkevtin.
2. Tîpa pênc ji Dînartê ber bi gelfiyê Zinte ve bête bipêşkevtin, da ku ew ligel tîpa pazdeh de bête bigihaştin.
3. Tîpa Yekem ji Serê Akra de ji bona dola Nehlê de bête bipêşkevtin, da ku ew li ser Şûreşvanan de bide bigivaştin.

Dibe, ku Xwendevanên hêja ji xwe re nedin bibawerîkirin, heger ku ez rûdanên şer bidim bitomarkirin, yê ku ew di 12. 9. 1945 de hate bivêkevtin, mîna ku Beşdarvanên wî ji min re ew dane biveguhertin.

Bi rastî ve ew rûdanên hanê destanek bû, ji destanên qehremanîyê û pehlewaniyê dihatin biderkevtin. Ne General Rentin, ne jî qeflên tîpan û ne jî hêza asmanî bi hemû giranbûnên xwe ve dikarîbûn tu biserkevtinê bi destên xwe ve bidin bixistin. Na hêjbêtir beza wan di vê carê de bi gelekî ve bi deha serttir û taltir ve ji hemû bezandinên berê de dihat biderkevtin.

Bi zor ve General Rentin dikarîbû pistê xwe bide birizgarîkirin û ter û hişk dihatin bitevlihevkirin. Serbazan dane bibazdan, bêyî ku ew hîç piçekî çavdêriyê bidin bikirin yan jî guhdariyê li fermanên Femandarên xwe de bidin bigirtin; jiber ku Femandarên wan bi bezê ve li pêşîya wan de hatibûn bikevtin.

Şûreşvanan hêrîşa hersê qeflan bi carekê ve dane bitarûmarkirin û gorepanên şer bi Kuştîyên Dujmin ve dane bidagirtin û herweh jî pêncî Nefer ji wan jî dane bidîlîkirin. Bi sedan ve tiving û kelûpelên sipahî hatibûn biavêtin. Jibervêjî ve Xelkên gundan hatin bibangkirin, da ku ew wan bidin bikomkirin û wan ji bona xêzên piştê bidin biveguhestin.

Ziyanên Şûreşvanan di çendbûna xwe de pir bi kêm ve dihatin biderkevtin; belam di malê xwe de bi gelekî ve bi mezin ve dihatin biderkevtin, jiber ku Ezîz Axayê Zerarî Rêberê mêrxas hate bigorîkirin û

herwehaji Şureşgêrên Ehmed Goran û Yasîn Isa Bîndrewî jî pêve hatin bigihaştin. Mohemed Emîn Mîrxan, Şerîf Leşkerî û Mohemed Isomerî hatin bibirîndarîkirin.

Bi gorîkirina Ezîz Axa û Hevalên wî ve kêreke bi gelekî kûrî rewayî ve li Barzanî de hate bikirin; jiber ku ew ji wan Kesên kêr û bi bê hempa ve dihatin biderkevtin. Cihê Ezîz Axa xweser Mele Şenê Bêdaronî jiber karî û tuwanên xwe date bidagirtin; ji yên ku ew di gorepanên şer de dihatin bidiyarkirin; tevî ku ew hêj di wê demê jî de di pêşîya temenê xwe de dihaten bidîtin. Kabokên hêzên Dujmin bi carekê ve hatin bişikenandin û ew nema dikarîbûn bi hîç pêşkevtinekê ve bêtin birabûn. Wan mîna reweştên xweyî hercar nijdên asmanî li ser malan û berên şer dane bitîrkirin. Hêza asmanîyî Ingilîzî bi pişka mezîni bombebaranî ve hate birabûn.

Diyara revê û xwevedizandinê di nava rêzên hêzên serdarîyê de hate bipirkirin, tanî ku Serbazan laşên xwe didane bibirîndarîkirin, da ku ew ji bona maristanên dûrî berê şer bêtin biveguhêstin.

Bêbextîya Serokên Eşîran

Şureş li her derê de bi niyazmendîya Merovan ve tete biderkevtin, ji yên ku ew li ber gotina şureşê de têtin bikevtin⁷⁸. Şureş ne bi firotineke bazirganî ve tete biderkevtin û ne jî ew bi qubalegirtina karekî ve tete biderkevtin; lêbelê ew bi xebateke sext ve tete biderkevtin, ne ku her Merovek dikare wê bide bihilgirtin. Li ser Şureşgêr de divê ku ew canê xwe ji bona milletê xwe bide bigorîkirin û herwehaji divê ku ew bi bînfirêhbûn û dirêjbûnê ve bêten bidîtin. Ev nişanên hanê hîç bi tu rengekî ve li nik Serokên Eşîran de, di nava mejîyên wan nişankirî de û remankirina wanîyî berjewendî tesk de nayêtin bipeydakirin.

Peyên konevanên impiryalîya Ingilîzî bi başî ve ev rastîya hanê jî xwe re didatin binaskirin. Tevîjî ku Şureşvanan ji xwe re bi serkevtinên pir mezin ve li ser hêzên serdarîyê de dabûn bicîanîn, yên ku wan ew bi

⁷⁸Ji bona têtîhiştina felsefa şureşê bi başî ve tete bidîtin, ku Xwendevanên geramî ji xwe re li nivîsta Lenin: Dewlet û Şureşê de yanî li nivîstên Hegel -Hêgil- de: Felsefa Mêjûwê de bidin bitemaşekirin. Cuma

xwînê û xwêdanê ve dabûn bicîanin û ew li ser wan de bi gorîyên pir mezin ve hatibûn birawestandin.

Serokên Eşîran beramber bi Berpirsiyarên serdarîyê ve hest bi nizmbûnê ve ji xwe re didatin bikirin û wan serên xwe li ber Polîsan de didatin bidaxistin, di gava ku wan xwe di beramberî hevdu de didatin bipufkirin.

Serdarîyê bi her rengî ve didate bikarin, da ku ew ji Serokên Eşîran lingên wan bi dilbijandinê ve ji bin wan bide bikişandin û wan ji bona hilgirtina çekan bi dijî şûreşê ve bide bipalpêdan. Carcaran wê ew didatin bitirsandin û carcaran jî wê soz ji wan re bidana daxwaza wanî mal ve didate bidan. Efserên Ingilîzî jî di van pêrabûnên hanê de dihatin bibeşdarîkirin.

Sorçî ji yê pêşî dihatin biderkevtin, ji yê ku wan guhên xwe ji bona dilbijandinê serdarîyê dane bibelkirin û wan çekê bêbextîyê ji xwe re dane bihilgirtin û ew ji bona hêzeke kurtêlxwer li jêre fermandarîya hêza Akra hatin biveguhertin. Pir pê neçû, tanî ku nexweşîya bêbextîya wan ji bona nava Eşîrên din jî hate bikevtin.

Derîyê Heştem

Penabûna Barzanî ji bona Kurdistana Iranê

Biryara xwe vekîşandinê ji bona Kurdistana Iranê

Mebesta Barzanî di bicîananîna armancên rewa de ji bona miletê Kurd û di xebatkirineke dijwar de ji bona bi yekkirina rêzên Kurdan ve dihate biderkevtin; belam gava ku wî date bidîtin, ku şer ji bona di nava kurdan de bi xwe ve hate biveguhestin û wî date bidîtin, ku Serokên Eşîran bi pêş yekaneyên sipahî ve ji bona şerkirina Şureşvanan têtin bikevtin, yên ku tanî donê ligel Şureşvanan dihatin birawestandin û yanî yên dinî ku wan ji xwe re dihatin bitemaşekirin û wan soz û peyman dane bijîbîrakirin. Pir bi dujwarî ve li ser çûna şer de di bin van nîrên wisa de dihate biderkevtin; jibervêjî ve Barzanî şêwirdarîyên bi lez ve ligel Encumena Azadîyê date bikirin û piştî wergirtina bîr û bawerîyê û pêrûniştina Şêx Ehmed Barzanî ji bona xwe vekîşandina ji bona Kurdistana Iranê date bibiryarîkirin, berî ku barandina baran û berfê û girtina rê bête bigirtin û nemaze jiber ku rêzên çiyayên sînoriyî bilind Merov nikare piştî daketina berfê tere bête biderbaskirin û herwehajî berî ku herema Barzan ji bal Dujmin û serûştîyê jî de dora wê bête bigirtin.

Barzanî ferman ji bona Femandarên berên şer pêwistîya agehdarîkirina hêzan bi xwe vekîşandinê ve ji bona sînorên Iranê bi regekî rêkûpêk ve û piştî valakirina heremê ji malan date biderkirin.

li gora bîr û bawerîya min jî de, Şêwirdarî jî ligel -J. K.- û Sovyêtan jî de hate bikirin û bîr û bawerîya herdu alîyan jî ji bona pêwistîya xwe vekîşandinê ji bona Kurdistana Iranê dihate biderkevtin, da ku li ser vê hêza ceribandî bête biparastîn, ji bona ku ew piştî şureşa neştîmanîyî siyasî li Kurdistana Iranê de bide bigirtin.

Di dawîya kewçîrînkê de Şûreşvanan bi vekişandina xwe ve li gora pilanekî wîrd de datin bidestpêkirin û ew bi vî rengê hanê ve hate bicîhatin:

1. Hêzeke têrkirîyî baş dê ji bona Kanîreş li ser sînorên Iranê de ji bona parastina rêya dola Xuwakork û nehiştina birîna wê ji bal Kurtêlxwrên Biradostîya de bête bilivandin. Hêza berê Rewanduz dê bi xêzeke liberxwedanîyî xurt ve ji Qelender tanî çiyayê Pîran di nava destên xwe de bide bihiştin û dê ew rê li ber pêşkevtina hêzên dujminî de bide bigirtin.
2. Divê hêzeke din ji bona dola Biyaw ji bona parastina Paşenga malan û nehiştina hêzên Kurtêlxwerên Sorçiyên bi dûkevtina wan ve bête binardin.
3. Divê hêza berê Balenda ji bona çiyayê Şêrîn û Welatêjêrî bête bikişandin, da ku ew paşenga malên wan gundan ji Kurtêlxwerên Rêkanîyan bide biparastin.
4. Divê rêya Pêris - Bilê bête biparastin û nehêlin, ku ew ji bal Kurtêlxwreên Zêbarîya de bête bibirîn.

Wetov kirina xwe vekişandinê hate bidestpêkirin û mal li herema kanîreş de hatin biserhevdekirin, da ku ew xwe ji bona kevtina nava Iranê bidin bimadekirin.

Şerên vêkevtî di dema xwe vekişandinê de

1. Berê Akra:

Sorçiyên bêbextîyeke mêjûyî berî Eşîrên dîn dane bikirin, heger ku ne bêbextîya wan ba, dê tîpa pêncan ji bona nimûne bihata berdestkirin û dê rûyê cengê bi carekê ve bihata biveguhertin. Wan di 14. 9. 1945 de hêza sipahiyî Akra di rêya çiyayê Serê Sade de datin bianîn û wan ew li Dînartê de li rexê rojava de datin bidaxistin. Wetov wan pê tîpa pênc ji dorlêgirtinê datin birizgarîkirin.

Bêbextîya Sorçiyîyan zînet ji bona berjewendîya Dujmin date biveguhertin û herwehaji helwesta wan li ser Eşîrên din jî de date bikêrkin. Weha Serokên Zêbarîyan jî bi serdarîyê ve hatin bigihaştin û werjî Biradostîyan, Şerefanîyan û beşekî ji Mizurîyan, Dosikîyan û Birîvkanîyan jî ev bi xwe jî ve dane bikin.

Barzanî xwe ji bona Pêris date bivekişandin. Şerekî giran hate bivêkevtin, gava ku sipah bi piştgirtina Kurtêlxeran ve bi vegirtina çiyayê Pêris ve date bihewiladan û ew têde hate bişikenandin. Ji Şureşvanan Mohemed Ebdu-Lah Gewre Şanderî û Elî bazî Berijî hatin bigorîkin û Tîmzarîb Sêlkî, Salih Kanya Lencî, Şîno Mohemed Jajokî û Mele Şewalî Korekey hatin bibirîndarkirin.

Di 30. 9. 1945 de Barzanî dev ji çiyayê Pêris ji bona Bîra Kepra date biberdan û ew di rê de ji bal Kurtêlxwerên Sorçiyîyan û Zêbarîyan de tûşî herîşeke tûnd ji du rexan de hate bikin. Di şerekî gûr de Kurtêlxwer têde hatin bibezandin û ji Şureşvavan Xalid Zubêr Barzanî û Mele Şêxo Şanederî hatin bigorîkin. Barzanî ligel hêzên xwe de di 2. 10. 1945 de ji bona gundê Barzan hate bigihaştin. Malên herema Nizar û Berojê di çiyayê Şêrîn re ber bi Kanîreş ve ji bona cihê bi serhevdanê ve hatibûn bibuhurandin.

2. Berê Rewanduzê

Di 26. 9. 1945 de Dujmin hêrîşeke fireh ji bona ser çiyayên Biradost û Qelender bi alîkarîya Kurtêlxwerên Biradostîyan dane bibirin, yên ku ew li pêşîya sipah de ji bona ser çiyayê Qelender de dihatin bipêşveketin û ji nişkê ve wan bi hev re hêrîşî Şureşvanan dane bikin. Piştî şerîkî germ û giran Sipah pir pîs hate bibezandin û di heman kat jî de Şureşvanan hêrîşeke tûj ji bona ser çiyayê Qelender dane bibirin û wan ew ji Biradostîyan dane bivegerandin û wan ji bona wan fêrbunê kûr dane bikin. Wan bi dehan ve kelex li dû xwe de li ser serê çiyayê Qelender de dane bihiştin û ew tanî serbazxana Diyana hatin birevîn. Şureşvanan du Gorîvan dane biziyandan û ew jî yek ji wan Hesên Mohemed Emîn Pîrsiyavî bû, yekek ji bi karîntirîn û mêrxastirîn Rêber bû û yê din Meran Şêxo Şêxane bû û herweha Hecî Bêroxî, Ehmed Mustefa Kaniye Lencî û Hesên Şeyna hatin bibirîndarkirin.

3. Dola Biyaw

Desteyekî ji Kurtêlxwerên Sorçiyên dane bihewildan, da ku ew malên Xelkên gundan berî xwe vekîşandina wan bidin bitalanîkirin; belam hêza ku ji bona wêderê hatibû binardin, ligel wan de ew hate biberengarîkirin. Şerek hate bivêkevtin û têde Serokê Kurtêlxweran Şoro Mustefa hate bikuştin û ji Şureşvanan jî Sulêman Feqê Dêrîşkî Berpirsiyarê hêzê, Areb Qetran û Mohemed Sêlkî hatin bigorîkirin.

Di berê Balinda de tu şer nehatin bivêkevtin; jiber ku Dujmin berî xwe vekîşandina hêzê neda bixwestin, ku ew di çemê Zab re bête bibuhurandin.

Mal di rêya xwe de ji bona Kanîreş Balafirên hêza asmanî agir bi ser wan ve didate birijandin, da ku ew kîna Serdarên Begdadê û Serwerên wanî Ingilîzan bidin bitemirandin. Jimarek ji Pîrekên aviskîrî û zarokan di rê de ji ber bombebarandinê hatin bikuştin yan jî hinek ji wan ji ber sermê û birçîbûnê hatin bimirin.

Mal ji bona nava Kurdistanê Iranê hatin bikevtin û serdarîyê bi dawîanîna pêrabûnê sipahî ve date bidazanîn. Fermandarê Livandinan ji bona Serokên Eşîran date bibangkirîn û ew datin bibivêkirin, ku ew çekên xwe di nava 48 demjimaran de divên bidin biberdestkirin û wî bingehên ligerandinê li se rêçên çûna Kurtêlxweran de date bidanîn, ku ew her yekekî ji wan bidin bigirtin, heger ku li nik yekî jî de yek gulejî bête bidîtin. Wî ew ji wê bêhna bi dawîhatina livandinan ve datin biderkirin. Serdarîyê ew bi hêza Nerêxistî ve didatin binavkirin.

Weha bi vî rengê hanê ve, yên ku wan bêbextî li milletê xwe de dane bikirin, wan xelatên xwe ji Fermandarê Livandinan tevî şelafîya wan û şewitandina wanî gundan di herema Barzanîyê vala de dane bigirtin. Wan ev karên hanê tevde didatin bikirin, da ku ew dilsozîya xwe ji bona serdarîyê bidin bicihkirin.

Gihandina Kurdistana Iranê

Şûreş di 11. 10. 1945 de bi kevtina Barzanîyan ji bona Kurdistana Iranê di rêya Kêle Şîn - Mergever (Dalmêr)⁷⁹ de hate bidawîkirin. Balafirên Iraqî bi dû malan ve tanî deqa dawîyî ji sînor hatin bikevtin.

kirina xwe vekişandinê bi rêkûpêkî ve hate bikirin; jiber ku hîç malek jî nehate bipîşmayîn û ne jî ew bi destên Dujmin ve hate bikevtin. Şêx Ehmed Barzanî bi rê ve ligel Malan de dihate biçuyîn û wî jî ligel wan de azar û westandina wan didate bibeşdarîkirin û wî bi xwe ve sermiyandariya wan didate bikirin.

Şurêşvan xweser li paş malan de ji bona nava Kurdistana Iranê hatin bikevtin. Ew û malên wan ji bal birayên wan de li Kurdistana Iranê de bi xêrhatineke pir germ ve li wan de hate bikirin, yê ku ew ji her rexekî ji bona alîkariya wan hatin birabûn û wan ew li ser 49 gundên xwe de dane bibelavkirin û wan ew ligel xwe de di malê de û bi xwarin û vexwarinê ve dane bibehrkirin.

Barzanî ji bona gundê Nêrgê hate biçuyîn, jiber ku li wêderê de Fermendarê sipahêSovyêti di heremê de dihate birûniştin. Ew ligel wî de li ser parvekirina malan de di gundên heremên - Mergever, Tergever, Şîno, Nexede û Mehabadê- de hate bilihevkin. Herwehaji wî jê nardina Encumeneke Pijişkan jî ji bona ser Nexweşan date bixwestin. Bi rastî jî ve Encumeneke Pijişkî ji bona saxkirina Nexweş û Birîndaran hate binardin û maristaneke meydanî li gundê Kanîsipî hate bivekirin û wê dest bi saxkirina Birîndaran û Nexweşan ve date bikirin û di nava Birîndaran jî de Mohemed Sedîq jî dihate bidîtin.

Mal ji bona ser heremên bi navkirî ve hatin bibelavkirin û Şêx Ehmed li Mehabad de hate birûniştin. Beraznî, birayê wî Babo û Birazayê wî Ibrahîm li Şîno de hatin birûniştin. Şêx Sulêman ligel mala Mohemed Sidiq de li Nexede de hatin birûniştin. Mohemed Xalid li gundê Kokê de û Es-ed Xweşevî li herema Tergever de hatin birûniştin.

Piştî ku zînetê bi cîkirina malan ve hate bidanîn, hêz di nava hengan de hatin birêkûpêkxistin û li ser wan de çekên nuh di buhara sala

⁷⁹Çiyayekî zor bilnde û li ser serê wî de sînorên hersê dewletên Iran, Turkî û Iraqê bi hev ve têtin bigihaştin.

177 Barzanî û Tevgera Azadîxwazîya Kurd 1931 - 1958

1946 de hatin biparvekirin û li ser wan de Femandarên hengan ji Efserên xebatvan hatin binîşankirin, yê ku ew ligel Barzanî de ji Iraqê hatibûn birêkevtin û ew jî ev bûn: - Ezet Ebdul-Ezîz, Seyid Ezîz Seyid Ebdul-Lah, Mustefa Xoşnaw, Mîrhac Ehmed, Mohemed Mehmud Qudsî, Ebdul- Rehman Mufî û Destyar Şowket Endî -

Li Iranê de ev bi wan ve hatin bigihandin: - Bekir Ebdul-Kerim, Xeyrul-Lah Ebdul-Kerîm, Nurî Ehmed Taha, Mohemed Salih û Destyar Ehmed Efendî Koyî -

Ji Eşîran bi wan ve Wehab Mohemed Axa Cindiyan û Sulêman Beg Dergele ligel Merovên xwe de⁸⁰ hatin bigihandin.

Mîna ku hate bidiyarkirin, Barzanî bi mîna hêza serokî ve ji bona li berxwedana komara Mehabadê de hatin biderkevtin û wan ji bona li berxwedana wêna de gorîyên pir giranbuha datin bipêşkeşkirin.

⁸⁰Sulêman Beg Dergele li Mehabadê de bi Barzanî ve hate bigihaştin û ew ligel wî de jî ji bona Yekitiya Sovyêtê hate biçûyîn. Ew jêre bi dilsoz ve tanî mirina wî di gulana sala 1974 de hate bimayîn.

Kanîyên Lêgerandinê

1. Bihîstinên min ji Barzanî û ji Havalên hemdemên wî
2. Belgeyên Barzanîyî parastî li nik min de û rûnkinên wîyî tomarkirî
3. Sîpabod -Zeim El-rikin- Hesên Mustef: Li ser Barzanîyan; Dar-Eltelîe, Bêrud sala 1963, -bi zimanê Erebî ve-
4. Ela El-Dîn-El-Sucadî: Şûreşekanî Kurd, Begdad 1959
5. Elî Ebdul-Lah: Mêjûwa Partîya Demokratî Kurdistanî - Li Iraqê de ji kongirê damezirandinê tanî girtina kongirê sêyem, çapa Xebat 1984. - Bi zimanê Erebî.
6. Mehmud El-Dure: Pîrsa Kurd, çapa duwem, Bêrud 1966, -bi zimanê Erebî ve-
7. Maruf Çiyawîk: Merûf Çiyawîk: Destana Barzana Sitembar, Begdad 1954, -bi zimanê Erebî ve-
8. Ismail Erdelan: Veşartîyên Barzan, wergerandina Marûf Qeredaxî, Begdad 1958, -bi zimanê Erebî ve-
9. Wilyam Igelton: (Komara Mehabadê - 1946), sala 1963, -bi zimanê Erebî ve- Wergerandina Cîrcîs Fethul-Lah, dar Eltelîe, Bêrud 1972.
10. Dana Êdmoz Şimit: Rihleton îla rical El-Şucan - Seyranek ji bona nik Merovên Mêrxas- Wergerandina Cîrcîs Fetuhul-Lah, dar Eltelîe, Bêrud 1972.
11. Ebdul-Rezak El-Huseynî: Tarîx El-wîzarat El-Iraqîye - Mêjûwa Wîzaretên Iraqî-

179 Barzanî û Tevgera Azadîxwazîya Kurd 1931 - 1958

12. S. G. Edmonds: Kurd, Turk û Ereb, wergerandina Erebî ji bal Cercîs Fethul-Lah, çapa Tayms, Begdad, di 1971 de, -bi zimanê Erebî ve-
13. Basil Nîkîtîn: Kurd, Dar-Elrewaî, Bêrud, sala 1967, -bi zimanê Erebî ve-
14. Hesên Erfê: Kurdeha û yek pûrsî tarîxî û siyasî, çapa Farisî, sala 1966
15. Necefqelî Bisyan: Ez Mehabad xonîn ta gernehayi ares - Ji Mehabada xwînavî tanî vegerandina Aras- çapa Farisî, Tehran Azermeh 1328.

Ev karê hanê li Berlinê de di 1. gelavêja sala 1998 de hatîye bidawîkirin.

Barzanî û
Tevgera Azadîxwazîya Kurd
Şûreşa Barzan
1945 - 1958

Kurdistan, di befirbara Sala 1987 de

Werger Dr. M. S. Cuma
Berlin, di 4. 8. 1998 de

Navrok

Pêşgotin..... 186

Derîyê Yekem

Barzanî li Kuristana Iranê de..... 188
 Dazanîna Komarê 189
 Belavkirina çekên nuh 190
 Hêzên Eşîran..... 191

Derîyê Duwem

Şerê yekem 193
 Şerê Qarawa..... 193
 Şerê Duwem 195
 Şerê Melqerenî yanî Mameşah..... 195
 Nexweşî serên Barzanîyan dide bixwarin 198

Derîyê Sêyem

Damezrandina Partîya Demokratî Kurdistan 200
 Kongirê Yekem 202

Derîyê Çarem

Cudabûn di navbera Tebrîzê û Mehabadê de..... 205
 Serdana Qazî Mohamed ji bona Tehranê..... 207

Derîyê pêncem	
Nêzîkbûna Dawîbûnê.....	209
Herifandina Ezerbêcanê	210
Vekişandina Barzanîyan ji bona Mehabadê	212
Dîtina dawî di navbera herdu Serokan de.....	213
Derîyê Şeşem	
Qonaxa Dijwar	216
Vegera Barzanî ji Tehranê	219
Derîyê Heftem	
Hewildana razîkirina Eşîran bi ne	
berengarîkirina Barzanîyan ve	221
Dîtinek Nuh.....	221
Rûdana Sêlwê.....	222
Dîtina li ser rêya Somayî de.....	223
Derîyê Heştem	
Destpêkirina Şeran	224
Şerê Nelos	225
Şerê Goçar	226
Hêrişeke Iranîyî nuh ji bona ser berê Şino.....	228
Herdu Şerên dawî.....	229
Gorîkirina Qazî Mohamed	231
Derîyê Nehem	
Vegerandin ji bona Iraqê.....	232
Derîyê Dehem	
Rêya Mêjûyî.....	235
Barzanî Hêzên xwe dide birêxistin	236
Giftûgokirin ligel Serdarîyê de	236
Serdarî Hêzên xwe dide bidagirtin	238

 Derîyê Yanzdehemîn

Biryara Dawî û Mêjûyî.....	239
Rûdanên birêveçûnê	239
Qonaxa Giring	247
Derbasbûna di ser çemê Arasê de	249

Derîyê Duwanzdeh

Li Yekîtiya Sovyê de	251
Veguhestina ji bona Ezerbêcanê	252
Dîtina Barzanî û Bagerof.....	252
Hemû Barzanî li Bako de	253
Gava Siyasî: Pêkanîna Rêberîyeke Siyasî.....	254

Derîyê Sêzdeh

Veguhestina ji bona Komara Ozbêkistan - Derdekî nuh-	258
Bi Rêveçûna bi Derd ve.....	259

Derîyê Çardeh

Manggirtin û tûrebûnan	261
Mosko destdirêjî date bikirin.....	263

Derîyê Panzdeh

Dana bi serhevdû ve	265
---------------------------	-----

Derîyê Şanzdeh

Çûna Barzanî ji bona Mosko	267
----------------------------------	-----

Deryî heftdehan

Zînetên Barzanîyan li Iraqê de	271
--------------------------------------	-----

Deryîyê Heştdeh

185 Barzanî û Tevgera Azadîxwazîya Kurd 1931 - 1958

Barzanî serdana Taşqend dide bikirin.....	274
Barzanî serdana Komara Erministanê dide bikirin.....	275
Barzanî û Şerê sê qolî li ser Misrê de.....	275
Dema di navbera 1956 - 1958 de	276
Demeke bi bidiyartir ve.....	278
Kanîyên Lêgerandinê	279

Pêşgotin

Min di herdu bergên çûyî de ji nivîsta Barzanî û Tevgera Azadîxwazîya Kurd rola Barzanî û Barzanîyan di serhildana Barzanî pêşî de der sala 1931 - 1932 de û şûreşa Barzan der sala 1943 - 1945 de date biraxistin, ya ku wê ji bona dûrbûna milî ji bona wan roleke rêberî date bidan û di nava wê de jimareke mezin ji Efsêr û Welatperwerên Kurd ji Zanevanan û Eşîran hatin bibeşdarîkirin.

Bi serkevtinên Barzanî ve li ser hêzên serdarîya Iraqîyî piştgirtî de ji bal impiryaliya Ingilistanê de di şerên 1943 de cihê Barzanî li sernaserî Kurdistanê de date bixurtkirin û hozanîya wî nala Serokekî jîr hate biderkevtin û netewê Kurd hêvîyên pir mezin li ser de datin bigirêdan. Li ber wî de berên fireh ji bona dan û sitendinê ligel Rêberên Tevgera azadîxazîya Kurd de li hemû perçên Kurdistanê de û bi taybetî ve ligel Serokên tevgerê de li Kurdistana Iranê de, ya ku ew di zîneta kelandinê û pêşkevtinê de dihate bidîtin, piştî ku sipahên Sovyêtî û yên Hevalbendên din ji bona nava Iranê hatin bikevftin, hatin bivekirin.

Bi rêk û pêkkirineke bi carekê ve di navbera Barzanî û Encumena Azadîyê de ji alîyekî de, ya ku wê Şureşa 1945 didate biajotin, ji alîyekî din jî de di navbera wî û Komela J. K. li Kurdistana Iranê de dihate biderkevtin.

Bi taybetî ve nameya ku Komela J. K. - Komela Jiyani Kurd- ji bona Barzanî date binardin û ya ku ew têde ji bona wî bi navê Serokê rizgarkirina Kurdistanê ve dide binavgkirin. Di navroka namê de 9 xal li ser bingehên hevkarîyê û çawabûna pêşkeşkirina piştgirtinê ji bona şureşê dihatin bidîtin. Herwehaji wê bi eşkere ve li ser hêvîyên bi wî girêdayî ve didate bidubarekirin.

Ne Barzanî û neji Barzanîyan hêvîyên birayên xwe dane bi-şikenandin, gava ku berpirsiyarîyên wan hatin bimezintirkin, piştî ku ew ji bona Kurdistana Iranê der sala 1945 de hatin bigihandin. Barzanî

187 Barzanî û Tevgera Azadîxwazîya Kurd 1931 - 1958

bi zendên xurtî Komarê ve hatin bikirin û wan gorîyên pir giranî mezin ji bona li berxwedana wêna de datin bipêşkeşkirin. Wetov rola wîna bi guhpêdana milî û cîhanî ve didate bikêrkin û wê dûrbûneke milîyî giştî ji xwe re date biwergirtin.

Ev bergê hanê ronahîyekê li ser pêleke hatsyarîyî tije de bi rûdan û pêşkevtinan ve dide biavêtin, ya ku têde Barzanî di nava Kurdistana Iranê de dihate bidîtin û herwehaji pêrejî beşdarbûna wîna yê gewre ji bona xurtkirina hîmên Komarê ji sala 1945 de tanî sala 1947 de tête biderkevtin û di pişt re jî penabûna wîna ji bona Yekîtiya Sovyêtê û pêwendîyên wîna ligel Rêberên Sovyêtê de û mana wîna li wir de tanî şûreşa tîrmeha sala 1958 de tête bidîtin, yê ku wan berên firehî mezin li ber tevgera azadîxwazîya Kurd de datin bivekirin.

Mesud Barzanî

Derîyê Yekem

Barzanî li Kuristana Iranê de

Li ser bingehên pêwendîyên ligel Serokên tevgera Kurd li Kurdistana Iranê û ligel Berpirsiyarên Sovyête de Barzanî ligel Hevalên xwe de di Encumena Azadîyê de piştî wergirtina pêrûniştina Şêx Ehmed Barzanî dane bibiryarîkirin, ku ew berê xwe ber bi Kurdistana Iranê ve jiber başbûna zînetên nuhî vekirî beramberî tevgera azadîxwazî Kurd li wêderê de bidin bivedan, da ku ew vê hêza ceribandî bidin biparastin, ya ku ew dê ji bona hîmkirina zînetên nuh li Kurdistana Iranê de bide bialîkarîkirin.

Li gora ku min ji Barzanî dayîte bibihîstin, ku dan û sitendin xweser ligel Berpirsiyarên Sovyête de dihatin bikirin û jimark ji pêbawermendên wî ji bona vê mebesta hanê ji bona Iranê hatin biçûyîn, herwehaji hin ji Efserên Sovyête ji serdana Barzanî dane bikirin. Di girawkirina van pêwendîyên hanê de roleke jêhatîyî Mîrza Ebdul-Lah Efendî Kêlanî û Şêx Ebdul-Lah Zîno dihat bidîtin.

Şûreşa Barzan ji 1943 - 1945 de bi kevtina Barzanîyan ve ji bona Kurdistana Iranê di 11. 10. 1945 de di rêya Kêleşîn - Mergever (Dalamêr) de di deqa sêgoşîyî sînorî de di navbera Turkî, Iraq û Iranê de hate bidawîkirin. Balafirên Iraqî û Ingilizî ji bi dûkevtina malên Barzanîyan ve tanî deqa dawîyî ji sinor hatin birawestandin.

Di gava derbasbûna Barzanîyan ji bona Kurdistana Iranê ew ji bal birayên xwe de pir bi germî ve hatin bipêşewazîkirin û wan ji bona wan her alîkarîyeke bi karînî ve dane bipêşkeşkirin. Herweha Gorîvan Qazî Mohemd fermanek ji bona rêxistinên Hizbê date biderkirin, ku divê ew ji bona Barzanîyan her alîkarîyekê bidin bipêşkeşkirin. Ji xwe re li Belgeyê jimare 1 de bidin bitemaşekirin.

Piştî ku zînet hate biaramîkirin, Sovyêt ji Barzanî date bixwestin, ku ew xwe ji ber çavan demekê bide biwindakirin; jiber ku tûrebûnên li dû hevdû de û givaştinên xurt ji bal serdarîya Ingilistanê û Iraqê de ji bona Sovyêtê dihatin bikirin. Barzanê ligel jimarekê ji Çekdaran de berê xwe ber bi herema Serdeştê ve date bivekirin û ew li gundê Mîrawa hate bidakevtin û ew têde tanî dawîya 1945 de hate bimayîn. Di pişt re ew ji bona bajarokê Şîno hate biveguhastin û ew têde ligel mala xwe, mala birayê xwe û hinekan ji Merovên xwe de hate birûniştin, Belam mala Şêx Ehmed ji bona bajarê Mehabadê hate biveguhastin.

Dazanîna Komarê

Di 22. 1. 1946 de damezrandina yekemîn Komara Kurdistanê li Mehabadê de hate bidazanîn û Barzanî jî ji bona amadebûna ahenga li darxistî de ji bona vê hatina mêjûyî hate bibangkirin. Piştî bi dawîhatina ahengê ve ew ji bona Şîno hate bivegerandin û ew têde tanî avdarê hate bimayîn. Di pişt re ew ji bona Mehabadê hate bibangkirin û pêre hate bilihevkirin, ku Barzanî bi rola xwe ve ji bona piştgirtin û hîmkirina Komarê bêtin birabûn.

Bezanîyan bi saya mîrxasîya xwe ve û bi rêkûpêkbûna xwe ve karînen bilind didatin biderxistin û ew bi cihê bawermendîyê ve ji bal Rêberên Komarê û Cemawran de bi giştî ve dihatin biderkevtin û ew bi hêza bi pêbawerî ve dihatin biderkevtin.

Bi rastî jî ve hêzên Barzanîyan hemû giranbûnên şer û berengarîyên sipahî beramberî pêrabûnên sipahîyî serdarîya Tehranê ji bona dorlêgirtina şûreşê û nemankirina Komarê dane bihilgirtin. Emê dê li ser vê de bi dirêjî ve bidin biaxivtin.

Jimarek ji Efserên sipahîyê Iraqîyî Kurd, ji yên ku ew tev li şûreşê de hatin bikevtin û ew ligel Barzanî de ji bona Iranê hatin bigihandin, ev bûn: Izet Abdul-Ezîz, Seyid Ezîz Seyid Abdul-Lah, Mustefa Xoşnaw, Mîrhac Ehmed, Mohemed Mehmud Qudsî, Abdul-Rehman Muftî û Destyar Şewket Efendî.

Li Iranê de piştî gihandina wan bi demeke kurt ve Bekir Abdul-Kerim, Xeyrul-Lah Abdul-Kerim, Nurî Taha Ehmed, Mohemed Salih û Destyar Ehmed Efendî Koyî bi wan ve hatin bigihaştin.

Ji Eşîran Wehab Mohemed Axa Cindîyan û Sulêman Beg Dergele ligel Xizmên xwe de bi wan ve hatin bigihaştin.

Belavkirina çekên nuh

Careke din Barzanî bi hatina newroza 1946 ve ji bona serdana Mehabadê hate bibangkirin û li wêderê de peyv li ser çekdarîkirina Barzanîyan de bi çekên nuh ve hate bikirin. Li ser de hate bilihevkirin, ku hemû Peyên ji panzdeh salî tanî şêst salî de ji bona hatina Mehabadê hatin bibangkirin û ew li ser mizgeftên bajêr de hatin biparvekirin.

Dî pêşîya cotanê de çekên nuh - Tivingên Birno, Rêjînk û Narîncok- li ser 1500 Barzanîyan de hatin bibelavkirin, yê ku ew di sê hengan de hatin birêxistin û ji bona wan bernamêyên fêrkirinên sipahî li gora leşkerên nuh de hatin bidanîn. Herwehaji nêzîka 700 Çekdarên Barzanîyên din mîna mînge hatin bimayîn. Ji bona hersê hengan Fermandar, mîna ku tên, hatin binîşankirin:

1. Serdar Bekir Ebdul-Kerîm ji bona henga yekem hate bidanîn. Mohemed Emîn Mîrxan, Mamend Mesih û Faris kanî Botî bi Serliqan ve hatin binîşankirin.
2. Servan Mustefea Xoşnaw ji bona henga duwem hate bidanîn. Seid Welî Beg, Xelîl Xweşevî û Misto Cangîr bi Serliqan ve hatin binîşankirin.
3. Servan Mîrhac Ehmed ji bona henga sêyem hate bidanîn. Salih Kanya Lincî, Heyder Arif Beg û Wehab Axa Rewanduzî bi Serliqan ve hatin binîşankirin.

Piştî ku ji bi rêxistina hengan ve û bi dawîhatîna fêrkirinên sipahî ve Barzanî ligel jimarekê ji Berpirsiyarên Komarê ve ji bona ahengekê hatin biamadekirin, ya ku ew ji bona wê hatîne hatibû bilidarxistin û wî tede ji bona Efseran û Payedaran gotinek date bikirin û wî ew li ser wê endazîya wanî pêgihandîyî baş de datin bipîrozîkirin û wî ji wan bi pêwistîya pêgirtina rêk û pêkbûnê û bi sertewandinê ve beramberî fermanan date bixwestin. Herwehaji wî date bigotin, yê ku ew serên xwe li ber fermanên hersê Femandaran de bidin bihildan, mîna ku ew serên xwe li ber fermanên min de bi xwe ve didin bihildan. Di pişt re hersê heng ji bona berê Seqiz hatin bilivandin, da ku ew di wê herema ber tirsê de ji her heremeke din de bêtin bigirêdan; jiber ku ew herema

hanê bi deqa tengalkirina xweser ve ligel hêzên Iranî de dihate biderkevtin. Efserên din

mayî mîna Cengoşê ligel Barzanî de hatin bimayîn û Biryareke Serokitîyê ji bona bilindkirina Efseran bi payebûnên bilindtir ve hate biderkevtin. Wetov Serdar Izet Abdul-Ezîz ji bona payebûna Sertîp hate bilindkirin, Serdar Bekir Abdul-Kerîm ji bona payebûna Sertîp hate bibilindkirin, Servan Mustefa Xoşnaw, Servan Mîrhac Ehmed û Servan Seyid Ezîz seyid Abdul-Lah bi payebûna Sertîp ve hatin bibilindkirin, yanî dibe, ku ew bi payebûna Serheng ve hatibin bilindkirin. Sitvan Xeyrul-Lah Abdul-Kerîm û Sitvan Mohemed Qudsî bi payebûna Serdar ve hatin bilindkirin. Sitvan Nurî Ehmed, Sitvan Celal Emîn û Sitvan Mohemed Salih bi payebûna Serdar ve hatin bibilindkirin. Herwehajî payebûnên rûmetê hin ji Rêberên Barzanîyan pê hatin bixelatkirin û ji van jî ev bûn: Es-ed Xweşevî û Mohemed Axa Mêrgesorî bi payebûna Sertîp ve hatin bixelatkirin. Herwehajî ji bona fermandarên hengan payebûna Sitvan hate bidan. Herwehajî ji bona Seyid Ehmed Seyid Tahayê Nehrî bi payebûna Serdar ve hate bixelatkirin.

Hêzên Eşîran

Bi payînbûna meha gulanê ve piranîya Eşîrên Kurd li kurdistana iranê de li jêr ala Komarê de hatibûn bikevtin, piştî ku jimareke mezin ji wan di pêşîya pêşî de û nemaze di heremên jorî de bi dudilî ve dihatin biderkevtin. Barzanî bi roleke mezin ve ji bona xistina wan di nava hêzên Komarê de hate birabûn. Ev Eşîrên hanê jî ev bûn:

1. Celalî û Mîlanî bi 400 Siwarên xwe ve.
2. Şîkak di bin Rêberîya Umer Xan de bi 800 Siwarên xwe ve.
3. Şîkak di bin Rêberîya Tahir xan Simko de bi 500 Siwarên xwe ve.
4. Herkî di bin Rêberîya Reşîd Beg de bi 500 Peyên xwe ve.
5. Begzade di bin rêberîya Nurî Beg de bi 500 Peyên xwe ve.
6. Herkî di bin Rêberîya Zêro de bi 700 Peyên xwe ve.

7. Mala Seyidên Nehrî di bin Rêberîya Seyid Fehmî de bi 200 Peyên xwe ve.
8. Zerza di bin Rêberîya Musa Xan de bi 300 Peyên xwe ve.
9. Qerebaxî (Turkuman) di bin Rêberîya Paşa Xan û Xisro xan de bi 500 Peyên xwe ve.
10. Mameş -Qadirî- di bin Rêberîya Kak Ebdul-Lah de bi 400 Peyên xwe ve.
11. Mameş di bin Rêberîya Kak Hemze Nelosî de bi 500 Peyên xwe ve.
12. Pîran di bin Rêberîya Mohemed Emîn Axa û Qerenî Axa de bi 300 Peyên xwe ve.
13. Mengur di bin Rêberîya Ebdul-Lah Bayazîdî de bi 300 Peyên xwe ve.
14. Mengur di bin Rêberîya Salim Axa de bi 300 Peyên xwe ve.
15. Mengur di bin Rêberîya Elî Xan û Ibrahim Salarî de bi 400 Peyên xwe ve.
16. Serdeşt di bin Rêberîya Kake Ela de bi 200 Peyên xwe ve.
17. Mehabad Gewrek di bin Rêberîya Bayezîd Ezîz Axa de bi 300 Peyên xwe ve.
18. Seqiz Gewrek di bin Rêberîya Elî Cuwanmerdî de bi 400 Peyên xwe ve.
19. Êlên cudan ji Serdeştê bi 500 Peyên xwe ve.
20. Êla Susenî bi 100 Peyên xwe ve.
21. Mehabad û Dîbogerî di bin Rêberîya Cafer Kerîmî de bi 400 Peyên xwe ve.
22. Bukan Dîbogerî di bin Rêberîya Axayên Îlxanîyî Zade de bi 500 Peyên xwe ve.
23. Feydul-Lah Begî ji Serqiz û Bukan bi 800 Peyên xwe ve.
24. Mala Bedaî ji Seqiz bi 200 Peyên xwe ve.
25. Êlên Cudan ji Mehabad Şahîndiz bi 300 Peyên xwe ve.
26. Peyên Heme Reşîd Xan bi 300 Peyên xwe ve.

Tevaya van hêzên Eşîran bi 8800 Peyan ve û bi 1700 Siwar ve têtin biderkevtin.

Derîyê Duwem

Şerê yekem

Şerê Qarawa

Hêzên sipahîyê Iranî ji parêzgeha sipahîyê Seqiz de bi texmîna du hengan de di berbeyanîya roja 29. 4. 1946 de hate bipêşkevtin, ya ku ew ji berê henga yekem dihate biderkevtin û Wan ew datin bigirtin û ligel xwe de topxane dane bibirin û wan ber bi bilindayên Qaraw ve li ser serê wê de çend rêjînk dane bihîmkirin û wan bi agirên xwe ve tevaya heremê didatin bipoşandin.

Belam ev hêzên hanê gelekî di cihên xwe de xwe nikarîbûn bidana bigirtin; jiber ku henga yekemî Barzanî bi hêrîşeke xurtî ji nişkê ve xwe bi ser ve date birakişandin. Bi vê hêrîşa hanê ve Sertîp Bekir Ebdul-Kerîm bi hersê liqên xwe ve hate birabûn. Şerekî germ hate bilidarxstitin û di encam de serê Qarawa hate bivegirandin. Sipahê Iranê hate bişikenandin û destaneke rast û durust pê hate bikevtin. Şer tanî awarebûna rojê date bidirêjîkirin.

Weha Danervanê nivîsta Komara Mehabadê li ser vî şerê hanê de date binivîsandin. Belam Mohemed Isa, yê ku ew yekek ji Beşdarvanên wî bû, ji me re dide bigotin, ku ew di roja sêyemî gulanê de ango bi cudabûna çar rojan ve li mêjûwa binavkirî ve hatîye bivêkevtin. Serbazên Iranî gelekî dane bikarkirin, da ku ew cihê vegirtîyê windakirî ji xwe re bidin bivegerandin û wan alîkarî ji hêza asmanî, tankan û topxanê ji xwe re dane biwergirtin; belam şer bi reva wan ve hate bidawîkirin û çemê Qarawa di nava wan û Barzanîyan de neda bihiştin, ku Barzanî Betarîyeke topxanêyî rakirî li cihekî pêşkevtî de di jorî Seqiz de bidin bigirtin. Di şer de 80 Serbaz û di nava wan de jî jimarek ji

Efseran hatin bikuştin û kelexên wan di gorepana şer de hatin bimayîn. Bi destên Barzanîyan ve 120 Dîl hatin bikevtin. Pir kelûpel hatin bidestkevtin. Heftdeh rêjînkên giran, du top û dused tiving hatin bidestkevtin. Bes û bi tenha ve Barzanîyan yek Kuştî dane bidan.

Dîl ji bona Mehabadê di rêya Hemamîyan re hatin biveguhestin. Xelkên Gundên li ser rê de li ser rexên wê de hatibûn birêzkirin û herwehaji cewawerên Mehabadê ji ji bona temaşekirina li Dîlan de hatibûn biderkevtin; jiber ku ev ji bona wan bi karekî bi serîyan ve nedihate bikevtin û ew nala perco dihate biderkevtin. Ev bi serkevtina ne pêşbînî ve rewanên wan bi bê sînor ve date biberzkirin û pêgîrîyan wan date bixurtkirin û canê serbilindaya milî di nava cerk û hinavên wan pê date bipufkirin. Herwehaji hêjbêtir ji wan re û ji cewawerên Kurdistana Iranê re dûrbûna karîn û karnasîyên Barzanîyan di hunera şerdariyê de date bidubarekirin û cihê wan di çavên wan de hate bibilindkirin. Di roja duwem de ji vê bi serkevtina hanê mezin ve Qazî Mohemed ligel Barzanî de berên xwe ber bi berê şer ve dane bivekirin û wan serdana henga yekem dane bikirin, ya ku wê şer dabû bikirin û ev bi serkevtina hanê dabû bicîanîn. Wan ji bona Payedaran û Efseran sipas û hêjakirinên xwe dane bipêşkeşkirin. Qazî Mohemed Payedarên hengê bi 140000 tuman ve dane bixelatkirin.

Fermandarê hengê sertîp Ebdul-Kerîm peyvek ji bona herdu Serweran date birûkirin: "Ez ji bona mêjûwê didim bigotin, ku ev Pehlewanên hanê ji mirinê nayêtin bitirsandin û ew bi arzanî ve jînê ji bona li berxwedana erkê de didin bigorîkirin, yê ku bi wan ve tête bisipartin. Divê li ser netewê kurd de bête biserbilindkirin, ku Lawên wîyî wetov têtin bidîtin, yên ku ew tucarî gumana wîna nadin bixapandin". Herwehaji wî date bidaxwazîkirin, ku nîşana mêrxasîyê ji bona Fermandarên hersê liqan jiber rola wanî rêberîyî qehremanî bête bipêşkeşkirin. Ev Qehremanê hanê ji evin: Mîrza Axa Reşo, Ezîz Mohemed Dolemerî, Melko Jajokî, Ibrahîm Yusif, Nebî ser Asin, Lawiko Mamend, Melko Zêro, Hesen Sulêman û Umer Hostanî.

Tanî wê demê kê m ji xelkên heremê bi agehdarî ve dihatin biderkevtin, bê ka Barzanî çî di gorepana şer de dikarin bidin biçianîn. Şerê Qarawa ne bes tenê navûnîşana wan di çavên xelkên heremê de lêbelêji wî ew di çavên cewawerên Kurdistanê de date biberzkirin.

Şerê Duwem Şerê Melqerenî yanî Mameşah

Ji bil parêzgeha sipahîyê Iranî li Seqiz de du parêzgehên wanî din yek li Bane de û ya din li Serdeşt de dihatin bidîtin. Rê û banên xêzên gihandina yarmetîyê ji bona herdu parêzgehan li jêr zalbûna Kurdan de dihatin bidîtin.

Di Sisêyî gulana sala 1946 de General Rezim Ara bi hêvîya gift û gokirinê ligel Wênerên Kurdan de ji bona hiştina vekirina rê û banên yarmetîyê -dî diyarîya xwe de- di rûwê herdu parêzgehan de ji bona Seqiz hate bigihaştin; belam di rastîya rastî de mebesta kokî jê, mîna ku ew di pişt re hate biderkevtin, bi danîna pîlanekî sopahî ve ji bona hêrîşek nuh li ser hêzên Komarê de dihate biderkevtin, da ku ew pê wê serşûrîyî bide bihilanîn, ya ku ew bi parêzgeha sipahîyî Seqiz ve di şerê Qarawa de hatibû bikevtin. Wî ji bona hêrîşî date bipilankirin û herwehaji wî parêzgeha sipahîyî Seqiz bi hêzên bêtir ve date bixurtkirin; piştî ku ew bi pîsî ve hatibûn bibezaandin û yê mayî ji bona Seqiz hatibûn bivegerandin.

Xweser piştî gihandina Rezim Ara ew ligel Şandeke Ezerbêcanî û Kurdîyî hevbeş hate bicivandin. Şanda Kurd di civînê de li jêr Sercengoş Caferê Kerîmî⁸¹ de ji bona giftûgokirinê li ser pirsên sînor de

⁸¹Di dawîya Kongirê Nehemînî Partîya Demokratî Kurdîstana Iraqê de di meha çirya duwem de Felek Eldîn Kakayî, Dr. Roj Şawis û ez ji bal Partî de ji bona nik Hizba Demokratî Kurdîstana Iranê ji bon giftûgokirinê li Mehabadê de hatin binardin. Ez naxwazim niha li vêderê de li ser zînetê wê çûnê û rûdanên wê de bidim biaxivtin; Jiber ku bi rastî ve di vê çûna me de tevaya helwest û siyaseta mêtîyîyî rast û durustî Partî li ser rewş û zînetê siyasîyî Kurd li Kurdîstana Iranê de dihate bidiyarîkirin û ji aliyê din de di tevaya perîşanî û bedbextîya helwest û siyaseta Hizbî Demokratî Kurdîstana Iranê de him beramberî rewş û zînetê siyasî li Iranê de bigiştî û himjî beramberî çarekirina pîrsa Kurd li ser qazanc û berjewendîya Kurd de li Kurdîstana Iranê de û herwehaji dujminatîya wêna beramber bi Barzanî û Partîya Demokratî Kurdîstana Iraqê ve dihate biderkevtin. Ev rûpelekî tîrîşî û talî ji mêtîyîyî me di demeke nişankirî de bi serê xwe ve tete biderkevtin. Ez hêvîdarim, ku li cîhekî din bi dûr û dirêjî ve li ser vê nardina me de û rûdanê tede û di dawîya dawî jî de encamên wê ji bona Xwendevanên hêja bidim binivîsandin.

Jiber vêkevtina şureşa Iranêyî pîroz di 12. 2. 1979 de û perîşanîya netêgihîştina Hizbî Demokratî Kurdîstana Iranê ew ji ser xwe hatibû biçûyîn; jîbervêjî ve wan di vê nardina me de ji bona nik wan tu pêt bi me ve nedane bikirin. Weha em li mala Cafer Kerîmî de hatin bimêvandarîkirin. Vî Ciwanmêrî pir rêz û hêjabûna xwe ji me re date

hate biamadebûn. Şanda Kurd li jêr Sercengoş Caferê Kerîmî de û ji sertîp Izet Ebdul-Ezîz û serdar Ibrahîm Salîh dihate bipêkhatin. Belam Şanda Ezerbêcanî ji Ibrahîm Elî Zade, Xelîl Erzîdikan û Hesên Cewdet dihate bipêkhatin. Li ser de hatin bilihevhatin, ku rê û ban di rûwê herdu parêzgehên bi navkirî ve bi vekirî ve bêtin bihiştin. Hêzên Komarê bi lihevhatinê ve dane bipêkirin û wan xêzên yarmetîyan bi vekirî ve dane bihiştin û ew bi xurtkirina cihên xwe ve hatin bikevtin, tanî ku berbeyana roja panzdehê axlêvê hate bidîtin; jiber ku ew roja hanê bi roja nîşankirina danîna pîlana Rezîm Arayî sipahî ve di cianîna wê de dihate biderkevtin.

Di vê roja hanê de Rezîm Ara di nava hêzên xweyî likarxistî de date bigotin: "Avrûwa sipahê Iranê li ser vî şerê hanê de tete birawestandin, yê ku hûn dê wî di vê rojê de bidin bikirin".

Di demjimara pêncan de tîpekî ji sipah bi hêrîşeke tund ve ji bona ser cihên henga duwem li Mel Qerenî de di rojavayî Seqîz de vê carê date bidestpêkirin.

Şerekî xwînavîyî dir date bidestpêkirin û sipahê Iranê tede sertbûneke xurt date bidiyarkirin û herwehaji wî tede hemû rengên çekan bi xurtî û bi karî ve date bikaranîn, yê ku ew bi gelekî ve ji şerê çûyî bi baştir ve dihatin biderkevtin.

di pêşî de alîyê tirazûwa sipahê Iranê dihate biserkevtin. Balafîran piştgirtineke bi kêr ve ji bona serbazgelên peyade dihate bikirin û herwehaji pêrejî piştgîrî ji bona wan ji bal tank û topxanê ji dihate bikirin.

Liqê yekem li jêr Fermandarîya Mohemed Emîn Mîrxan de ji henga yekem bi hewara henga duwem ve hate bigihandin, ya ku wê tevaya giranbûna hêrîşe didate bihilgirtin. Liqê yekem baştirîn piştgirtin

biderxistin. Herwehaji wî evîndarîya xweyî bêsinor ji bona Barzanî û Barzanîyan date bixuyanîkirin û rexneyên pîr mezin li Hizba Demokratî Kurdistanî de li ser siyaset û helwesta wê de beramber bi Barzanî û Partî ve date bikirin. Wî wêneyekî xwe û Barzanî bi cil û bergên sipahî ve ji bona me date bipêşandin. Herwehaji wî ji bona min listeyeke pîr dirêj bi nav û jimar ve û bi hemû dût û dirêjîya xwe ve date bisipartin, da ku ez wêna ji bona Mesud bidim bidan. Di nava vê lista hanê de navên hemû Sevakan li Kurdistanê de dihatin biderkevtin û herwehaji yê ku ligel wan de li Kurdistanê de didatin bikarkirin. Wetov jî Navê Şêx Ezedin bi nav û nîşana xwe ve û bi muçeyên xweyî mehane ji ve tede dihate bidîtin. Min ew lista hanê li gundê Rajanê de ji bona Mesud date bidan. Wetov min ev Ciwanmêrê hanê date binasikirin û di pişt re em çend carên din jî li mala wî de li bajarê Mehabadê de hatin bidakevtin. Cuma

ji bona Hevalên xwe date bipêşkeşkirin û ew di pêşkevtina xwe de tanî pesarên Seqiz ji semta rojhilat de hate bigihaştin û wî agirên hengelekê ji topxanê date bitemirandin û baregeha parêzgeha sipahîyî Seqiz li jêr gihandina gulebarandina tiving û rêjînkên liqê yekem de dihate biderkevtin. Piştî liberxwedaneke bi tund ve ji bal henga duwem de tundbûna hêrîşa Iranî hate bişikenandin û Liberxwedanvan bi hêrîşvanan ve hatin biveguhertin; jibervêjî ve bi lez û bez ve bi rêveçûna şer piştî çend demjimarên danê nîvro ve hate biguhertin. Sipahê Iranî nema dikarîbû xwe bida biragirtin û ew careke din jî hate bişikenandin û pir ziyarên gewre pêve çî di warê Merovan de û çî jî di warê kelpelan de hatin bikevtin û pir ji komên çekan û fişekan jî hatin bidestkevtin.

Jimarek ji Barzanîyan hatin bibirîndarîkirin û Xweşevî Kurê Xelîl Xweşevî⁸² hate bigorîkirin, yê ku ew ji Femandarê hêrîşa bi dij ve dihate biderkevtin. Gorîvan xortek bû, yê ku ew hêjî temenê wîna bi ser nozdeh salan ve nedihate biserkevtin. Pir Barzanî û Xelkên heremê dilên wan pê hatin bişikestî; jiber ku wî karinên femandarîyî zû didatin bidiyarîkirin û herwehaji ligel jî de wî mêrxasîyeke bê sînor didate biderxistin.

Piştî vê hêrîşa hanê ji Rêberîya sipahê Iranî ve hate biderkevtin, ku cihên Barzanîyan bi sengîn ve têtin biderkevti, yên ku wan xwe tede dabûn bigirtin û ew tucarî nikarin wan ji wêderê de bidin bilivandin. Sipahê Iranê ji biserkevtinê di her hêrîşeke din de hate bibêhêvîkirin; hêjîbêtir Rêberîya wîna nema dikarîbû dagirtineke bêtir ji hêzên xweyî dagirtî di vî şerî de bide bicîanîn. Berzanîyan bazin li gorîya Seqiz de didatin bitengkirin û wan ji hemû alîyan de dor lê datin bigirtin. Hêjîbêtir wan ew lihevhatina berê datin bihilanîn û wan rê û banên yarmetîyan ji bona parêzgeha sipahîyî Bane û Serdeşt datin bibirîn.

Li Mehabadê de hengeke çarem ji Berzanîyan hate bilikarxistin, da ku ew ji bona xêza berê şer bête binardin û Femandarîya wê ji bona sertîp Bekir Ebdul-Kerîm Femandarê henga yekem hate bisipartin û femandarîya henga yekem ji bona serdar Mohemed Salih hate bisipartin û ew ji bona Serdeştê hate birêkirin.

⁸²Ev ne bi Xelîl Xweşevî ve tede biderkevtin, mîn Êligton dide bianîn. Ji xwe re li Komara Mehabadê de li wergerandina Erebi de li rûpelê 171 de bidin bitemaşekirin.

Nexweşî serên Barzanîyan dide bixwarin

Belê Barzînîyan di mehên pêşî de ji gihandina xwe ji bona Kurdistana Iranê gelek azar dane bixwarin. Wan mal û malên xwe di herema xwe de li dû xwe de dane bihiştin û hîç bi yekekî ji wan ve nehate bikirin, ku ew tişteki ji mal û malên xwe ligel xwe de bidin bihilgirtin. Tevîjî ku birayên wan li Kurdistana Iranê de her alîkarîyeke karînî ji wan re datin bipêşkeşkirin; jiber ku Xwedê li ser her kesekî de bes û bi tenha ve wê li ser wî de dide bihilgirtin, yê ku ew wê dikare bide bihilgirtin. Merov li mala birayê xwe jî de bi biyanî ve tete biderkevtin; mîna ku gotinên pêşîyan didin bigotin.

Hemû alîkarîyên pêşkeşkirî bi merdbûn ve di zînetên dorhêla xwe de ne bitêrî ve dihatin biderkevtin û ew pir bi dûr ji dagirtina kêmanîyên wan ji pêwistîyên destikên parastina bêmarîyan ve dihatin biderkevtin. Nexweşîya Êşagiran di nava wan de di mehên pêşî de ji sala 1946 de hate bibelavbûn û pê nêzîka 1500 Nefer ji wan hatin bimirin; jiber nebûna Bijîşkan û dermankirina dermanan bêmarîyê bi gelekî ve gorî bi Barzanîyan ve date bigihandin, ji yê ku ew ji tevaya gorîyên şer û destanên wan bi mezintir ve dihatin biderkevtin. Nobûna bêmarîyê tanî sala 1947 date bidirêjkirin. Kêra bêmarîya Êşagiran bi gihandina Bijîşkekî Sovyêtî ligel komekê ji dermanan hate bikêmkirin. Di encamê dawî de bi vê bêmarîya hanê ve bêtir ji 2000 Barzanîyan ji Peyan, Jinan û Zarokan hatin bimirin. Bigir di piranîya gundên Kurdistana Iranê de û nemaze li heremên Mehabad, Şino û Bukan de jimarek ji gorên Barzanîyan de têtin bidîtin. Tevî li vê destanan hanê jî de erkê bingehî û giring ji bona li berxwedana Komarê de bi ser milên wan ve hatibû bikevtin. Ew bi wî karê sipartî ve ji bal birayên xwe de bi başî ve pê dihatin birabûn û ew bi bend û zendên li berxwedanê de ji bona Komara Mehabadê hatin bikirin; nemaze gava ku hêzên Eşîrên cih xwe datin bivedizandin û wan dev ji pêrabûna bi erkên bi wan ve sipartî ve date biberdan. Ew ji hevdû hatin bibelavkirin û wan dev ji wan cihên bi wan ve sipartî ve datin biberdan; jiber ku ew nehatibûn bifêrkirin û neji wan dikarîbûn bidin bihilgirtin, ku ew bi demeke dirêj ve di berên şer de bêtin bimayîn, hêjbêtir wan ne ligel xwe de û neji ligel hevdû de didatin bilehevkirin. Pir caran perîşanîya canê yekitîyê di nava Neferên Eşîrê de bi carekê ve bi yekkirina gotina wan ve nedihîşt bête biderkevtin. Pir ca-

ran jî di nava berekî de pevçûn dihatin bivêkevtin; yên ku ew pir di serûştîya xwe de ji berjewendîya giştî û erkê welatî bi dûr ve mîna pevçûnên li ser erd û zevîyan de ûhd.... dihatin biderkevtin. Barzanî pir bi şeweyê dadkirina Şêx û Axan ve derbarê çarenûsa Neferên Eşîrê de dihatin bisersûrandîkirin; nemaze ew sitemkarîya rûtî bê bext ku wan Neferan ji bal Şêx û Axan de didatin bihilgirtin. Barzanî nikarîbûn li ber vê reftara hanê de bêtin bikevtin; jiber ku wan reftareke wetov li nik Şêxên xwe de nedidatin bidîtin. Pir caran Barzanî bi destdirêjkirina parastina Xelkê ji bêbextîya Axayên wan dihatin bineçarîkirin. Vêjî dujminatîya Axê ji wan re didate biwergirtin, yê ku wî jî bi hemû renekî ve ji wan re dijwarî didatin bidurustkirin. Wî xwe ji pêşkeşkirina xwarin û vexwarinê ji bona malên Barzanîyan di herema xwe de didate bivedizandin.

bi rêkûpêkbûna Barzanîyan di rabûna wan de bi erk ve li ser xwe de, guhpêdana wan bi fermanan ve û dûrbûna wan ji durustkirina dijwarîyan dildarîya Komarê ji xwe re dane biwergirtin û hêjbêtir hêjabûn û dildarî wan ji bal gelemperîya milletê reftarkirî ligel wan de ji xwe re dane biwergirtin. Vê pêrabûna giştî pal bi Efserên Sovyêtî ve date bidan, ku ew xweser ligel Barzanî de bidin bireftarîkirin, yê ku wî zalbûna xwe li ser tevan de dabû bineçarîkirin. Wan Efseran ne bes tenê derbarê kar û barên sipahî, lêbelê jî derbarên kar û barên din jî de şewirdarîya wî ji xwe re didatin bikin, jiber ku tanî berî şerên Qarawa û Milqerenî pêwendiyêke xweser di nava Berzan û Sovyêtê de nedihate bidîtin.

Derîyê Sêyem

Damezrandina Partîya Demokratî Kurdistan

Rewşa Kurdistana Iranê û pêşkevtinên wêyî başîyî mezin rê li ber - Lijneyî Azadî -Encumena Azadîyê- de ji bona remankirina derbarê çarenûs û pêşkevtina tevgera Kurd li Kurdistana iraqê de neda bigirtin. Piştî serpehatîya bi serkevtî ve di damezrandina Hizba Demokratî Kurdistanî de li Iranê de û fêrbûnên wergirtî ji şûreşa Barzan ji 1943 - 1945 de bi eşkere ve dihate biderkevtin, ku qonaxa niha daxwazîya damezrandina Partîyeke Demokratîyî Kurdistanî li Iraqê de mîna Hizba Demokratîyî Kurdistanî li Iranê de dide bikirin. Piştî xwendekarîyeke bi dirêj ve li ser zînetên heremê û dibûnên ayîndî de Barzanî ligel Hevalên xweyî Efserên Welatperwer de ji Endamên Encumena Azadîyî pêwistîya damezrandina Partîyekê date bibiryarkirin, da ku ew bikaribe bi kar û barên qonaxa niha ve li gora veguhertinên nuh de bête birabûn, ya ku armancên wê ligel hêvîyên cemaweran de têtin biderkevtin. Ev remana hanê di dawîya reşmeha sala 1046 de hate bimeyandin. Barzanî ligel Xebatvanên Hemze Ebdul-Lahê Dadyar, Servan Mîrhac Ehmed, Sertîp Izet Ebdul-Ezîz, Servan Mustefa Xoşnaw, Servan Xeyrul-Lah Ebdul-Kerîm, Sitvan Mohemed Mehmud Qudsî û Sitvan Nurî Ehmed Taha de hate bicivandin. Wan kelpîçên pêşî datin bidanîn, ya ku jêre li paş de bi Partîya Demokratî Kurd ve dihate bigotin. Herwehaji wan datin bikarkirin, da ku ew bendên bernamê û peyrewa navxweyî Partîya nuh bidin bihîmkirin. Hin ji bergirên rastî ve li ber pêrabûna Partîya nuh de bi jêhatîbûnên xweyî zanyarî û rêxistinê ve bi renekî eşkere ve di Komara Mehabadê de hatin biderkevtin. Barzanî û Rêberên Partîya nuh datin bihestyarîkirin, ku Peyên Komarê nadin bixwestin, ku Partî pêrabûnên xeyî jêhatî di wir de bide bikirin, tevîjî ku wan bi germî ve pêşewazîya

reman û pêkanîna wê didatin bikin; evjî bi zînetî siyasî ve dihate biderkevtin, ya ku têde ew Komara nuhhatî tere dihate biderbaskirin. Dibû, ku li nik Dujminên Komara zayî de mahneyek ji tundkirina dujminatîya wanî eşkere nemaze li nik Turkî û Iraqê de bihata biderkevtin, yê ku ew ji bal Hevalbendên xweyî Rojava de têtin bipiştgirtin û ew hebûna wan didin biparastin. Pir bi hêsanî ve dikarîbû bihata biliberkevtin, ku Komara nuhhatî bi derbasbûna çend mehan ve li ser damezrandina xwe de pilaneke siyasîyî fireh ji bona Kurdistanê gewreyî serbixwe ji xwe re dide bidanîn, ya ku di nava wê jî de beşê Turkî û Iraqî jî tete bikevtin. Rêberên Komara Mehabadê di vê zînetî xweyî pir bi tirs ve pêwistî bi vê rû bi rûbûna hanê ve nedivabûn bihata bikin. Hêjîbiserdeji ve ev Partîya nuh bi patîyeke Iraqî ve dihate biderkevtin û ew bes û bi tenha ve ji bona Kurdistanê Iraqê û cemawerên Kurdên wêna de hatibû bidamezrandin. Wer divabû tégihîştin û jê-hatîbûnên wêna bes û bi tenha ve ji bona Iraqê bihatana bitirxankirin; jîbervêjî ve hate bibiryardan, ku Hemze Ebdul-Lahê Dadyar ji bona Kurdistanê Iraqê bête binardin, da ku ew pêwendîyên pêwistî ligel Rêberên Hizba Şûreş, Rizgarî û Liqê Hizba Demokratî Kurdistanî li Sulêmanîyê de, yê ku ew Liqekî Hizba Demokratî Kurdistanî Mehabad bû, bide bikin. Hemze bi desthilatîyên bi carekê ve ji bal Barzanî û Encumena damezrandinê de hatibû bidesthilatîkirin. Ji wan temînîyan, ji yê ku Hemze ew ligel xwe de dabûn bihilgirtin, ev bûn:

1. Helbijartina Şêx Letîfê Şêx Mehmud bi Cîgirê yekemî Serok ve.
2. Divê ku Kake Mohemed Ziyad bi Cîgirê duwemî Serok ve bête bidanîn.
3. Divê tanî pêlekê li ser peymanê, bernamê û peyrewê navxweyî de tu veguhertinên bingehî neyêtin bikin.
4. Da ku kês bi destên Impiryalîyê ve neyête bikevtin, divê tanî demekê girêdan li ser hêrîşê de ji bona berjewendîyên Ingilistanê neyête bikin, tanî ku bingehên Partî bêtin bihîmkirin, da ku ew ji pêrabûnên hêrîşên bi temirandinê ve û bi dûketinê ve bête biparastin. Bi serdeji ve Impiryalîya Ingilîzî hatîye biqertkirin û dem hatîye, ku

ew wê valabûna li dû xwe de ji bona desthilatîyeke welatperwerî bi serxwe ve bide bihiştin û da ku Impiryaliya Emerîkiyî nuh wê kêşê ji xwe re nede bikaranîn; jiber ku ew ji cenga cîhanîyî duwem hatîye biderkevtin û ew xwe niha di berzbûna jêhatîbûn û hinera xwe de dide bidîtin.

Di dawîya buhara sala 1946 de Hemze Ebdul-Lah ji bona Kurdistana Iraqê hate bivegerandin. Wî pêwendî ligel wan Partî û Kesatîyên bi navkirî ve date bikirin. Rêberîyên Hizba Şûreş û Rizgarî di bingeh de bi jihevexistina herdu Hizban ve û bi tevlêbûna ji bona nava Partî ve hatin bipêrûniştin, bi mercekî ve ku ev piştî bi girtina her yekê ji wan kongirê xweyî taybetî ve bête bikirin, da ku Wênerên kongirên wan li ser zîmeta nuh de bêtin biagehdarîkirin. Herdu kongire di pêşîya gelavêja sala 1946 de hatin bigirêdan û piranîya pir di herdu kongiran de li ser damezrandina Partîya nuh de piştî hinek ji rexnan û bestandinên sivik de hatin bipêrûniştin.

Kongirê Yekem

Partîya nuh kongirê xweyî yekem di şanzdehê gelavêja sala 1946 de li Begdadê de date bigirtin. Ev roja hanê bi rojeke mayînî ve di mêjûwa netewê Kurd de tête biderkevtin û ji bona Partîyê navê Hizba Demokratî Kurdî li Iraqê de hate biwergirtin. Belam di pişt re û tanî niha jî ew bi navê partî hate binavkirin⁸³. Endamên Kongire peymanî partî, bername

⁸³Di salên heştêyî de li bajarê Tehranê de Hesên Qezelçî ji me re li ser çawabûna vergirtina navê Partî de hate biaxivtin: Di rêkirina bername û peyrew de ji bona çapkirinê li Tebrîzê de di çapxanê de navê Hizbê bi navê partî hate biveguhertin. Ew wêçaxê him li Tebrîzê bû û him jî li çapxanê bû. Ew bi Bînvane vê veguhertina hanê bû. Di buhara vê sala 1988 de li Selahe din de Hebib Ebdul-Kerîm bi zimanê Erebi ve: Mêjûwa partîya Demokratî Kurdistan date binivîsandin û wî destnivîsa wê ji bona min date bidan, da ku ez wê bidim bixwendekarîkirin û bîr û bawerîyên xwe li ser de bidim biderxistin. Min jêre ev çîroka Hesên Qezelçî der barê veguhertina navê Hizbê bi navê Partî ve date bigotin. Hêjîbêtir min ji Elî Ebdul-Lah li ser navê Hizbê de date bipirskirin. Wî jî date bigotin, ku navê wê di kongirê yekem de û herwehajî di belgeyên rêkirî de ji bona Mehabadê bi navê Hizbê ve dihate biderkevtin û ew li wêderê de hate biveguhertin.

Nivîsta Hebib Ebdul-Kerîm der barê Mêjûwa Partî de bi şeweyekî zanistîyî rexnegirîyî

203 Barzanî û Tevgera Azadîxwazîya Kurd 1931 - 1958

û peyrewê wêyî navxweyî datin bixwendekarîkirin, yê ku ew li Mehabadê de hatibûn biamadekirin û piştî giftûgokirinê li ser wan de û hin ji veguhertinên sivik de li ser navrokên wanî dawî de hatin biryardan. Kongire dest bi helbijartina Endamên Komitîya Nawendî ve date bikirin; piştî ku wî temînîyên Barzanî û Hevalên wî ji xwe re date biwergirtin.

Ev navên tên ji bona yekemîn Komitîya Nawendîyî partî hatine bihelbijartin:

1. Mustefa Barzanî bi Serokê Partî ve
2. Şêx Letîf Şêx Mehmud bi Cîgirê yekemî Serok ve
3. Kake Mohemed Ziyad bi Cîgirê duwemî Serok ve
4. Hemze Ebdul-Lah
5. Mîrhac Ehmed
6. Doktor Cafer Kerîm
7. Elî Ebdul-Lah
8. Salih Yusifî
9. Ebdul-Kerîm Tewfiq
10. Reşîd Ebdul-Qadir
11. Reşîd Bacilan
12. Mele Seyid Hekîm Xaneqînî
13. Ewnî Yusif
14. Taha Muhye-Dîn
15. Ebdul-Semed Mohemed bi Berendam ve

Di pişt re Komitîya Nawendî civîna xweyîyî pêşî date bigirêdan û tede Sikretêr û Endamên Mekteba Sîyasî bi vî rengî ve hatin bihelbijartin:

Hemze Ebdul-Lah bi -Piştrastê Veşartîya Giştî ve -bi Sikretêr ve, Cuma-hate bihelbijartin.

Bi Endamê Mekteba Sîyasî ve ev hatin bihelbijartin

1. Doktor Cafer

bilind ve hatîye binivîsandin. Piranîya nivîstên din di vî warê hanê de bi renegekî rojhilatîyî raxistîyî sade ve hatine binivîsandin. Cuma

2. Elî Ebdul-Lah
3. Ebdul-Kerîm Tewfîq
4. Reşîd Ebdul-Qadir

Partî bi erkên xweyî xabtî ve hate bipêrabûn û wê cemawerên Kurdistanê ji wê roja pêkhatîne tanî vê roja me jî date bi ajotin.

Bi vê partiyê ve biserkevtin û şikestên milletê Kurd pêve hatine bibestandin û bi gotineke din ve çarenûsa meletê Kurd pêve hatiyê bigirêdan. Tevî li hemû dijwarîyan de ew her û her bi dilsoza netewê Kurd ve dihate biderkevtin⁸⁴.

Piştî ku ev gava hanê bi serkevtî ve hate bicîhatin, pêwendî bi leztir ve û bi bêtir bi rêxistî ve di navbera Barazanî û Partî de dihate bikirin. Şêwirdarî hemîşe di navbera wan de dihate bikirin û partî bi roleke mezin ve ji bona civandina yarmetîyan di nava Iraqê de pê dihate birabûn û wê ew ji bona Barzanîyan li Kurdistana Iranê de didate binardin; jiber ku wan li wêderê de azarîya nexweşiyê û kêmxwarinê didatin bixwarin.

⁸⁴Ji xwe re bêtir bi dirêjî ve li ser mêjûwa Partiyî pêşî de li Mêjûwa Partiya Demokratî Kurdistanî de ji durustkirina wêna tanî Kongirê Sêyem ji bal Elî Ebdul-Lah bidin bitemaşekirin.

Derîyê Çarem

Cudabûn di navbera Tebrîzê û Mehabadê de

Di navbera Rêberên Komara Ezerbêcana Demokratî û Rêberên Komara Mehabadê de cudabûn dihatin biderkevtin. Ezerbêcanîyan her û her didatin bixwestin, ku ew zalbûna xwe li ser Komara Mehabadê de bidin bizalkirin û li ser wê de peyeta wê ji bona xwe bidin bineçarîkirin. Di vî babetê hanê de rola Bagerof bi nebaşî ve dihat biderkevtin; jiber ku wî piştî Ezerbêcanîyan didate bigirtin û wî bi her haweyekî ve givaştin li ser Berpirsiyarên Kurdan de didate bikirin, da ku ew wan ji bona Rêberîya Tebrîzê bide bisertewandin. Herwehajî wî şeweyê givaştina bûjenî jî didate bikaranîn. Yarmetiyên Sovyêtî ji bona Ezerbêcanîyan bi merdî ve dihatin bipêşkeşkirin; di dema ku ew pir bi kêm ve û piştî daxwazkirineke li dû hevdu de ji bona Komara Mehabadê dihatin bipêşkeşkirin.

Bi eşkere ve berên herdu Komaran bi carekê ve bi cudabûn ve - dihatin biderkevtin; jiber ku Komara Ezerbêcan bi çepgerî ve û girêdayî bi siyaseta Bagerof ve dihat biderkevtin, di gava ku Komara Mehabadê di serûştîya xwe de bi milî ve dihat biderkevtin û wê siyaseta bestandinê didate binayînîkirin û helwesta wêna der barê vê deqa hanê de pir bi sert ve dihat biderkevtin.

Barzanî nedixwest, ku tu pişka wîna di nava van kar û barên siyasîyî xurû de û herwehajî di nava wan de pêwendiyên Komara nuhatî ligel Sovyêtê de bête biderkevtin. Wî xwe ji bona kar û barên sipahê û bi serpereştîkirina rêxistina hêzan ve dabû bivalakirin. Kar û bar hatin bitevlihevdûkirin û cudabûn bi sînorekî ve hatin bigihaştin, ku herdu Komarên nuhatî pêwendiyên xwe ji hev bidin bibirandin û hêzên wan bi pêxîlên hevdu ve bêtin bikevtin. Vê date bihiştin, ku Sovyêt ji bona

dîtina herdu alîyan bangekê bide binardin, da ku ew ligel hevdû de li Tebrîzê de di navrasta cotana sala 1945 de bidin biaxivtin. Ev dîtina hanê hate bikirin û peymanek hate bigirêdan, ya ku em ji bendên wê van didin bibîrxistin:

Benda yekem

Çi gava ku alîyekî niyazmendî date bidîtin, ew dikare Wênerên xweyî mirî li nik alîyê din de bide binîşankirin.

Benda duwem

Di heremên cudabûn li ser wan de Kurd di dam û destgehên serdarîyê de Kurd têtin binîşankirin; heger ku jimara Kurdan bi bêtir ve bête biderkevtin, wehajî ev jî derbarê Ezerbêcanîyan jî de tete biderkevtin.

Benda sêyem

Herdu serdarî encumeneke abûrî didin bidurustkirin, da ku ew derdên abûrî bidin bidermankirin û divê biryarîyên vê encumena hanê bi divabûn ve ji bona herdu Serokên serdarîyan bête biderkevtin.

Benda carem

Di gava pêwîst de herdu alî hevalbendîyeke sîphaî didin bigirêdan û ew ji bona hev her yarmetîyeke divayî didin bipêşkeşkirin.

Benda pêncem

Her giftûgoyek di navbera serdarîya Iranî de û yekekê ji alîyên hevalbend de divê ew neyête bikirin, tanî ku alîye din pê neyête birûniştin.

Benda şeşem

Dê serdarîya Ezerbêcanî bi gavên pêwîst ve bête birabûn, da ku ew ji bona Kurdên jîyandî di nava sînorê wê de bi palpêdana pêşkevîna ferhengî û zimanî bête biderkevtin; herwehajî wetovjî Kurd divê bidin bikirin.

Benda heftem

Her Kesê ku ew ji bona t êkûpêkçûna dostanîya mêjûyî û hevalbendîya di navbera herdu miletan de û herwehajî ew ji bona nemankirina

yekitîya wanî welatî bide bikarkirin, dê ew ji bal herdu miletan de bête bisizadan.

Di dawîya dawî de cewhera pevçûnê, mîna ku me berê date bibîrxistin, di zalbûna idyolocî de dihate biderkevtin, ya ku jêre Komara Ezerbêcanê didate bixebatkin û herwehaji ew di cudabûna wan de li ser sînor de dihate bigirêdan. Ev xala hestiyar di ser guhan re hate biavêtin. Em nizanin, bê kanî çima ev pirsê hanê di pêla giftûgokirinê de tu pêt pê nehate bidan; ji bil di civîna ku ew hate bikirin, ya ku tê de wênerên wan nala Çavdêrvanan û Amojgarvan bi hiştina dijwarîya nîşankirina sînor bi vekirî ve dane bihiştin, tanî ku Kurdên Turkî û Iraqê ligel Kurdên Iranê de bêtin biyekkirin. Bi rast û durust jî dihate biderkevtin, ku li gora zîmeta Hevalbendan de di piştî cengê de ne di afirandina Kurdistaneke gewre de dihate biderkevtin û ne jî bi yekkirina perçên Kurdistana parvekîrî ve di nava bernameya Sovyêtîyî siyasî de bi carekê ve nedihate biderkevtin. Jibervêjî ve pirsê Kurdistanê ne li ser mêzên giftûgokirinê û dîtinan de û ne jî di kongiran de li ser de dihate biaxivtin, ji yê ku ew berî bi dawîbûna cengê ve û di paş wê jî de di navbera Serokên dewletên bi serkevtî ve hatin bigirêdan. Dibe, ku ji aliyê Sovyêtî ve beşek ji bernameya wanî siyasîyî bi taybetî ve di Iranê de bû, ku wê ji bona hiştina hêzên xweyî kevtîyî Iranê berî şeş salan didatin biarmanckirin, mîna ku di pişt re rûdanên di salên 1947 û 1948 de datin bieşkerekirin.

Serdana Qazî Mohamed ji bona Tehranê

Qazî Mohamed di meha gelavêja sala 1946 de bi serdaneke mîrî ve berê xwe ber bi Tehranê ve date bivekirin. Li wêderê de ew ligel Qewam Seltene û Rezim Ara Serokê cengoşê Sipahê Iranî de hate bicivînkirin. Qewam li ser Qazî Mohamed date bipêşneyarkirin, ku tevaya Kurdistana Iranê di yek deverê de bête bikomkirin û ew ji bal Serdarekî giştî ve bête biserpereştîkirin, yê ku ew ji bal serdarîya navînî de tete binîşankirin û wî li ser Qazî de date bipêşneyarkirin, ku ew bi serdarîkirina deverê ve bête birabûn. Belam Qazî ev pêşneyara hanê date bivegerandin; jiber ku dê wê bi rast û durustî ve birîna bi carekê ve di navbera Kurdistana û ezerbêcanê de bida bikirin. Herwehaji Sovyêt jî bi dijî pêşneyara Iranî ve dihatin biderkevtin. Qazî bi xwe ve mêldarîya vê pêşneyara hanê didate bikirin; belam ew hate liberkevtin, ku pêrûniştina Sovyêtî ji bona her

pirojeyekî bi pêwistî ve tete biderkevtin, yê ku ew pêwendîya di navbera Mehabadê û Tebrîzî de dide biveguhertin.

Herwehajî pêşewazîya Qazî Mohamed der Balyozxana Sovyêtê de ne wer bi germî ve dihate biderkevtin, mîna ku jêre dihate bipêşbînîkirin. Wan jêre date bieşkerekirin, ku wergirtina pêşneyarên Qewam bi rast û durust ve bi bêbextîya Ezerbêcanê ve tete biderkevtin û ew di dawîya dawî de nikarin ji bal Sovyêtê de bêtin bipiştgirtin. Ji alîyekî din de likarxistin dihatin bikirin, da ku hêrîşek ji bona ser devera Senendec bête bidestpêkirin. Egleton -Êgilton- dide bivegotin⁸⁵, ku Efserên Rusan ji Kurdan re datin biamojgarîkirin, ku ew bi tu hêrîşê ve neyêtin birabûn. Belam rastîyên din didin biderxistin, ku Sovyêt û Ezerbêcanî hêrîşeke wisa pir bi dilên wan ve dihate biderkevtin.

Mîna ku Mohamed Isa û yê din didin bigotin, ji yê ku wan ew serdanên Efserên Sovyêtîyî li dûhevdû de ji bona nik Barazanî de bi ermanca amadebûnê ji bona hêrîşê ve bi çavên xwe ve didatin bidîtin. Wan çar tank ji bona Seqiz datin binardin, da ku ew piştbanîyê li hêzên hêrîşkirinê de bidin bigirtin; jiber ku hêzên Komara Kurdî çekên wêyî wetov nedihatin bidîtin. Herwehajî du Efserên gewre ji Tebrîzê ji bona Seqiz bi navên Ezîmî û Kebîrî ve hatin bigihandin û ew ligel Barzanî û Efserên wî de li ser kar û barên hêrîşê de dihatin biaxivtin. Kar û bar bi rêk û pêk ve ji bona amadekirina hêrîşê dihatin bikirin.

Belam rûdanan berekî dinî ji nişkêve ji xwe re dane bigirtin û careke din jî siyaseta cîhanê destên xwe ji bona bigorkirina hêvîyên Kurdîyî welatperwerî date bidirêjkirin, ya ku wê ew bi serpehatîya tîrş û talî komara zayî ve date bidurustkirin.

⁸⁵Komara Mehabadê, wergerandina Erebi,rûpelê 174.

Derîyê pêncem

Nêzîkbûna Dawîbûnê

Piştî kevtina sipahê Sovyêti û Ingilîzi ji bona nava Iranê de der gelavêja sala 1941 de û vegirtina xakê wêna Wizareta Derveyî Ingilîzi reşbeleka peymanekê ji bona serdariya Sovyêti date bipêşkeşkirin û serdariya Sovyêti li ser wê de date bimorkirin. Di wê peymanê de hate bidubarekirin, ku hebûna sipahên Hevalbendan li Iranê de ne ji bona vegirtinek sipahî tete bimebestîkirin û neji ew ji bona berlêgirtina kar û barên hêza navxweyî tete biderkevtin û hêzên Vegirtvan destdirêjîyê ji bona nava jîyana abûriyî welêt, yanji çûn û hatina Neşînvanan yanji berlêgirtina bicîanîna qanûn û yasayên Iranê nadin bikirin. Tevlivêjî de Yekîtiya Sovyêti piştgirtin ji bona pêkanîna Komarê di Ezerbêcanê de date bigirtin û herwehaji wê piştgirtineke bi carekê ve ji bona Komara Kurdistanê date bipêşkeşkirin. Yekîtiya Dewletên Emerîkî û Ingilistanê ev piştgirtina hanê bi derkevtinekê ji peymanê ve ji bal Sovyêti de datin bidanîn. Jîbervêjî ve vegivaştin her û her li ser Sovyetê de ji bona vekîşandina wêna ji Iranê dihate bikirin. Diplomasîya Iranî der Yekîtiya Netewan de xwe date bijêhatîkirin û wê bendên peymanê ji xwe re didatin bikaranîn. Ji rexekî din de Qewam Seltene ji bona Sovyêti didate bisozdan, ku ew dê mafeyê lêgerandinê ji bona neftê ji bona wan bide bidan, dê ew parastina mafeyên Ezerbêcanîyan û Kurdan û çarekirina pirsê bi şeweyekî aşîti ve bide bikirin.

Ez naxwazim livêderê de bi dûr û dirêjî ve bidim biaxivtin; jiber ku nivîstên din li ser vê pêla hanê de hatine binivîsandin û ew li ser tevaya pirsan de bi dirêjî ve hatine biaxivtin. Lêbelê li vêderê de divê bête bigotin, ku Yekîtiya Sovyêti li ser xwe de bi vekîşandina hêzên xwe ve ji Iranê dabû bidivakirin û Wênerê wêna li nik Yekîtiya Netewan

de Mîrza Goromiko di raportê xwe de di 26. 3. 1946 de date bidubarekirin, ku dê Yekîtîya Sovyête hemû hêzên xwe di nava şeş înan de bide bivekişandin.

Wer bi diyar ve dihate biderkevtin, ku dê hêzên Sovyêtê ji Iranê bêtin bibarkirin û dê wêçaxê li ber serdarîya Tehranê de tu bergir nema dikarin bêtin bidîtin, da ku ew bi leşkerên xwe ve xwe ji bona ser Ezerbêcan û kurdistanê bide birakişandin.

Ez nizamim, magelo çawan Rêberên Ezerbêcan û Kurdistanê di wêçaxê de didatin biremankirin, ma dê çi bi serê milletên wan ve bêtin bikevtin, piştî ku Sovyêt xwe bide bivekişandin û magelo Merov dikare piştî xwe bi sozên qewam ve bide bigirêdan? Belê yê dawî konebûna xwe di xapandina diplomasiyê de date biderxistin. Bi eşkere jî ve pirsî Kurd bi gorîya pevçûna di navbera berjewendiyên dewletan de hate biderkevtin.

Qewam Seltene ji bona Mosko hate biçûyîn û wî li ber Stalin datin bidanîn, yê ku Stalin ji xwe re didate bixwestin, ew jî di mafeyê lêgerandina neftê û bikaranîna birên wê û derxistina neft û Gaza serûştî ji jorî Iranê beramber bi xwe vekişandina sipahê Sovyêtî ji jorî iranê de dihate biderkevtin. Piştî ku xwe vekişandin hate bikirin, li gora destûra Iranê de Peymana -Qewam- ligel Mosko de ji bona morkirinê li ser de ji bona ber Cîvata Parlemanî Iranê de hate biraxistin.

Qewam, yê ku hevsarê piraniyê di Cîvatê de di nava destên wî de dihate bidîtin, ji wan re bi hêrîşî ve li ser xwe û peymanê de bi bêbextiyê ve û bi derkevtinê ve ji bendên destûrê date biferemankirin; jiber ku bendên destûrê ji bona serdarîyê didin biqedexekirin, ku ew nikare hîç peymaneke bi dana mafeyê lêgerandinê bi hîç dewleteke Biyanî ve bide bidan, bêyî ku morkirina Cîvatê di berê de li ser de nehatibe bikirin. Weha peyman ji bal piraniyê de hate binayînkirin, mîna ku jêre hatibû bidanîn. Wetov Stalin bi rengê bînimûne ve hate bixapandin. Nayînkirina Peymanê di piştî bi dawîhatina vekişandina leşkerên Sovyêtî hate bikirin.

Herifandina Ezerbêcanê

Balyozê Sovyêtî li Tehranê de bivêyek ji bona serdarîya Iranê date bidan, ku serdarîya wî nikare bi destgîrêdayî ve beramberî bi rûdanên nêzîkî sînorên xwe ve li Ezerbêcanê de bête birawestandin. Sovyêt bes û bi

tenha ve dikarîbûn bi vê ve bihata birabûn, da ku ew bi dawîhatina neçarkirî ve hinekî bidin bigêrûkirin; jiber ku mîna me date bibîrxistin, hêzên wan bi carekê ve xwe ji tevaya xakên vegirtî ve ji Tehran tanî sînora dabûn bivekişandin. Haşîmof Şahbenderê Sovyêti li Ormiyê de ji bona Şandeke Kurdî, ya ku wê serdana wî dabûn bikirin û ligel wî de li ser pêşvekevîna hêzên Iranî de ber bi Ezerbêcan û kurdistanê ve datin biaxivtin, date bidubarekirin, ku serdarîya Iranî dide bimebestîkirin, ku ew ji bona Kurdistanê dixwaze hêzeke biçûk bide binardin, da ku ew serpereştîyê li helbijartinan bide bikirin û dê ew di pişt re xwe bide bivekişandin.

çawan Şanda Kurdî bi gotinên Haşîmof ve hatin bibawerkirin? Jiber ku birêveçûna tevaya rûdanan didatin binîşandan, ku serdarîya Iranê bi piştligirtina bi carekê ve ji bal Yekîtiya Dewletên Emerîkî û Ingilistanê de, bi biryara Civata Ewlebûnê⁸⁶ ve û bi bédengîya Sovyêti ve didate bixwestin, ku ew kar û baran mîna berê bide bizîvirandin û ew zîmeta cîyografî - siyasîyî jorî Iranê mîna berê bide bivegerandin.

Tevîlivêjî de hêvîya bi vir ve di serên Serokên Welatperwerên Kurdan û birayên wanî Ezerbêcanîyan de hatibû bimayîn, ku dê kar û bar bi rêya xweyî serûştî ve bêtin biçûyîn. Jibervêjî ve hiç tu rawestandî ji bona likarxistina hêrişa ser Senendec û vugirtina wêna de nehatin bikirin û herwehaji hêjî her çar tengên girêdayî di berê hêzên Kurdî de li Seqiz de ji bona piştligirtina Peyadên Kurd di dema hêrişê de dihatin bimayîn. Herwehaji hêjî herdu Efserên Ezerbêcanî Kebîrî û Ezîmî jî ligel hêzên dagirtî de dihatin bimayîn û ew nehatibûn biçûyîn.

Debera em niha peyvê ji bona yekekî ji Peyên Hêrişê Mohamed Isa re bidin bihiştin. Mohamed Isa dide bigotin: "Di şeva 10/11. 12. 1946 de maşînek cêb ji bona baregehê Barzanî hate bigihaştin, ku wê nameyek bi pele ve ji bona herdu Efserên Ezerbêcanî didate bihilgirtin. Piştî xwendina nameyê wan xwestina dîtina xweserî Barzanî datin bikirin. Wan pê dane bigihandin, ku sipahê Iranî xwe ber bi Tebrîzê ve dide bipêşvexistin û niha şerên pir giran di navbera Miyanê û Tebrîzê de têtin bivêkevîtin û wan ferman bi vegerandina xwe ve ligel herçar tangan de dane bigirtin, hêjîbiserdejî ve serdarîya Ezerbêcanê hewarên sipahîyê ji xweha xweyî Komara Kurdistanê dide bixwestin. Barzanî bi

⁸⁶Ev Biryara Civata Ewlebûnê bi biryara wêyî pêşî ve piştî pêkahtîna wêna têtê biderkevîtin. Cuma

daxwazan ve hate bipêrûniştin û herçar tang jî hatin bivegerandin û ferman ji bona Mohamed Emîn Mîrxan bi livandinê ve ji bona Miyandu Ab di wê şevê bi xwe de hate biderkevtin, da ku ew dera hanê bi cihê dîtina Barzanî ve bête biderekvîtin.

Barzanî ligel Kebîrî û Ezîmî de di 11/12. 12. 1946 de bi Miyandu Ab ve hate bigihaştin û wan datin bizanîn, ku sipahê Iranî bigir li ber kevtina Tebrîzê de tete bidîtin û wî di rêya xwe de hemû liberxwedanî dane bitarûmarkirin. Barzanî ji bona Mohamed Emîn bi xwe girtinê ve date bifermarkirin, da ku ew ji bona Tebrîzê neyete bilivandin, tanî ku rastîya wî nûçeyê hanê neyete biderkevtin û zînet neyete bieşkerekirin.

Bi rastî jî ve tu şerên weha giran li Miyane de nehatibûn bivêkevtin, mîna ku berê hatibû bigotin û herwehaji li wêderê de tu liberxwedanî beramber bi serrakişandina Iranî ve nidihate bidîtin. Hîç û pûçên çekkirî ji bal serdarîya Ezerbêcanî de dihatin bibazdan, berî ku ew hîç mîrxasîyek di xwe de ji bona berengarîyê ligel sipahê Iranî de bide bikin. Bi rastî ve serrakişandina sipahê Iranî bi mîna xwepêşdanekê ve yanjî bi rêveçûneke ahengî ve di hate biderkevtin. Dunya ji ber vê herifandina ji nişkê ve bi gêl û gêj ve hate bikin. Xweş hate bidiyarkevtin, ku dê nora Mehabadê xweser piştî Tebrîzê bête bihatin.

Vekişandina Barzanîyan ji bona Mehabadê

Barzanî ji bona miyandu Ab û hate bivegerandin ew di serayê de hate bicîkirin, ya ku henga yekem di berê Seqîz de ew ji xwe re dabû bibaregehkirin. Wî ji bona Mohamed Emîn bi livandina xweser ve ji bona Mehabadê date bifermarkirin, da ku ew malên li wêderê de bide biparastin. Herwehaji wî ji bona Kebîrî û Ezîmî bi helbijartina avegerandina wan ve yanjî bi mana wan ve date bihiştin. Wan bi vegerandina xwe ve ji bona Tebrîzê bi başî ve datin bidîtin. Li Meraxe de ew bi destên Hevalbendên serdarîyê ve hatin bikevtin û wan ew ligel Hevalên wan de datin bikuştin. Hilweşandina Komara Ezerbêcanê nav di rewaniya Axên Hevalbendên Tehranê de date bidan, ku ew bi eşkere ve dujminatîya xwe beramberî Serdarên Tebrîzê bidin biderxistin û ew dilsozîya xwe ji bona serdarîya nawendî de bidin bidazanîn. Rola wan nebestenê li ser pêşewazîya sipahê Iranî de hate bimayîn, lêbelêjî herec û merca wan bi wergirtina kêşê ve ji bona raw û rûtkirinê û bigirtina Merovên bi navûbangên Komarê ve, ji yên ku wan xwe ji kuştinê û

ragîşdatinê dabûn biparastin, dane bidestpêkirin û wan ew ji bona sipahê Iranî dane biberdestkirin. Jimarekê ji wan dane bixwestin, ku ew rê li ber Barzanîyan de di vekîşandina wan de ji bona Mehabadê bidin bigirtin; belam Barzanîyan ew pir bi başî ve dane bişikenandin û wan nema rêya ber lingên xwe ji xwe re didatin bidîtin.

Barzanî ferman ji bona hêzên xweyî girêdayî di berê Seqiz de bi amadebûna berengariyê ve ji bona her pêşkevteke Iranî û bi çavdêriya fermanan ve date biderxistin. Wî beşek ji van hêzan date binardin, da ku ew malên Barzanîyên rûniştî di herema navbera Mehabadê û Bukan de bidin biveguhestin û wan li Mehabadê de bidin bikimkirin. Ew di rêya xwe de tûşî pêrabûnên raw û rûkirinê û danîna bosan hatin bikirin. Belam ew hemû bi saxî ve ji bona cihê xwe hatin bigihaştin û ne jî malek li dû wan de hate bihiştin, herwehaji neji Rêbiran û Talankeran dikaribûn hîç azarekê bi wan ve bidin bigihandin. Bes û bi tenha ve di rûdana Miyandu Ab de Xortê Elî Hesen Şeyna hate bikuştin û Ehmed Ebdul-Letîf têde hate bibirîndarîkirin.

Dîtina dawî di navbera herdu Serokan de

Barzanî, piştî ku wî fermanên xwe ji bona hêzên xweyî girêdayî di berê şere de date biderxistin û piştî ku mal ji nava heremên bin tirsê de hatin biderkevtin, berê xwe ber bi Mehabadê ve date bivekirin û wî civînek ligel Qazî Mohamed û Berpirsiyarên din date bigirêdan, da ku ew li ser pêrabûna kar û barên divayî de beramber bi rûdanên ji nişkê ve bidin biaxivtin. Ji wî re hate bidiyarîkirin, ku hîç tu nêti li nik Berpirsiyarên Mehabadê de ji bona liberxwedana beramberî sipahê Iranî de nayête biderkevtin, ew dê xwe bidin biberdestkirin û herifandina Mehabadê bes û bi tenha ve bi pîrsa demê ve tête bigirêdan.

Kesek ji bil Barzanîya pêve ji bona liberxwedana paytext nehatin biderkevtin; jiber ku Serokên Eşîran ji bona helwesteke dujminatîyî eşkere beramberî bi Komarê ve xwe datin bivegihertin û wan Peyamber ji bona nik sipahê Iranî de bi derxistina dilsoziya xwe ve û çavdêriya xwe ve ji bona bi kevtina di nava wan de didatin binardin.

Barzanî ferman ji bona hêzên Barzanîyan di berê Seqiz û Serdeşt de bi vegerandina wan xweser ji bona Mehabadê date biderkirin û herwehaji ku hemû mal divên berê xwe ber bi herema Nexede û Şino ve bidin bivekirin.

Barzanî ji min re li ser dîtina xweyî dawî de ligel Qazî Mohamed de di êvara 16. 12. 1946 de wer date bigotin: "Ez ji bona nik Qazî hatim biçûyîn, da ku ez jê bidim bipirskirin, bê ka ew bi xwe ve çi dixwaze pê bête birabûn? Wî ji min re date bibersivkirin, ku ew dixwaze xwe bide bigorîkirin, da ku xwîna xelkên Mehabadê neyête birijandin û ew dê xwe ji bona sipahê Iranî bide biberdestkirin. Herwehaji wî ji min re date bigotin, ku wî Şandek ji bona nik General Hemayonî li Miyandu Ab dayîte binardin, da ku ew vê jêre bidin bigotin. Hêstir ji çavên wî dahatin biherikandin û wî ev gotinên hanê didatin bigotin: nebe ku tu piştî xwe bi hîç kesekî ve ji bil xelkên xwe ve bide bigirêdan; jiber ku wan hemûyên sondxwarî bi dilsozîya xwe ve bi bêbext ve hatin biderkevtin û ew bezandinê ligel hevdu de ji bona dazîna dilsozîya xwe ji bona sipahê Iranî didin bikirin. Ez te bi xwe jê vegirtinê û dûrkerinê ve ji Serokên Eşîran didim biamojgarîkirin, jiber ku ew dê zîyanê bi we ve bidin bigihandin, heger ku wan rêya xwe di we de datin bidîtin. Hêvîya min ji te ye, ku tu bi leztirîn dem ve xwe ji Mehabadê bide biderkirin, da ku tu xwe ji berengarîyan ligel sipahê Iranî de bide bidûrkerin.

Di pişt re wî ji min date bipirskirin, magelo tu çi dixwaze bide bikirin? Min jêre date bigotin, ez dixwazim Xelk, Xizm û hêzên xwe li herema Şîno û Mergever de bidin bikomkirin û em dê xwe ji berengarîyê ligel sipahê iranî de tanî hatina buharê bidin bivegirtin û emê ji bona bi pêrûniştîna serdarîya Iraqê ve bidin bikarkirin, da ku ew lêbuhurandineke giştî bi kêmanî vê ji Xizmên me bide biderxistin û heger ku hêvîya me nehate biserkevtin, dê emê ligel wan de berê xwe ber bi Yekîtiya Sovyêtê de bidin bivekirin. Em dê xwe ne ji bona sipahê Iranî û ne ji bona Iraqê bidin biberdestkirin.

Di pişt re min gelekî jê date bixwestin, ku ew ji Mehabadê bête biderkevtin û ligel me de bête birêkevtin û min jêre date bisundxwarin, ku ezê dê canê xwe û yên bi min re bi bêdudilî ve ji bona wî bidim bigorîkirin, tanî ku tu zîyan pêve neyêtin bikevtin; jiber ku ew bi dujmê neteweyekî ve tete biderkevtin. Min jêre date bigotin, ku ez jî ji aliyê xwe de ji te re didim biamojgarîkirin, ku tu bawerîya xwe bi sozên serdarîya Iranî ve nede bikirin. Dê bi gelekî ve li ser me de bi giranî ve bête birawestandin, heger ku yekemîn Serokê Komara Kurdistanê bi dilî ve di nava destên Dujmin de bête bikevtin.

Qazî ji cihê xwe bi girî ve hate birabûn û wî ez dame bimaçîkirin û wî date bigotin: Ez ji Xwedê didim bixwestin, ku ew te bide biserxistin û bide biparastin. Dibe, ku jîna min bi gorîya Neşînvanan ve bête bikirin

û belkî ew bi karekî ve bête biderkevtin, ku ew wan ji hin azarên bi wan ve kevtî ve bide biparastin û belkîjî ku ew hinekî ji tûjbûna sawê beramberî wan bide bisivikkirin, ya ku ew dê bi ser serên wan ve bête bibarandin. Wî ev didatin bigotin û wî ji bêrîka xwe ala Kurdistanê date biderxistin û ew ji bona min date bidan û pêrejî date bigotin: Eva durujmê Kurdistanê ye û ez wê ji bona ser bextê hustê te didim bisipartin; jiber ku tu di bîr û bawerîya min de ji baştirîn kes ve têtê biderkevtin, ji yê ku ew dikare wê bide biparastin⁸⁷.

Di zîneteke wetovî pir bi dilşikestî û şewatî ve min xatirê xwe jê date bixwestin û ez hatim biderkevtin û min berê xwe ber bi Nexede ve date bivekirin".

Ew di heftdehê meha befirbarê de bi Nexede ve hate bigihaştin. Wî li mala Hecî Îlxanî de ji radyo xebera kevtina sipahê iranî ji bona nava Mehabadê date bibihîstin.

Bi rastî ve ew ji bona nava Mehabadê nehatin bikevtin, piştî ku ew ji vekişandina Barzanîyan jê hatin bipiştrastkirin. Mehabad hate biherifandin û hêvîyên bi milyonan ve ji Kurdan di tevaya seranserî Kurdistanê de hatin bitemirandin. Perde bi ser Komara nuhhatî ve hate bipoşandin.

⁸⁷Ev ala ji bal Qazî de ji bona Barzanî sipartî ew ji bal Barzanî jî de ji bona Mesud hate bisipartin û ew niha li nik Mesud de têtê biparsatin.

Min û Felek ji Mesud di sala 1979 de li Rajan de date bixwestin, ku ew wê bi nişanî me ve bide bidan, da ku em ji xwe re wêneyekî ji ber wê de bidin bigirtin.

Wî sozê wê ji bona pêşandana me ji me re date bidan. Sal hatin û sal çûn. Min di dawîya axlêva sala 1998 careke din sozê Mesud bi bîra wî ve li Selah El-Dîn de date bixistin.

Wî date bigotin, belê ev bi bîra min ve têtê biderkevtin û ev sozê hanê min ji te û Felek re di sala 1979 de dabû bidan. Min weha didate bibawerîkirin, ku te jî ew ligel Felek de dayite bidîtin. Ew niha ne li ber destên min de têtê biderkevtin; jiber ku ew li cihekî din de hatîye bidanin. Di vegera te de careke din, ezê wê bi nişanî te ve bidim bidan û wî ji min re çîroka dîtina Felek ligel alê de date biveguhêstin: Gava ku çavên Feleke-Dîn Kakayê pê hate bikevtin, wî ew ala hanê date bimaçîkirin û wî ew li ser serê xwe de date bidanin û wî têra xwe jî date bigirîkirin.

Min di dilê xwe de ji xwe re didate bigotin: Ez didim bibawerîkirin, ku her Welatperwerekî Kurd vê ala perest ji xwe re bide bidîtin, dê ew nekêmi Feleke-Dîn ji xwe re têr bide bigirîkirin. Cuma

Derîyê Şeşem

Qonaxa Dijwar

Mal li herema Mehabadê, Bukan, Nexede, Şino û gundên dorhêla wê de hatin bikomkirin, di gava ku rûniştîyên ji wan li Mergevr de di cihên xwe de hatin bicivandin. Herwehajî Şêx Ehmed ji bona Şino hatibû bigihaştin; jibervêjî ve Barzanî berê xwe ber bi wê ve date bivekirin û ew ligel wî de hate bicivandin û di pişt re jî ji bona hemû Rêberan û Berpirsiyaran hate bibangkirin, da ku ew li ser zînetê de bidin bixwendekarîkirin û ew li ser pêrabûna divayê de bidin bibiryarîkirin. Belam pir bijartin li ber wan de nedihatîn bidîtin û di dawîya dawî de bîr û bawerîya wan li ser durustkirina xêzeke xurtî liberxwedanê de di navbera Nexede û Mehabadê de, yekeke din di dola Berandîz⁸⁸ de û ya din di dol Qasimlo⁸⁹ de hate birawstandin. Herwehajî wan date bibiryardan, ku ew xwe ji berengarîyê ligel sîphaê Iranî de bidin bivegirtin û ew çavdêrîyê tanî buharê bidin bikirin, tanî ku berf bête bihilandin. Wêçaxê ew dikarin ji bona Iraqê bêtin bivegerandin yanjî ew berê xwe ber bi Yekîtiya Sovyête ve bidin bivekirin.

Barzanî ji min re çîroka derbasbûnê û fena xwe date bigotin, ya ku ew ji bona xapandina Turkan pê hate birabûn. Wî date bigotin: "Em beramberî hêzên Turkan dihatin bilivandin û me didate bixwestin, ku ew bi me ve bidin bihestkirin û wan xwe ji bona şer ligel me de didatin bilikarxistin. Em ji livandinê hatin birawestandin û min ji hêzan date bixwestin, ku ew berên xwe ber bi semta rojhilat ve bidin bikirin û gava ku tarî bête bikevtin, em nema bi tu livandinê ve têtin birabûn. Di pişt re dê hêz carekedin xwe bi dizî ve ji bona wî cihê jêderkevtî bi xwe ve bêtin bivegerandin, yê ku ew jê hatibûn biderkevtin. Herwehajî min xwe ligel desteyekî biçûk de ji bona paş date bikişandin, da ku em ji bona nava serên Turkan bidin bixistin, ku me berê xwe dayite biveguhertin û em dixwazin ji alîyê rojhilatî wî cihê bêtin biderbaskirin. Hêzên Turkan li me de didatin biçavdêrîkirin û min date bidîtin, ku ew pir bi şerpeze ve dihatin biderkevtin û piştî du demjimaran ji livandina me wan tişt û miştên xwe datin bigirêdan û wan ew datin bibarkirin û ew bi lez û bez ve ji bona rêya rojhatî cih hatin bilivandin, ya ku wan tede ji xwe re didatin bi bawerîkirin, ku dê em tere bêtin biderbasbûn. Min date bizanîn, ku wan cihê xweyî pêşî datin bivalakirin û hîç kesek ji wan nema tede dihate bipeydakirin.

Di berbeyana roja 27. 5. 1947 de em di Zînîya Esinkera de hatin biderbasbûn û me Serbazên Turkan li dû xwe de dane bihiştin û wan bi me ve nedane bihestkirin, tanî ku em bi ser çiyayê Sipîrîz ve hatin bikevtin. Wêçaxê wan agir ber bi me ve datin biberdan; belam di nava me û wan de pir dûrbûn dihate bidîtin. Herwehajî balafirên Turkî jî hatin

bigihandin; belam em ji bona ser sînorê Iranê hatibûn bigihaştin; jîbervêjî ve ew careke din hatin bivegerandin".

Di danê êvara 27. 5. 1947 de hêz hemû bi carekê ve ji bona gundê Iranîyî pêşî li ser sînor de hatin bikevtin, yê ku ew bi navê gundê Cîrmî ve dihate binavkirin. Piştî şikenandina xurînê di beryana roja din de em ji bona herema Begzade di Tergever de hatin bilivandin û em ji bona nava gundên Embê, Derbend û Telwê hatin bikevtin û Axên wan ji bona Ormîyê jiber tirsê tolwergirtinê jiber helwesta wanî berê hatibûn bibazdan; belam agehdarî ji bona hêzan bi sert ve dihatin biderkevtin, ku ew bi darê zorê ve tu tiştî ji hîç tu kesî ji xwe re nedin bisitandin, hegerjî ew bi letekî nan jî ve bête biderkevtin û hîç bi tu rengî jî ve nabe, ku hîç kesek jî di bin her zînekê jî de bête bişermezarîkirin.

Barzanî û Hevalên xwe rojên 29. 30 û 31. 5. 1947 di herema Herkîyan de û bi teyabetî ve di nava zomên wan de datin bibuhurandin û ew ji bal wan de pir bi hêjabûn ve hatin bipêşewazîkirin. Serdarîya Iranî ji bona hemû Serokên Eşîrên heremê dabû bibangkirin, da ku ew ligel wan de li ser mebestên Barzanî û rêyên nabûdkirina wî de bide bişewirdarîkirin. Wê ji wan date bixwestin, ku yekek ji wan di xwe de bide bidîtin, da ku ew nameyekê ji serdarîya Iranî ji bona Mustefa Barzanî bide bigihandin. Reşîd Beg Serokê Eşîra Herkî bi pêrabûna vî karê hanê ve bi ser milên xwe ve date bihildan. Di nava namê de pirs li ser nêta pêrabûna Barzanî û hoyên derbasbûna wîna careke din ji bona nava xakê Iranê de dihate biderkevtin, herwehaji tede bi bivêkirina wîna ve bi derkevtina xweser ve ji nava xakê Iranê dihate biderekevtin. Barzanî date bibersivkirin, ku ew dê piştî çen rojên din bersivê bide binivîsandin. Wî tucarîjî ew bersiva hanê neda binivîsandin.

Pir caran Barzanî li ser dîtina xwe de ligel Mele Bedir û Mele Heyder ji gundê Xangê -Xaneqah- ji me re didate biaxivtin, bêkanî çiqasî wan û xelkên gundê wan ji bona me evîndarî û dildarîya xwe û herwehaji alîkarî ji me re dane bipêşkeşkirin. Herwehaji wî didate bidubarekirin, bê kanî çiqasî jî jê re cotê gorê pêşkeşki ji bal Mele Heyder de yarmetîya wî di rê de dayîte bikin.

Min tu tişt li ser Mele Heyder û nav û nîşanê wî de nedidate binasîn, tanî ku rojekê li hevdu de hate birasthatin, ku xelkên gundê Xangê ligel Melê Gundê xwe de di sala 1979 de ji bona nik min hatin bihatin. Min pir bi dilgermî ve pêşewazî li wan de date bikin. Merovekî ayîniyî heftê salî wan ji min re çîroka derbasbûna Barzanî di nava gundê xwe de date bigotin û herwehaji bê çawan wan lê datin bipêşewazîkirin

û çilo jî wî jêre cotekî gore date bidyarîkirin. Di wêçaxê de bi bîra min ve hate bikevtin, tiştê ku min ji Barzanî dabû bibihîstin û ji min re hate biderkevtin, ku evê peyvdar bi Mele Heyder bi xwe ve tete biderkevtin.

Di herema Herkîyan de Muhye-Dîn Baba Zade ji gundê Balnş de û Lavko -Dawid Yoxena- bi Barzanî ve hatin bigihaştin. Herdu jî ligel wî de ji bona Yekîtiya Sovyête hatin biçûyîn. Yê pêşî li wêderê de hate bimirin û yê duwem her û her bi dilsozî ve û ligel Barzanî de di vegeerê jî de ji Yekîtiya Sovyête hate bimayîn¹⁰⁴.

Di danê êvara 31. 5. 1947 de wan dev ji herema Herkîyan de dane biberdan û wan berê xwe ber bi herema Şikak ve di rêya Sêrû de datin bivedan û ew di du rojên pêşî de ji meha axlêvê de di nava gundên Şikak de hatin bimayîn. Divê li vêderê jî de bête bigotin, ku pir bi germî ve ji bal xelkên gundan de pêşewazî li wan de dihate bigirtin; ji yên ku ew li ser herdu kenarên rê de li derveyî her gundekî de dihatin birêzkirin û kela girî bi gorîya wan ve dihate bikevtin û histirên wan dihatin bibarandin. Hinekên ji wan ji wan re av didatin bianîn û hinên din ji wan re dew didatin bianîn û yên din ji wan re nan didatin bipêşkeşkirin.

Vê dildarîya bi rastî ve ji bal Zaroyên reha wan de ew bi dilsozîyê û ewlebûnê ve datin bihestkirin û ji bona wan demek date bihilanîn, da ku ew tede hinekî ji xwe re bêhna xwe bidin bivedan û xwe tede bidin bişuştin û biveşuştin, ji yên ku ew bi pir ve bi niyazmendî wê ve dihatin biderkevtin. Xalê Simko, yê ku ew bi navê Xalê Mîrzê ve dihate binavkirin, ji bona wan baştirîn agehdarî li ser rê û gundan de, li ser mêldarîya Serokên Eşîran û Keyên gundan de date bipêşkeşkirin. Wî ew bi van agehdarîyan ve dane bidewlemendkirin. Hemû Hevalên bi rêveçûnê ve pir bi sipasî ve û bi hesta hêjakirinê ve wan bi bîra xwe ve didin bixistin, ji yên ku Zaroyên Eşîra Şikak û bi taybetî ve ji bal Mîrza Elo de di gundê Dostan de pê hatin birabûn, yê ku ew ji xizmê Simko Axa tete biderkevtin.

¹⁰⁴Min di 13. 4. 1979 de Lavko li mala Barzanî de li Kerec de date binaskirin û ew bi Dergevanê wan bû. Nasîni di nava min û wî de hate bikirin û wî pir bi dûr û dirêjî ve li ser çûna Barzanî ji bona Yekîtiya Sovyête û mana wan li wêdrê de ji me re didate biaxivtîn. Mîna ku bi bîra min ve tete biderkevtin, ku ew bi Wergervanê Şahbenderîya Sovyêti ve di Ormiyê de dihate biderkevtin û wî pir bi başî ve bi zimanê Rusî ve didate bizanîn. Her kesekî bi nêzik mala Barzanî ve pir ji Lavko -Lawko- didatin bihezkin. Cuma

Di 3. 6. 1947 de ew ji gundê Dostan de hatin biderkevtin û ew di gundên Dîzê, Hacî Cefan, Goze Reş re hatin biderbasbûn. Li gundê Hacî Cefan de xortekî bi navê Mîrza Kemal ve baştirîn kar û bar ji wan re bi cudabûna helwesta Axê gund ve bi navê Qertas Axa ve date bipêşkeşkirin, yê ku ew ji gundê xwe ji bona Selmasê hatibû bibazdan.

Belam li Goze Reş de Merovekî bi navê Sertîp ve ji wan re hemû niyazmendiyên wan date bigirawkirin. Hêjî ji Zindiyên bi rêveçûnê ve vî xortê dilsoz bi bîrên xwe ve didin bixistin, yê ku wî xwe ji bona bêhnvedana wan didate bikarkirin û wî ji wan li ser niyazmendiyên wan didate bipirskirin. Li Şikakê de Bêcan Cundî, Teymur Musa, Kamil Zulumat, Omer Hisên û Ibrahîm Celal tev li bi rêveçûnê ve hatin bikirin. Di vê rûjê jî de Balafirên Iranî bi firînen xweyî dîdebanî ve hatin birabûn.

Di rê de hinekan ji Neferan çend tenekên dagirtî bi xurman ve ji dikana Dikançkî dabûn bisitandin. Ew li ser rê de hatibû birawestandin û didate bigirîkirin. Barzanî ew date bidîtin û jê li ser girîyê wî de date bipirskirin. Wî jê re li ser zordarîya pêve vekevtî de date biaxivtin. Barzanî bi lez ve Heştdeh dînar jêre dane bidan, yên ku ew bi gelekî ve ji buhayê xurmên jê sitendî bi bêtir ve dihatin biderkevtin. Herwehaji^{wî} bi lez ve Peyên xwe datin bikomkirin û wî soz bi sizakirinê sert ve li ser her yekî de date bidan, yê ku ew vi karê hanê carekê ji caran bide bikirin.

Piştî bêhnvedaneke kurt li Goze Reş de ew bi rêya xwe ve hatin bikevtin û ew ji bona gundê Hefleran hatin bigihandin. Pêşewazîya ku bi rêveçûnê ve ji bal xelkên vî gundê hanê jêre hate biwergirtin, rojekê ji rojan şopa wêna ji bîrwerîya wan nayête bihilanîn; jiber ku wan ew bi dildarîya xwe ve dane bipoşandin û wan hemû evîndarî û hezkirin ji wan re datin biderkirin, ku pesnên wan bi meznahî ve têtin bikirin û bi taybetî ve di helwesta Teymur Şeş Tilî û kurê wî Sediq de dihatin biderkevtin. Di nîvê şevê de ew ji bona gundê Beroş Xoran hatin bigihaştin.

Li gundê Beroş Xoran de Dadvanê heremê bi navê Xelîfe Sadiq xwest bi lez û bez ve Barzanî bide bidîtin, yê ku ew ji bal serdarîyê de hatibû binardin û di bêrîka wî jî de dafêke çêkirî dihate bidîtin, da ku ew Barzanî di nava wan de bide bixistin. Herwehaji ew bi nokerîya xwe ve ji bona rêstika Iarnî pir bi nav û bang ve dihate biderkevtin. Wî xwe bi dilsozvanê Kurd û Kurdistanê ve didate bidiyarkirin. Herwehaji wî didate biderxistin, ku ew pir bi dilşikestî ve têtê biderkevtin. Wî date bigotin, ku ew pir li ser çarenûsa Barzanî de bi dilsoz ve têtê biderkevtin,

jiber vêjî ve wî ev daxwaza Iranî dayite biwergirtin, ku ew ji bona nik wî bête bihatin û jêre bide bigotin, ku serdarîya Iranê hêzên mezin dane binardin û wê hemû kulekên bi derkevtinê ve li ser wî de dane bidan. Tevî li hemû karînen mezin de li nik Iranê de ew ji têgihîştineke Merovanî amadebûna xwe ji bona dermankirina Birîndaran û nardina xwarin û vexwarinê û yarmetîyê ji bona we dide biderxistin û herwehaji ew bi mana we ve li heremê de tête bipêrûniştin, bêyî ku hîç yekek ji we zîyan pêve bête bikevtin. Herwehaji wî date bigotin, ku ew dide bixwestin, ku Barzanî ji xwe re cihekî bide binîşankirin, da ku ew ji xwe re tête xorakê ligel desteyekî Bijîşkî de ji bona dermankirina Birîndaran bide biwergirtin.

Ligel Xelîfe Sadiq de Merovekî bi navê Elî ve dihate bidîtin, yê ku wî xwe ji bona yekekî ji Pêyên Barzanî date binêzîkkirin û jêre tevaya rastîyê date bigotin û wî jê date bixwestin, ku ew ji bona Barzanî bide bigotin, ku her gotineke ji devê Xelîfe tête biderkevtin û bi derew û fen ve tête biderkevtin. Hêza Iranî hêjî nehatîye bigihaştin û desthilatîyên Iranî dixwazin we bi her awayekî ve bidin bigîrkirin, tanî ku hêzên wê bi we ve bêtin bigihandin û cihên xwe bidin bigirtin. Hîç tu hêzên wê li ser rê de ji bil hin ji Çekdarên Ecem pêve di dola Qetur de nayêtin bidîtin. Bi baştir ve tête biderkevtin, ku hûn xwe nedin bigîrkirin. Barzanî ev xeberên hanê datin biwergirtin û wî bi bawerîya xwe ve bi Xelîfe ve date bidiyarkirin û wî ew date bisipaskirin û jê re helbijartina cih date bihiştin, yê ku ew wî bi baş ve dide bidîtin. Herwehaji wî date bigotin, ku dê ew bi amojgarîya wî ve bide bikirin û ew dê li gund de bête bimayîn û dê ew çavdêrîya vegerandina wî bide bikirin.

Xelîfe bi lez û pele ve ji bona bajarê Xoyê hate bivegerandin û wî didate bigûmankirin, ku tepa wî hate biserkevtin û wî bi vê ve Berpirsiyarên Iranî date bimizgînîkirin.

Di vê pêla hanê de Şah serdana heremên Ezerbêcanê didate bikirin û wî pir ji Sipahsalar didate bixwestin, ku divê hemû rê di rûwê Barzanî de bêtin bidadan û herwehaji divê bi her buhayekî ve ew bêtin binabûdkirin.

Piştî ku Xelîfe Sadiq ji ber çavan hate biawarkirin, Barazanî ji bona Berpirsiyarên hêzan date bibangkirin û ji wan date bixwestin, ku her yek ji wan niyazmendîyên xwe ji nan bi têrî ve divê bide bigirawkirin; jiber ku qonaxa tê dê bi dirêjî ve û bi dijwar ve bête biderkevtin, ya ku ew bi tirsan ve tête bipoşandin; jiber ku li ser wan de

derbasbûn di dola Qetur de di nava şeva 4/5. 6. 1947 de berî rojhilatê divabû bihata bikin. Barzanî li ser serûştîya erd de li wêderê de ne bi bê agehdarî ve dihate biderkevtin. Li nik wî de agehdarîyên têrkirî li ser zînetê rê de di navbera Beroş Xoran û deqên cihên hêzên Iranî de dihatin bidîtin. Belam beramberî dola Qetur de rêya anînûbirinê nedihate biderkevtin û heger ku hêzeke Iranî di nava dolê de bête bidîtin, divabû ligel de têkwerhatin bihata bikin û ew bi darê zorê ve bihata biderkin. Hîç gûman têde nedihate bidîtin, ku dê biderkirina wêna bi hêsanî ve bihata bidîtin, heger ku ji nişkêve li ser de bihata bihêrîşkin: jibervêjî ve divabû ku ew xwe ji cihekî li ser rê de di navbera Beroş Xoran û dolê de bidin bivegirtin. Vê li ser wan de bi kevtina nava xakê Turkî ve û çûn di nava wêna de di çend demjimaran de û careke din ji nû ve vegerandin ji bona nava xakê Iranê de didate bineçarkirin.

Ew bi xweşî ve di nava dola Qetur re hatin biderbasbûn; jiber ku Çekdarên Pasevanên wêna berî bi çend rojan ve ji bona gundekî dûr ji tîrsa berengarîyê ligel Barzanîyan de dabûn bibazdan.

Bi rastî ve derbasbûn di dola Qetur de bi mîna serkevîneke sipahîyê çurusandî ve dihate biderkevtin; ji ber ku ew bi tîstirîn bergir ve di rê de dihate biderkevtin. Heger ku berengarîyek di dolê de bihata birûdan, dê Barzanîyan zîyanên pir mezin ji xwe re bidana bixwarin û belkî berê rûdanan jî bihata biveguhertin û dê ew wetov bihatana bikin, ne mîna ku ji wan re hatibû bibiryarîkin.

Di berbeyana pêncê axlêvê de ew ji bona nava herema Eşîra Erus hatin bikevtin, ya ku ew bi baştirîn erkê xweyî milî ve pê hatin birabûn. Wan ji bona wan her alîkarîyeke bi karîn ve dane bipêşkeşkin. Ew bi sipasî ve hestyara xelkên gundên Geletê, Todan û Neda didin bibîrxistin û bi taybetî ve ew hestyara Koço Axa Elî Beg, Balî Beg û Behrî Beg ji gundê Neda didin bibîrxistin.

Di şeşê axlêvê de ew ji gundê Neda hatin biderkevtin û ew bi gundên Belesor û Belerêşê ve hatin bigihaştin. Ew careke din jî pir bi germî ve hatin bipêşewazîkin û nemaze ew ji bal Koxê herdu gundan Mîrza Mele Memeî de pir bi germî ve hatin bipêşewazîkin. Piştî bêhnvedaneke kurt û nanxwarinê careke din ew bi rêya xwe hatin bikevtin, tanî ku ew bi havîngeha Hacî Begê xweşik ve hatin bigihaştin, ya ku ew bi nala perçeyekî ji buhuştê ve tête biderkevtin; mîna ku yekekî ji Serdanên wêna dayite bigotin. Di danê êvarê de ew ji bona gundê Melhemê hatin bigihaştin, yê ku ew di nava herema Eşîra Milî de tête bikevtin. Wan têde şeva xwe dane bibuhurandin.

Di 7. 6. 1947 de ew ji bona gundê Embarê hatin bigihaştin û wan têde Merovekî pir bi dilsoz ve û pir bi karnas ve li ser heremê de tanî bi sînorê Yekîtiya Sovyêtê ve datin bidîtin, yê ku ew bi navê Mîrza Ebdî dihate binavkirin. Tevî ku ew bi heftê salî ve di temenê xwe jî de dihate biderkevtin, ew pir bi hêt û pêt ve dihate bidîtin û jîndarî û jêhatîbûn di nava çav û ruwê wî de dihatin bibarandin. Barzanî jê li ser baştirîn rê de ji bona çemê Arasê date bipirskirin. Mîrza jêre rêya Mako -Hason date bipêşneyarkirin; jiber ku her rêyeke din dê bi dijwarî ve têre derbasbûn bête biderkevtin, nemaze gava ku ew ji bona Turkî bêtin bikevtin; jiber ku rê li wêderê de bi sext û dirêj ve û herwehaji pir bi tirsê raxistî ve tête biderkevtin. Barzanî bîr û bawerîya wî bi başî ve date bidîtin û wî date bibiryarîkirin, ku ew wê amojgarîya wîna ji xwe re bide biwergirtin. Herwehaji jiber ku qonaxa hatî pir bi giring ve û bi tirs ve dihate biderkevtin, divabû ku jêre pilaneke pir bi hûr û wird ve bihata bidanîn.

Di 8. 6. 1947 de ew ji Embarê hatin biderkevtin û ew bi herdu gundên Kelîs Gend û Ax Daş ve li nêzîka Mako de hatin bigihaştin, yên ku ew bi carekê ve hatibûn bivalakirin; jiber ku xelkên wan ji bona Mako dabûn bibazdan û wan malên xwe ligel kel û pelên têde ji tiştên malê û ji xwarin û vexwarinê li dû xwe de dabûn bihiştin.

Qonaxa Giring

Hêzên Iranîyî gewre bi piştgirtina tank û topxanan ve ji bona Mako hatin bigihaştin û ew li ser tevaya xaçirêk û rêyan de hatin bibelavkirin û wan ew bi xurtî ve di nava lepên xwe de dane bigirtin. Hiç gûman têde nedihate bidîtin, ku çarenûsa Barzanîyan li ser encamên şerê dahatî de dihate birawestandin; jibervêjî ve li ser yekekî ji wan de divabû ku ew karekî xurtî bi taybetî ve bide bikin, da ku ew di wî şerê hanêyê hatî de bête biserkevtin.

Barzanî hêzên xwe ji bona du beşan date biparvekirin û piştî dîdebanîya li ser heremê de û dozandina cihên sipahê Iranî de biryar bi destpêkirina hêrişê man û nemanê ve hate biwergirtin. Barzanî bi xwe ve fermanarîya hêza hêrişê ji Kelîs Gend bi yarmetîya Mohamed Emîn Mirxan, Mamend Mesîh û Misto Cadir Mîirozî ve didate bidestpêkirin. Esed Xweşevî fermanarîya hêza hêrişê ji Ax Daş bi alîkarîya Salih Kaniye Lencî û Seid Welî Beg ve didate bidestpêkirin. Hêrişê li ser hêzên Iranî de di çiyayê Sosoz û deşta Mako de di 9. 6. 1947 de date bi-

destpêkirin û ew tanî 11. 6. 1947 de bi bê rawestandî tevî li hemû gerbûna şer û dirbûna wî de hate bidirêjkirin. Belam hate bidiyarvekevtin, ku hîç tiştekî nekirî nikare xwe li ber vîna xurt û bawermendîya kûr de bide biragirtin.

Barzanîyan di vî şerê hanê de deha baştirîn rûpelên pehlewaniyê datin bitomarkirin û ew bi ser wan hêzan ve hatin biserkevtin, ji yên ku ew bi jimar û çekên xwe ve bi ser wan ve bi deha bêtir ve dihatin biderkevtin; jiber ku Fermandarîya sipahê Iranî hemû karinên xwe ji bona bi nemankirina Barzanî û Hevalên wî ve û nehiştina gihandina wan ji bona Yekîtiya Sovyêtê dabû bidagirtin. Wê ew cihê hanê ji xwe re dabû bihelbijartin; jiber ku ew bi carekê ve bi lihevhatî ve ji bona bi karanîna balafiran û tankan ve di hate biderkevtin û wan didatin bibawerîkirin, ku dê ew di dawîya dawî de bi ser Barzanî ve bêtin bikevtin û ew tucarî nema ji nava lepên wan vê carê dikare xwe bide birizgarîkirin.

Barzanîyan dikarîbûn hêzên Iranî bidin bihejandin û wan ji ser rêya xwe bidin biderkirin. Wan pira Mako dane bigirtin û wan dikarîbûn di şeva 11/12. 6. de di ser çemê Zengî de bêtin biderbasbûn. Ew di berbeyana roja 12. 6. 1947 de bi gundê Hason ve hatin bigihaştin. Wer di hate biderkevtin, ku tirs li ser wan de hatibû bidûrkevtin; heger ku ev jî werjî ji bona çend rojan jî hate biderkevtin.

Zîyanên bi hêzên Iranî ve di vî şerê hanê de bi kuştin û birîndarîkirina bi sedan ve hatin bikevtin û 271 Neferên wan bi dîl ve hatin bigirtin û ew di piştî bidawîhatina şer de hatin biberdan. Herwehaji jimarek ji tankan hatin bitêkûpêkçûn, Balafîrek jî hate bixistin û betariyeke topxanê jî hate bitarumarkirin. Bi sedan ji tivingan ve ligel pêncî hêstirên barkirî de bi fişek û xorakê ve bi destên wan ve hatin bikevtin û wan zor ji van hêstiran sûd ji xwe re ji bona veguhestina Birîndaran dane biwergirtin. Ji Barzanîyan çar kes hatin bigorîkirin û ew jî ev bûn: Mele Lêrî, Hecî Gowêzî, Mohamed Mele Mohamed Mêrgesorî û Salih Lêrî. Herwehaji çardeh kes ji wan hatin bibirîndarîkirin.

Gundê Hason li jorî Mako tête bikevtin û ew bi Eşîra Celalîyî Kurdî ve tête bibestandî, ku tête Omer Axayê Celalî Serokê Eşîrê li Barzanî de date bipêşewazîkirin û wî jêre sozê pêşkeşkirina yarmetiyê date bidan; belam ew bi cîanîna sozê xwe ve nehate bipêrabûn; lêbelê wî didate binêtkirin, ku ew ji xwe re şopeke bêbextiyê bide bitomarkirin, da ku ew sipahê Iranî bi ser wan ve ji nişkê ve bide biraserkirin. Ev Bêbextê hanê wetov date bikirin, ku wî ji bona Hevalbendên xwe bi dakevtinê ve

ji zomên Konan date bifermankirin, da ku ew ne nan û nejî xwarinê ji bona Barzanîyan nedin bipêşkeskirin.

Em dikarin bidin bigotin, ku ev Eşîra hanê û Serokê wê bi tenha xwe ve dihatin biderkevtin, ji yên ku wan bêbextîya erkê milî di nava hemû Eşîrên din de dane bikirin, gava ku Barzanî di nava wan re di rêya xwe de ji bona Yekîtiya Sovyêtê hatin biderbasbûn.

Derbasbûna di ser çemê Arasê de¹

Di 16. 6. 1947 de Mîrhac berê xwe ber bi bingeha Polîsî Seraculoyî¹⁰⁵ Sovyêtî date bivekirin, da ku ew desthilatîyên Sovyêtî bi gihandina Barzanî û Hevalên wîna ve ji bona gundê Sektelî bide biagehdarîkirin û ku ew daxwaza destûra bi derbasbûnê ve di ser çemê Arasê de û benabûnê didin bixwestin. Piştî hatina bi pêrûniştinê ve Şêx Sulêman di 17. 6. 1947 de ligel komekê de hate bilivandin û di pişt re Barzanî ligel hêzekê din de di 18. 6. 1947 de hate biderbasbûn. Navê Aras li Kurdistanê de pir hate binavûbangkirin û pir Zarok bi vî navê hanê ve hatin binavkirin.

Xweşxwevan û Feylesufê Kurdî mayîn Pîre Mêrd xweşxwaneke bi nav û bang ve bi vê hatina hanê ve bi navê Heşret heware date bipêkanîn¹⁰⁶.

¹⁰⁵Ev bi bingehêke Polîsê Sovyêtî ve tete biderkevtin, yê ku ew di nava xakê Komara Erministana Sovyêtê de tete bikevtin.

¹⁰⁶Xweşxwewana Eşret Haware
Eşret haware, eşret haware
kewtome Aras aw bê buware
rêm nîye minîş şuwên ewan kewim
bîrim hengawek binîm ewkewim
lêreş wa kewtum be dem derwe
le êşî dûrî û ahî ser dewe
Doktor dewayî tom nawê lêm gerê
belkem be ahim dewran wergerê
yawa wergerê îlim wergerê
ya zirmeyî topî zere berkewê
ew sake duayî min wa girîrabê
le xaneyî xaka awatim nabê
inca telqînim biden be kurdî
bilên awatet hate cî û mirdî

Herwehaji dam û destgehên nûçan û îzgehên cîhanî jî xebera gihandina Barzanî û Hevalên wî bi Yekîtiya Sovyêtê ve dane biveguhestin û herwehaji ji wan jî îzgeha London dihate biderkevtin, ya ku wê date bigotin: London di 17, 6. 1947 de berengarîyên mezin di nava hêzên Iranîyî bi rêxistî ve û Kurdan de di nêzîka sînorên Rusî de hatin bikevtin û Rêberê Kurd Mele Mustefa Barzanî ligel Peyên xwe de bi jimara 2000 Şervanan ve dikarîbû ji bona nava sînorê Rusî bête bibihurandin.

London di 19. 6. 1947 de: Çar Efser li Begdadê de hatin bidarvekirin, di gava ku Mele Mustefa Barzanî bi pir sersurayî ve ji tepê hate birizgarîkirin û ew ji bona Rusya bi saxî ve hate bigihandin.

Derîyê Duwanzdeh

Li Yekîtiya Sovyête de

Piştî derbasbûna çemê Aras û kevtina nava xakê Sovyête Barzanî ji bona cihekî di nava bajarê Nexcuwanê di Komara Ermenîya Sovyatî de hate biveguhestin û yê mayî ew ji bona nava serbazxaneyê ser vekirî li çolê de hatin bidanîn, ew bi tîlên dirîkirî hatin bidorlêgirtin û bi jimareke Serbazan ve hatin bipasevanîkirin. Ew nikarîbûn ji sînorên serbazxanê bihatana biderkevtin û ji bona wan rojê 500 g nan û zerikek şorbe hatibûn bitirxankirin. Reftara ligel wan de bi carekê ve nala reftara ligel Dîlên cengê de dihate biderkevtin. Herwehajî pîrskirineke hûr û wird ligel her yekî ji wan de bi tenha xwe ve hate bikirin. Birîndar jî ji bona dermankirinê li maristanê de hatin biveguhestin.

Çarenûsa Barzanî ji bona tevaya Barzanîyên girtî di serbazxanê de tanî sisêyî tîrmehê hatibû biveşartin, tanî ku Efserekî Rusî bi otombêlekê ve hate bihatin û wî Mîrhac ligel xwe de date bibirin û danê êvarê wî careke din ew date bianîn. Ev kirina hanê sê rojên li dûhevdû de hate bidubarekirin. Di herdu rojên pêşî de Mîrhac tu tişt ji tu kesî re neda bigotin, belam di nava rûçikên wî de nîşanên dilşikestinê dihatin bidiyarkirin. Lêbelê rûçikên wî hatin bixweşkirin, gava ku ew di roja sêyem de hate bivegerandin. Wî bi rûgeşî ve ji bona Merovan date bigotin, ku ew di hersê caran de ji serbazxanê ji bona cihê rûniştina Barzanî dihate biveguhestin, yê ku ew pir bi nexweş ve dihate biderkevtin. Herwehajî wî ew di roja sêyem de date bidîtin, ku ew ber bi saxbûnê ve tete biçûyîn û ew dê bi nêzîk ve serdana sebazxanê bide bikirin.

Barzanî di 12. 7. 1947 de ligel jimarekê ji Berpirsiyarên Sovyêti bi serdana serbazxanê ve hate birabûn û wan ji xwe re li zînet

perîşanîya serbazxanê dane bitemaşekirin. Berpirsiyaran ferman ji bona hılanîna têlên dirîkirî xweser dane biderxistin û herwehajî wan ferman ji bona başkirina malê xwarinê û peydakirina pêwistîyên bêhnvedanê ji bona Rûniştvanên tede dane biderxistin.

Veguhestina ji bona Ezerbêcanê¹

Barzanî nêzîka 40 rojî di nava serbazxanê de hatin bimayîn û di pişt re ew ji bona Komara Ezerbêcana Sovyêtê hatin biveguhestin û ew li ser heremên Agdam, Laçîn û Abolax hatin bibelavkirin. Belam Barzanî ligel Şêx Sulêman, Elî Sedîq, Seid Mele Ebdul-Lah û Ziyab Derî de ji bona bajarê Şoş dane biveguhestin. Tevan bi hev re derd û kulên vê cihêbûnê ji xwe re dane bixwarin û ev cihêbûna hanê bigir tanî dawîya salê hate bidirêjkirin.

Di 29. 9. 1947 de Barzanî ji bona Bako hate biveguhestin û Berpirsiyarên Ezerbêcanî ligel wî de gelek dîtin dane bikirin. Wer tete biderkevtin, ku pirsra penabûnê hêjî li Mosko de li jêr xwendekarîyê de dihate biderkevtin.

Barzanî gelek name û bibîrxistin ji bona Berpirsiyaran li Mosko de û di nava wan jî de ji bona Stalin û Bagirof date bipêşkeşkirin. -Ji xwe re li belgeyê jimar 2 de bide bitemaşekirin-. Wî di wan de li ser hoyên hatina xwe û Hevalên xwe de ji bona Yekîtîya Sovyêtê de date biaxivtin û herwehajî wî rûnkirin û daxwazên xwe jî dane biderxistin.

Dîtina Barzanî û Bagerof

Bagerof di cara pêşî de di dawîya meha çirya duwemê sala 1947 de ji bona Barzanî de date bipêşewazîkirin. Di pişt re ew dîtînan hanê pir caran hatin bidubarekirin. Barzanî di piştî pêşîwazîkirina xwe de ji bal Bagerof de li ser giftûgoyên dîtina xwe wetov di salnameya xwe de dayite bitomarkirin: "Gava ku Bagerof ez datim bipêşewazîkirim, min jê re date bigotin, ku em bi mîletekî sitembarî bê sînor ve têtin biderkevtin û hêvîya me di mîletên Sovyêtî de tete bidîtin. Em bi niyazmendî zanistîyê û hunerên sipahî ve têtin biderkevtin. Em ji we didin bihêvîkirin, ku hûn alîkarîya me bidin bigirtin û piştî pirsra mîletê Kurdistanê bi-

din bigirtin. Ez vê hêvîya hanê bi navê milletê Kurd ve ji bona we didim biveguhestin û ez ji we didim bihêvîkirin, ku hûn van hêvîya ji bona Rêberîya Bala li Mosko de bidin biveguhestin".

Di cara pêşî de Barzanîyan li ser bicîbûna Barzanî de li Bako de datin bipêzanîn, gava ku desthilatîyan Mîrhac Ehmed û Sulêman Beg datin bilikarxistin, da ku ew serdana Barzanî di meha dehan de bidin bikin.

Wer tete biderkevtin, ku bi pêrûniştina Mosko ji bona serdana Bako di meha çirya duwem de pê hatibû biagehdarîkirin û herwehaji di wê agehdarîbûnê jî de divabûna guhpêdanê bi Barzanîyan ve û reftarkirin ligel wan de nala Xebatvan dihate biderkevtin. Herwehaji tede divabûna peydakirina baştirîn kêsên fêrkirinên sipahî û xwendinê ji bona wan û komkirina wan di yek cihê de ji bona wan mebestan dihate bidîtin. Serdarîya Ezerbêcanê ji bona bicîanîna agehdariyên Mosko date bidestpêkirin û wê ji Barzanî nardina Şêx Sulêman ligel Esedof de, yekek ji Berpirsiyarê Ezerbêcanê dihate biderkevtin, di 2. 12. 1947 de date bixwestin, da ku ew li zîmeta Barzanîyan de bidin bitemaşekirin û ji wan re bidin bigotin, ku ew xwe ji bona veguhestina Bako bidin biamadekirin.

Hemû Barzanî li Bako de

Di 9. 12. 1947 de Barzanî bi serdana serbazxana tîrxankirî ve ji bona Barzanîyan li Bako de hate bipêrabûn. Di 10. 12. 1947 de hemû Barzanî ji bona Bako hatin biveguhestin û ew di serbazxanê de hatin bidakevtin, ya ku ew pir bi rêk û pêk ve û bi tiştên nav malê ve bi carekê ve bi raxistî ve dihate biderkevtin.

Di 22. 12. 1947 de Barzanî ligel General Atakişyof serdana serbazxanê date bikin û dilê wî li ser zîmeta Hevalên wî de hate bicîkevtin û piştî bêhnvedana çend rojan bi pêkanîna hengekê ve ji wan hate bidestpêkirin û Es-ed Xwşevî bi Femandarê hengê ve hate binîşankirin û Seid Welî Beg, Mohamed Mîrxan, Mamend Mesîh û Misto Mîrozî bi Femandarên liqan ve hatin binîşankirin. Herwehaji serdarîya Ezerbêcanê Serheng Kazimof, yê ku ew li Mehabadê bû û yê ku ew bi navê kake Axa ve dihate binavkirin, bi serpereştê fêrkirina sipahî ve date binîşankirin û van Efserên hanê jî alîkarîya wî didatin bikin: Abdul-Lah Kolyof, Kerîmof, Mermanof, Zînlof, Mohamedof û Şerînof.

Cil û bergên serbazî û çek ji bona ser Barzanîyan hatin bibelavkirin û dest bi fêrkirina wanî sipahîyî ve li ser bingehê nuh ve hate bikirin. Rojê bi endazîya 8 demjimaran ve ji bona fêrkirinên sipahî û herwehaji ligel jî de rojê 4 demjimara ji bona fêrkirina xwendin û nivîsandinê bi Kurdî ve hatibûn bitirxankirin. Ji nava Barzanîyan bi xwe ve Mamoste ji wan re ji bona fêrkirina xwendin û nivîsandina Kurdî hatibûn binîşankirin. Wan karnasîyeke sipahî ligel karnasîya wanî fireh di cenga Pêşmergayetîyê de ji xwe re dane biwergirtin. Herwehaji ew fêrî xwendin û nivîsandina Kurdî jî hatin bikirin. Kar û bar pir bi başî ve dihatin birêveçûn.

Vê guhpêda Sovyêtî ji bona Barzanîyan û vekirina vî berê hanê li ber wan de jêre kûrbûneke pir mezin dihate biderkevtin; jiber ku ew di nava tara bernameyeke sitratîcîyî giştî de ji bona piştgirtina tevgera rizgarîya Kurdî de dihate biderkevtin. Sovyêtê ew Merovên hanê ji bona rojeke lihevhatî didate biamadekirin. Ligel tevaya van pêrabûnên hanê jî de gavên siyasîyî pir giring jî dihatin biavêtin.

Gava Siyasî: Pêkanîna Rêberîyeke Siyasî

Konfirensê giştî di 19. 1. 1948 de hate bigirêdan û têde hemû Kurdên ji Kurdistana Iraqê û ji Kurdistana Iranê hatin biamadebûn. Barzanî peyvedarîyeke mêjûyî giring di vê kombûna hanê mezin de date bigotin û wî têde bernama karê hatî date binîşankirin. -Ev peyvdarîya hanê hêjî tête bidîtin û ew dê di nava belgan de bête bibelavkirin-.

Di pişt re Rêberîya Siyasî ji bona tevgera azadîxwazîya Kurd ji Xebatvanên Kurdistana Iran û Iraqê hatin bihelbijartin. Ew jî bi vî rengî bûn.

Ji Kurdistana Iraqê ev bûn:

1. Mustefa Barzanî bi Serok ve
2. Şêx Sulêman
3. Elî Mohamed Sidîq
4. Mîrhac Ehmed Akravî
5. Sulêman Beg Dergele

6. Ebdul-Rehman El-Muftî Amîdî
7. Mohamed Necîb Berwarî

Ji Kurdistana Iranê Ev bûn:

8. Seyid Ezîz Seyid Taha Ebdul-Lah
9. Rehîm Qazî
10. Mustefa Selmas
11. Hesên Husamî
12. Rehman Germiyanî
13. Seyid Kerîm
14. Kak Murad

Herwehajî hate bibiryardan, ku demek di îzgeha Bako de bête bitirxan kirin, da ku tede bi zimanê Kurdî ve bête bidawîşandin û herwehajî bi derkirina rojnameyekê ve bi zimanê Kurdî ve hate bibiryarîkirin.

Vê destpêkirina hanê dergehê hêvîya bi ser çûna xebata kurdîyî milî ve date bivekirin, ya ku ew bi lêdaneke tûj ve bi herifandina Komara Mehabadê ve pê hate bikevtin û herwehajî wê vînen Penahindan date bixurtkirin û derd û kulên wergirtî ji bi rêveçûna xwe ve bi bê kar ve nehatin biberbadkirin û herwehajî dê Yekîtiya Sovyêtê hemîşe bi dilsoz ve li ser bîr û bawerîyên xwe de li ser piştgirtina milletên sitembarî mafexwarî de bête bimayîn.

Vê pêrabûna hanê canekî nuh di nava Penahindan de date bivejandin û ew bi xwîngermî ve ji bona bicîanîna erkê li ser xwe de bi bê westandin û destsarbûnê ve hatin birabûn. Di her bêhnekê de wan didate bipêşbînîkirin, ku dê ew ji bona amadebûna xwe bêtin bibangkirin, da ku ew ji bona welêt bêtin bivegerandin û ew wî bidin birizgarîkirin.

Herwehajî van gavên avêtî tanî radeyekî mezin tîrsa serdarîya Iranê date biderxistin; jiber ku wetov tete biderkevtin, ku hinek ji agehdarîyan ji bona wê hatibûn bigihandin; jibervêjî ve wê tûrebûneke xurt ji bona serdarîya Sovyêtî li ser wergirtina Barzanî û Hevalên wîna de mîna Penahindan di nava xakê Sovyêtê de date bipêşkeşkirin. Herwehajî wê ji Sovyêtê date bixwestin, ku ew wan ji bona wê bide biberdestkirin; belam Sovyêtê ev date binayînkirin.

Ev agehdarîyên hanê di nameya Serokê Wizareta Iranî de têtin biderkevtin, ya ku ew ji bona Balyozê Sovyêti hatîye binardin û ew di 14 behmen 1326 de li gora 13. 11. 1948 de hatîye bimêjûkirin. Herwehaji ew di Arşivê Wizareta Derveyî Iranî de li jêr jimara belgeyê 12-3 de têtê bihilanîn. Ji xwe re li belgeyê jimara 3 de di vê nivîsta hanê de bide bite-maşekirin.

Belam Bagerof li ser reweşta pozbilindîya xweyî regezî de hate bimaşîn û wî didate bixwestin, ku ew zalbûna xwe li ser Rêberîya Siyasîyî tevgera Kurd de bide bizalkirin, di rêya ku ew wê bi Rêberîya Ezerbêcanê ve bide bibestandin, ya ku ew jî bi nala Rêberîya Kurdî ve hatibû bipêkhatin. Wî ew şeweyên hanê bi xwe ve didatin bikaranîn, ji yê ku wî ew ligel Qazî Mohamed û Şanda wî û Komara Kurdî de di pêwendîyên wan de ligel Komara Ezerbêcanîya Iranî de didate bikaranîn. Barzanî serê xwe ji bona givaştinên Bagerof nedate bite-wandin û ew li ber vîna wî de bi xurtî ve û bi pêgîrî ve hate birawestandin, ku vênajî date bihiştin, ku Bagerof li ser wî de bête bibîntengkirin; jiber ku wî ev helwesta Baraznî bi liberrabûna deshilatîya xwe û kêra xwe ve didate bidanîn.

Bagerof li nik Stalin de bi cihekî xweyî taybetî ve di rêya Hogirê xwe û Wezîrê Navxweyî Laferentî Bêrya de dihate bidîtin; jiber ku Bagerov bi Destyarê Bêrya ve û bi yekekî pir jê bi nêzik ve dihate biderkevtin.

Di dîtinekê de Bagerof gev di Barzanî de datin bifirandin û wî jê date bixwestin, ku divê ew bi pişneyarên wî ve bête birûniştin, heger na, dê ew berpîrsiyarîya encamên sizabûnê ji xwe re bide bihilgirtin. Barzanî lê date bivegerandin: "Heval Bagerof! Em ne ji bona vê derê hatine bihatin, da ku tu li me de bide gevkirin û heger ku em ji gevan bihatana bitirsandin; dê te em li vir de nedidatin bidîtin. Em ji bona Yekîtiya Sovyêti hatine bihatin, da ku em ji bona Miletên wê dengê miletekî sitembar bidin bigihandin, yê ku jê re miletê Kurdistanê têtê bigotin. Jiber ku em dixwazin avrûwa xwe û rûmeta miletê xwe bidin biparastin, ez ji te didim bihêvîkirin, ku tu bête biliberkevtin, ku em serên xwe li ber firandina gevan de nadin bitewandin û em tucarijî pê nayêtin birûniştin, ku em xwe bi dû miletekî ve bidin bixistin, yê ku ew ji miletê me bi xurttir û baştir ve nayête biderkevtin, hegerjî ku ev miletê hanê jî bi dost û bira jî ve mîna miletê Ezerî bête biderkevtin. Em bi miletekî serbixwe ve têtin biderkevtin û em bi perçeyekî ji Ezerbêcanê

nayêtin biderkevtin û em tucarî jî bi pêlêkirina kesîtiya milletê Kurd ve nayêtin bipêrûniştin".

Divê li vêderê de em bidin bigotin, ku mexabin hinek Merovên nîşankirî ji Kurdistana Iranê dihatin bidîtin, ji yên ku ew bi Endam ve di Rêberîya Siyasîyê helbijartî de bi roleke şermezar ve pê dihatin birabûn û wan dev ji bîr û baweriyên xwe û rola xweyê welatperwerê dabûn biberdan û ew bi nala bûkekê ve di nava destên Bagerof û dam û destgehê wîyê nehênî ve dihatin biderkevtin. Bagerof bi wan ve mîna ku dixwest, wî bi wan ve didate biyarîkirin û wî bi wan ve ji bona têkûpêkçûnê, berberîyê û gelacîyê didate bipalpêdan.

Di vê dîtina di navbera Barzanî û Bagerov de û di giftûgotinên tûjî tede bi gotî ve bi despêka destan û derdê nuhî Barzanî û Hevalên wî ve tete biderkevtin û herwehaji ew bi dawîbûna Rêberîya Siyasî ve tete biderkevtin, ya ku ew jihevdu hate bikevtin, piştî ku wan Kêşperestan dilsozîya xweyê bi carekê ve beramberî Ezerbêcanîyan datin bidazanîn, sertewandina xweyê bi koranî ve ji bona Bagerof datin biderxistin û vekişandina xwe ji Rêberîya Siyasî datin bikin.

Derîyî Sêzdeh

Veguhestina ji bona Komara Ozbêkistan -Derdekî nuh-

Bagerof li ser şerkirina Barzanî û danîna kospan li pêşîya wî de nehate birawestandin, tanî ku bedbûna reftarên wî nema dikarîbûn bihatana bihilgirtin; jibervêjî ve Barzanî bi daxwazê ve ji bona desthilatîyên Sovyêti bi barkirina wîna û tevaya Barzanîyan ve ji bona Komareke din hate bineçarîkin, da ku ew xwe ji şerê Bagerof bide birizgarîkin. Jibervêjî ve hate bibiryardan, ku ew di 29. 8. 1948 de ji bona Ozbêkistanê bêtin biveguhestin û ew li serbazxana Çerçok de li nêzîka Taşqend de hatin bidakevtin.

Fêrkirên sipahî mîna ku ji wan re hatibûn bipilankirin, wehajî li ser wan jî de di serbazxana Çerçok jî de dihatin biçûyîn. Xaniyek li nêzîka serbazxanê de ji bona rûniştîna Barzanî hate bitirxankirin û herwehajî jêre Mamosteyek ji bona hînkirina zimanê Rusî hate biterxankirin. Barzanî pir bi başî ve bi fêrî wê ve hate bikirin û wî ew pir bi başî ve didate biaxivtin û binivîsandin. Hîc rûdaneke wetov nehate bikirin, ku ew zînetê bide bibedkirin.

Barzanî di 24. 9. 1948 Binazof Sikretêrê Partîya Komonistî Ozbêkî û Yusivof Serokê Wizareta Komara Ozbêkistanê datin bidîn û wan jêre soz bi piştgirtinê û guhpêdanê ve dane bidan. Belam Bagerof di şerkirina Barzanî de di Komareke din jî de nehate birawestandin; jiber ku Bagerov bi nêzîk ve ji Stalin û bi yarîderên ligel Bêrya û Çeteyên wî de dihate biderkevtin û gitina wîna dihate biçîhatin, tanî ku wî di dawîya dawî de dikarîbû di serê Mosko de bide xistin, bê ka ew çî tepê ji bona Barzanî û Hevalên wî dixwaze bide bikirin.

Bi Rêveçûna bi Derd ve

Di sêzdehê meha avdara sala 1949 de Generalekî Sovyêti ji bona Taşqendê hate bigihandin wî ji Barzanî re date bigotin. ku ew dê ji bona Mosko bi balafireke taybetî ve bête birin û dê ew Stalin û Serokên Sovyêtiyî din bide bidîtin. Herwehajî wî jê date bixwestin, ku ew du Merovan ji xwe re bide bihelbijartin, da ku ew ligel wî de bêtin biçûyîn. Wî ji xwe re Seid Mele Abdul-Lah û Ziyab Dorî datin bibijartin û wan di êvara wê rojê bi xwe jî ve berê xwe ber bi Balafîrxanê ve dane bivedan. Nîşanên rûxweşbûnê û geşbûnê li ser rûwên tevan de dihate biderkevtin û ew tev bi hêvî ve dihatin biderkevtin; belam pir bi lez û bez ve ew bi hêvîbûna hanê û rûxweşbûna hanê ve bi kul û derdên mezin ve hatin biveguhertin; jiber ku ji taltir û diwartir ji talî û diwarîyên wanî bi serhatîyî berê ve ji bona wan didate bibendewarîkirin.

Balafir bi Mele Mustafa û Hevalên wî ve berê xwe ber bi Mosko ve neda bivekirin; lêbelê wê berê xwe ber bi bajarokê Çempayê ve date bivekirin, yê ku ew li ser goma Oral de dihate bikevtin. Ev jî bi nala dûrêkirinê ve û bi rûniştina divayê ve dihate biderkevtin.

Herwehajî di roja paş de ji Şêx Sulêman, Elî Mohamed Sidîq, Sulêman Beg Dergele, Mohamed Necîb û Abdul-Rehman El-Muftî hate bixwestin, ku ew xwe ji bona çûna bi gihandina Barzanî ve bidin bilikarxistin; belam ew ji bona Semerqend hatin biveguhestin. Wetov ev kirina hanê ji bal desthilatîyan de pir caran ligel Berpirsiyarên din de dihate bidubarekirin. Weha wê ew li teva hêlên Sovyêtiyê de dane bipengizandin. Ew bi wê mehnê ve dihatin biveguhestin, da ku ew ji xwe re li serbazxana xweyî nuh de ji bona fêrkirinên sipahî bidin bitemaşekirin.

Ji para Es-ed Xweşevî, Mohamed Emîn Mirxan, Mamend Mesîh, Misto Mîrozî, Şêx Omerê Şanederî, Elî Xelîl, Mohamed Mahmud, Murad Şêxo, Seid Welî Beg, Hecî Heyder, Seid Balanî, Isa Suwar û Feqe Hesên Idlibî¹⁰⁷ bi çûna ji bona girava Moynak ve hate biderkevtin û ew ji bona wêna bi Balafirê ve hatin biveguhestin, ya ku ew di naverasta goma Oral de dihate bikevtin. Di piştî wêna re dora yê mayî hate bihatin û ew li tirêneke taybetî de hatin bisuwarkirin û ew wetov di nava fargonan de bi rêk û pêkîyeke nîşankirî ve hatibûn

¹⁰⁷Ev ji hinek Berpirsiyarên bingehî dihatin biderkevtin.

biparvekirin, ku gava tirên li her îstgehekê de dihate birawestandin, wetov fargona dawî ji tirênê dihate bicihêkirin. Bi vî corê hanê dihate bikirin, tanî ku fargona dawî li bajarekî de hate bimayîn. Bi vî rengê hanê hîç komekê li ser yan din de tu tişt nedidate bizanîn. Magelô çi bi serên yên din ve hate bikirin, li kû derê de ew hatin bimayîn û dê ew ji bona kû derê hatibin bidûrkin?

Di pişt re hate bixuyanîkirin, ku ji bona her komekê ji bona Neferên wêna gundek yanî bajarokek hatibû biterxankirin û ew li jêr çavdêrîyê de ji bona kar di karxanan û Çandinîyên tevayî -Kolxozan- de hatin bidanîn û ligel wan de dihate bireftarkirin, mîna ku Merov ligel Zindanvanên dadkirî de bi karên dijwar ve didate bireftarîkirin. Herwehaji pêwendîya wanî ligel hevdû jî de dihate biqedexekirin û herwehaji rê bi wan ve nedihate bidan, da ku ew navnîşanên Hevalên xwe bidin binaskirin. Reftareke pir dijwar û hov ligel wan de dihate bikirin, ya ku ew ji hêjabûnên mirovanîyê, sincî û reweştî mêvandarîyê pir bi dûr ve dihate biderkevtin.

Agehdariyên li ser wan Pehlewanan de bi carekê ve ji bonacîhana derve hate bibirîn. Rojanamên cîhanî bi falvekirinê ve dane bidestpêkirin, gava ku wan didane bixwestin, ku ew li ser agehdariyên wan de ji xwe re bidin binivîsandin. Wetov Rojnama Times gotarek date bibelavkirin, ku têde date bigotin, ku Barzanî bi nîşana generalîyê ve di sipahê sor de pê hate bixelatkirin û ew girdekî bi carekê ve dide birêberîkirin, ya ku ew li ser sînorê Iranî - Sovyêti tete bikomkirin. Di vê demê de bi xwe jî de wî û Hevalên xwe derdê talîya derbiderbûnê û dûrbûnê ji xwe re didatin bikişandin.

Derîyê Çardeh

Manggirtin û tûrebûnan

Tevî çavdêrîya xurt, tengavkirinên pir û karkirinên ji bona candîya bê hêvîbûnê di nava rêzên Barzanîyan de ew bi dilsozî ve li ser bîr û bawerîyên xwe de hatin bimayîn û ew bi Rêberê xwe ve pê hatin bibestandin. Vê pê bestandina hanê bi wan ve date bipalpêdan, da ku ew bêyî agehdarîya hevdû bi manggirtinan ji kar ve pê bêtin birabûn û li ber zordarîya Polîsî de serên xwe bidin birakirin. Berpirsiyar di serdarîya Ozbêkistanê de ji serhişkîya wan dihatin bisersûrandin; jiber ku manggirtin, xwepêşandin li ber Polîsê veşartî de di pêla Stalin de bi tawankariyek ne lêbuhurandî ve dihate biderkevtin, ya ku ew bi beramberî bêbextîyê ve yanî bi wêrankirinê ve dihate biderkevtin û bi Pêrabûnê wêna bi darvekirinê ve dihate bisizadan. Hîc Kesekî berî Barzanîyan mêrxasîyeke wetov di xwe de nedabûn bidîtin, ku ew bi karên wetov ve bêtin birabûn. Tiştê ku pir guhpêdana Berpirsiyaran ji her tiştî bêtir ber bi xwe ve date birakişandin, ku hemû li ser yek xalê de bi yek ve dihatin biderkevtin, ku ew jî daxwaz ji bona Rêberê wan bû: Em Baraznî dixwazin. Ev pevçûna hanî tal tanî sala 1951 hate bimayîn. Merov Pir bi dijwarî dikare zîneta rewanîyî Barzanî û lêdana dilê wîyî bi tirs ve li ser Hevalên wî de ji xwe re bide biremankirin; jibervêjî ve wî di salnameya xwe de di mêjûwa 4. 11. 1949 de ev herdu malikên xweşxuwaniyî Farisî dane bitomarkirin:

Eger der xoab mêdîdem xem rozî cudaîra
bidil herkiz nemî kerdem xeyal Aşnayîra

Heger di xewnê jî deba, min jana roja cudabûnê bidata bidîtin
bi dil jî ve min nigaşî nedidate bikirin, te bidim binaskirin

Rastî hercar bi rastî ve tête biderkevtin, bi bê sûd ve û bi ber ba ve tête bikevtin, kêra wêna bidin biveşartin, yanjî bidin bisivikkirin. Kirinên Bagerof li Ezerbêcanê de û Yusivof li Ozbêkistanê de beramberî bi Penahindên Barzanîyan ve ji tawankariyên Vegirtvanên Ingilîzî û Nokerên ji serdariyên Iraqî ne bi kêmtir ve dihatin biderkevtin; lêbelêjî hêjbêtir ew pir bi bêtir ve di azarî û tuwankariya xwe de ji yên wan dihatin biderkevtin.

Dibe ku tawankariya Bagerof û Yusivof beraberî Yekîtiya Sovyêtê bi xwe ve bi mezintir ve bête biderkevtin; jiber ku vê reftara wanî hanêyî ne bi Merovanî ve beramber bi Penahindên Barzanîyan ve zîyaneke pir mezin bi navê vî welatê mezin ve date bigihandin, yê ku wî xwe ji dema şûreşa Oktober de bi nala Liberxwedan ve li ber mafeyên miletên sitembar de dayite bidanîn, ji yên ku ew hêjî li jêr nîrê Impiryaliyê de têtin binexkirin. Herwehaji di destûra wî de hatiye binivîsandin, ku ew bi dilgermî ve dergehên xwe li ber Penahindên Xebatvan de ji bona rizgarîkirinê û baweriyê didin bivekirin.

Barzanîyên Penahinde, mîna ku mêjûwa serdemê dide biderxistin, bi reweşt û serpêhatiya pêşiyî Yekîtiya Sovyêtê û şeweyê reftarîkirina wêna ligel Komekê ji Penahindeyên pêşî de ji bona welatê wê piştî şureşa Oktober dihate biderkevtin. Jibervêjî ve di tevaya hêlên cihanê de çav dihatin bibeloqkirin û guh dihatin bibelkirin, hîç di vî warê hanê de cudabûn di navbera Dost û Djimin de nedihate bidîtin, da ku ew ji xwe re bidin bidîtin û bibihîstin, magelo dê helwesta Sovyêtê beramberî wan pêncsed Xebatvanan çawan bête biderkevtin, ji yên ku wan di ser karîna Merov de li xwe de dane bihilgirtin, tanî ku ew bi welatê wan ve hatin bigihandin? Ji yê ku wan ew bi cihê xweşiya xwe ve didatin bidanîn. Belê karê germî Bagerof û Yusivof di pengizandina wan Qehremanan de û reftarîkirina ligel wan de bi nala Vegirtvanên Çavsorên welatê Sovyête ve dihate bikirin, Herwehaji reftarkirina ligel wan de bi nala Zindanvanên sade ve dihate bikirin û ew bi karkirina karên dijwar ve didate bipêneçarkirin, ji yên ku ew li ser wan de nehatibûn bifêrkirin. Herwehaji li ser wan de dîtina wan ligel hevdu de hatibû biqedexekirin. Ew bi tirênan ve ji bona cihên dûrkinê bi rengekî dûr ji hiş dihatin binardin, ku bîrweriya tirênan Nazîyan didatin bibîrxistin, ji yên ku wan Girtivan ji bona serbazxanên mirinê û karên sengîn didatin bibirin¹⁰⁸.

¹⁰⁸Her beramberîyek yanjî lêbîrkirineke wetov ji reftarên desthilatîyên Sovyêtî di vî

Dora Barzanî de di cihê dûrbûna wîyî nuh de li Çembay de hate bigirtin û pêwendîya wî ligel her Berpirsiyarekî de û bi her şêweyekî ve hate biqedexekirin. Belam tevlivêjî de bê hêvîbûnê cihê xwe di nava dilê Barzanî de nidate bidîtin; jiber ku hestiyarîya wîyî hogorî beramber bi berpirsiyarîyê ve rê bi kevtina bi hêvîbûnê ve ji bona nava cerg û hinavên wî nedihîşt bête bikirin.

Wîna ji xwe re çûna yekekî qenc ji xelkên bajêr ji bona Moske date bikêskirin, ku wî pê nameyeke dûr û dirêj date bisipartin, da ku ew wê li Mosko de ji bona berîdê bide biavêtin, ya ku ew xweser ji bona Stalin hatibû binardin, ya ku wî têde bi dûr û dirêjî ve li ser pêgihandina rewş û zîneta Barzanîyan didate bixuyanîkirin. Wî Merovê dost ew nameya hanê ligel xwe de date bihilgirtin û wî ew ji bona sebeta berîdê date biavêtin. Ew bi nameya bi tenha ve xwe di nava bi dehan ji naman ve dihate biderkevtin, ya ku ew bi Kirêmlin ve hate bigihaştin; jiber ku nameyên din ji bal çavdêrîya berîda cih de dihatin bigirtin.

Mosko destdirêjî date bikirin

Nameyê kêra xwe date bikirin û li Mosko de Encumeneke lêgerandinê li ser zînetên Penahindên Barzanîyan de hate bipêkhatin û wê di avdara

warê hanê de tevî li hemû tirş û talîyên rastîyên gotî jî de ligel reftarên Nazî de beramberî Girtivanên wan de dûr ji têgihistina mêjûwa reftarî Nazîyan ligel bi milyona ji Girtivanan de bi belgeyên mêjûyî ve tête biderkevtin. Hiç Kesek bi Saxî ve ji Girtivanên Nazîyan nehatin birizgarîkirin, ji bil yê ku ew ji bal Dewletên Hevalbendan pêve di dawî ruxandina Nazîyan de hatin birizgarîkirin.

Nazîyan bi Milyona nebes tenê di rêya karên sengîn de ji Girtivanên xwe dane bikuştin, neji tenê di rêya bi milyona ve di rêya Gazên jehrawî de ew didatin bikuştin; belê hêjî bêtir ew bi saxî ve ji bona tenûrên şev û rôjî dadayî didatin biavêtin. Bes û bi tenha ve ji bona bi bîrxistinê ve Nazîyan bêtir ji şeş milyon ji Cuhên rebenî belengaz ji seranserî welatên Ewropayî cudan de di nava tenûrên xweyî germî vêkevî de datin bisûtandin.

Herwehaji bi Boyê reftarîya Nazî ve di cenga duwem de 50 Milyon Merov hatin bikuştî û 58 milyon Merov hatin bitawûbawîkirin.

Hêjî di seranserîya mêjûwa merovanîyî nivîsandî de hovîtîyeke wetov ji bil hovîtîya Basîyên Faşîyên Erebi li Begdadê de di avêtina bobmên kîmyawî û biyolocî li ser bajarê Helebçe de li Kurdîstana Jêrîn de di 16/ 17 . 3 . 1988 de nehatîye bidîtin. Cuma

sala 1951 de bi karê xwe ve date bidestpêkirin. Ew bigir bi serdana tevaya koman ve hate birabûn û wê ji Neferên wan koman li ser hoyên manggirtina wanî li dûhevdu de date bipirskirin, yê ku ew di yek demê de dihatin bigirtin û magelo çawan ew tevî li hemû pêrabûnên xurt de ji bona nehiştina pêwendîyan ligel hevdu de dihatin bikirin? Wan ji tevan yek bersiv ji xwe re didatin biwergirtin, ku em ligel Barzanî de li pênavê wergirtina mafeyê miletê Kurd hatine bihatin û niha em dixwazin, ku Rêberê meyî Barzanî ligel me de bête bidîtin.

Encumen ji bona Mosko bi hilgirtina encamên lêgerandina xwe ve hate bivegerandin. Wer tête biderkevtin, ku ew bi rastîyê ve hatibû bigihandin. Jêre bedbûna reftarkirina ligel Barzanîyan de li destên Berpirsiyarên Ezerbêcanî û Ozbêkî de û herwehaji pêrabûnên jirêderkevtî beramberî wan hatin biderkevtin, yê ku ew pir bi nebaşî ve dihatin biderkevtin. Dibeji, ku di vî batetê hanê jî de raportek ji bona desthilatîyên bilinde li Kirêmlin jî de hatibe bibilindkirin. Li ser wê kêrê de di dawîya meha gelavêja sala 1951 de Mîrza Vîno Giradof ji bona Taşqend hate binardin û wî ligel xwe de agehdarîyên rep û rast û bi diyar ve didatin bihilgirtin, ku divê hemû Barzanî ji dûrbûnên xwe bêtin bivegerandin, Zînetên wan divên bêtin bibaşkirin û rûpelekî nuh di reftarkirina ligel wan de divê bête bivekirin.

Derîyê Panzdeh

Dana bi serhevdû ve

Karê pêşîyî ji pêrabûna Vîno Giradof piştî gihandina wîna ji bona Taşqend bi nardina daxwaza Barzanî ve di 1. 9. 1951 de dihate biderkevtin, ku ew bi balafireke taybetî ve ji cihê dûrkirina wî ji bona nik wî li Taşqend de bête biveguhestin. Di dema gihaştina wîna de ew ji bal Vîno Giradof de pir germî lê hate bipêşewazîkirin. Wî jê daxwaza lêbuhurandinê li ser hemû rûdanên kirî de date bixwestin û wî jêre date bikotin, ku Mosko gelekî bi peroš ve li ser wan rûdanên kirî de tête biderkevtin û wê dayite bibiryarîkirin, ku dê ew ji nû ve çavdêrfiyekê li ser zînetên Barzanîyan de bide biavêtin. Herwehaji wî jêre manggirtinên Hevalên wî datin bijimartin, ji yên ku ew bi wan ve û her yek di cihên xwe de pê hatibûn birabûn. Herwehaji wî date biderxistin, bê çawan desthilatîyan çavên xwe li ser wan de dane bigirtin; tevîjî ku ew di çavên qanûnê de bi bêbextîya mezin ve têtin biderkevtin. Lêbelê hilgirtina wan ji derd, derbiderkirinê û givaştinê li ber çawan de hatin biwergirtin. Herwehaji wî ji Barzanî date bixwestin, ku ew nameyan ji bona komên dûrkirî ve bide binivîsandin û ji wan re bide bigihandin, ku dê pêrabûnên tund bi nêzîk ve bêtin biwergirtin, da ku ew bi serhevdû de bêtin bikomkirin û zînetên wan bêtin bibaşkirin û dê ew ji wê jîyana dijwarî çepelî bêtin birizgarîkirin, ya ku ew tucarî nikarîbû bi serên wan de bihata bikevtin.

Balafireke taybetî Şêx Sulêman û Hevalên wîna ji Semerqend datin biveguhestin û herwehaji Balafireke din ji bona veguhestina Es-ed Xweşevî û Hevalên wîna ji girava Mowînak hate binardin. Di pişt re bi veguhestina komên pengizandî ve li dûhevdû de hate bikirin, tanî ku

